

# ŞEWÇILA

3 kovara edebî hunerî

3 wisar 2011



- J. Îhsan Espar: Şîre cewherê mezgî û ahengê vengî ya
- Bîlal Zîlan: Tehlîlê hîkaya "Beyi Se Bena?"
- Roşan Lezgîn: Kirmanckî de averşiyayîşê hunerê hîkaye
- Murad Caşad: Romanê Mehmed Uzunî de enstrumanê muzîkî
- Deniz Dilar Pîrejmanij: Vengo Bêveng
- Alî Aydın Çîçek: Jan
- Mehmed Elî Sadiq: Pawitene
- Seîd Aspar: Çimê Ma Roşt Bo

1

Şewçila  
Kovara Edebi Hunerî  
Hûmare: 1, Adare 2011

Wayîr û Berpîrsîyar/Sahibi ve Sorumlu Mûdür: Av. Sidqî Zilan

Edîtor/Redaktor: Roşan Lezgîn

Mîzanpaj: Deniz Gunduz

Xebata Qapaxe: Şewçila

Vayî/Fiyat: 5 TL

Çap/Baskî: Berdan Matbaacılık,  
Güven Sanai Sitesi, C Blok No: 239, Topkapı-İstanbul

Adrese: Lise Cad. 2. Sokak,  
Adalet Ap. No: 3, Yenişehir – Diyarbakir  
Tel: 0 412 223 03 69

E-mail: sewcila@hotmail.com, rlezgin@hotmail.com

*Berpîrsîyarîya her nuşteyî ya nuştoxî/nuştoxe bi xo ya.*

# TEDEYÎ

VENGO BÊVENG /Deniz Dilar PÎREJMANIJ.....	6
MULEMMAYA EHMEDÊ XASÎ/Roşan LEZGÎN.....	7
XATIR/Alî Aydın ÇÎÇEK.....	10
KIRMACKÎ DE AVERŞÎYAYÎŞÊ HUNERÊ HÎKAYE/Roşan LEZGÎN.....	12
ŞÎRETÊ ŞAÎRÎ/Xerîbzeman.....	18
J. Îhsan ESPAR: ŞÎIRE CEWHERÊ MEZGÎ Û AHENGÊ VENGÎ YA/Roportajkerdox: Roşan LEZGÎN.....	20
PAWITENE/MehmedElîSADIO.....	28
ROMANANÊ MEHMED UZUNÎ DE ENSTRUMANÊ MUZÎKÎ/Murad CANŞAD.....	29
BÊRE/HemîdHOZAN.....	46
HETÊ ŞUXULNAYÎŞÊ ZIWAN Û ÎDYOMAN RA TEHLÎLÊ HÎKAYA "BEYI SE BENA?"/Bilal ZÎLAN.....	47
ZERRÎYA TO PELEYÊ VEWRÎ/Oktay ERSOY.....	58
DERSA KIRDKÎ DEST PÊKERD/Berxwedan PÎRANIJ.....	59
JAN/Alî Aydın ÇÎÇEK.....	60
ŞALA SÎYA/Roşan LEZGÎN.....	68
VEWRSIPÎYEKE/Almankî ra çarnayox: M. DOGAN.....	74
ÇİMÊ MA ROŞT BO/Seîd ASPAR.....	81
TEBERIK.....	83
KITABÊKO MUHÎM: DÊRSIM.....	85
HÎKAYA ROŞAN LEZGÎNÎ "BABA" BÎYE FÎLM.....	86

Wendoxê Erjayeyî,

Gama ke weşanêka newîye dest bi weşana xo kena, edet o, ganî verê verkan nîyet û çarçewaya xo eşkera bikero.

Nîyet û amancê ma yo bingehîn o yo ke edebîyat û hunerê kirmanckî (kirdkî, zazakî, dimilkî) de pencerayêka newîye akerîn û kirmanckî gamêna aver biberîn.

Kovara ma wazena çarçewaya **edebîyat û hunerî** de weşana xo bikero. Û tena eseranê estetîkan yê sey şîre, hikaye, roman, meqale û nuştayanê derheqê teoriya edebîyat û hunerê modernî de, hewna, roportaj û krîtîkan (rexneyan) eseranê edebî û hunerî biweşano. Kovare, nuştîş û redaktekerdiş de do qaydeyê rastnuştîşî ke hetê Grûba Xebate ya Vateyî ra tesbît biyê tetbîq bikero.

Ma zanê ke averşiyayîşê edebîyat û hunerî de, perwerdebîyayîşê nuşttox û hunermendanê neweyan de, xuliqiyayîşê eseranê estetîkî de, munaqesekerdişê fikr û teoriya esestetîkiye de kovarî her wext sey wendegehî biyê. Coka ma zî hêvîdar ê ke sey pelêkê tern û tezeyî seba edîb, nuşttox, hunermend û heskerdoxanê edebîyat û hunerê kirmanckî nê wareyan de bibîn platformêk.

Hetanî ke destê ma ra bêro ma do layîqê wendoxanê xo bîn. Û ma hêvîdar ê ke wendoxê ma zî bi eseranê xo, bi mektuban, rexne û pêşnîyazanê xo piştgirîya ma bikerîn. Hîna zaf zî, kovare sey kovara xo bizanîn û her hetan ra wayîriye bikerîn.

Diyarbakir, 14.02.2011

Roşan LEZGÎN

# VENGO BÊVENG

Deniz Dilar PÎREJMANIJ

Nîmeyê şewa derg û dilaye de hewna derdê min o kehan ame mi vîr. Çend wext o ke bêderman bi. Sereyê mi deja, zerrîya mi bîye tenge, destê mi recefiyay. Mi se kerd-nêkerd ez nişaya ê derdê xo yê ke hetanî nika mi aciz kerdêne, mîyanê rîpelanê hîşê xo yê betelîyayeyî ra veja, bierza teber.

Yew vengo cal binê hewranê leyl û tariyan de seke mîyanê bîrêkê xorînî ra fikîya vayî reyde tēmîyanbîyaye veng dano vano: “Mi to ra va, mi to ra va!...”

Û veng fesal-fesal vila beno tariya şewe de. Ez nişka ra ereqî mîyan de cila xo ra vir bena payan. Ez dormareyê xo ra ewnêna ke ez ha odaya rakewtişî de ya.

Ez nefesêko xorîn û tersinik gêna: “Şukir Homayî rê, na hewe zî hewn bi.”

# MULEMMAYA EHMEDE XASÎ

Roşan LEZGÎN

Şiîra ke tayê rêzî, qismî yan zî çekuyê aye bi ziwananê cîya-cîyayan yenê vatiş la hetê mana ra yewbînan tamam kenê ra sey termêkê edebî "mulemma" vajîyêno. Nê hawa şîrî hetê mana, kafiye û zerafetê hunerê şîre ra zaf rindek ê. La wendoxê nê şîran, seba ke şîre ra tehm bigîrê, ganî bi qasê şairî hem ziwanan bizanê hem xorîniya manaya çekuyan û terman bizanê, hem zî îlmê şîre ra fehm bikerê.

Zafê şairanê klasîkan qismêkê şîranê xo bi hawayê mulemma nuştê. Helbet nuştexê kirmanckî yo tewr verên Ehmedî Xasî zî zaf weş bi terzê mulemma nuşt. Xasî erbabê ziwane erebkî, fariskî, tirkî û kurdkî (kirdkî, kurmanckî) yo. Xasî filozof o, wayîrê îlm û îrfanî yo; hem alim o, hem şair o, hem arif o, hem filozof o.

Na şîra ey ke bi terzê mulemma nusîyaya, mi *Mewlûdê Kirdî*, destnuştêyê Zeynelabidîn Amedî, qismê dîyine ra transkrîbe kerde. No kitab hîrê qismî yo. Qismo verên 15 rîpelî, qismê dîyine 12 rîpelî û qismê hîrine, yanî qismê mewlîdî zî 29 rîpelî yo. Qismo verên heme erebkî yo, nê qismî ra, nîmeyo peyên de 99 nameyê Homayî (Esmâ-ul Husna) zikr biyê. Qismê dîyine de yew reddîye bi erebkî esta. Xasî, bi nesr û nezm cewabê Îsmâil Es'erdî dayo. Dima yew xezela ey bi tirkî esta. Aye ra dima zî na mulemma esta. Xora, qismo peyên zî *Mewlûdê Kirdî* yo.

Mi rêzê kurdkî (kirmanckî û kurmanckî), erebkî û fariskî bi alfabe ya latînî ya kurdkî nuştî. Feqet tayê vengê ke bi alfabe ya erebkî nusîyenê la latînkî de çin ê, mesela, sey vengê 'eyn û 'xeynî, mi nê vengî bi îşaretê nenugî (') nîşan dayî. Tirkî zî, mi hem alfabe ya latînî yê tirkî ra herfî girewtîy hem zî vengê sey **q w x** ke verî tirkî de estbîy la badê ke tirkan alfabe ya latînî qebl kerde, nê vengî betal kerdîy, mi alfabe ya kurdkî ra îlawe kerdîy.

Rêza ke bi erebkî ya, mi peynîya rêzê de mîyanê parantezî de (**er**), a ke fariskî ya (**fr**), a ke tirkî ya (**tr**), a ke bi lehçeya kurmanckî ya (**kr**) û a ke bi lehçeya kirmanckî ya zî (**krd**) nuşt. La na şîre de yew rêze esta, mi tam fehm nêkerd ke bi çi ziwani ya, coka mi îşaret nêkerde.

Heme rêzî tercumeyê kirdkî bibîyêne, beno ke hetê fehmkerdişê mana ra seba wendoxanê ma baş biyêne. La seba ke ez bi xo erebkî nêzana, mi yê bîni zî tercume nêkerdîy.

Merheben ya men 'ela bîl husnî teqwîmel-beşer (er)  
Hafiziş Xaliq şevd ez çeşmê bednam û nezer (fr)  
Mewcûdê esbabû latû we ma mînha seder (er)  
Dil ji qeyda leşkerê 'xem kir reha weqtê seher (kr)  
Ah û nalînê verênî bî vinî, nêmend eser (krd)

Faqe heqqen şe'nuhu eqranuhu mîn 'xeyrî şek (er)  
Xatirê ma der î pîş manedê an eshabê sek (fr)  
Ruhime diydi rewanım, bende gitdim, qalme tek (tr)  
Yek bibin, ta yek bibînin, wek du çeşmê neh felek (kr)  
Husn û xulqî bi nisbet yê, nisbetê ma xeyr û şer (krd)

Men yelumnî lem yezuq bel zaqe mîn xemrîl edes (er)  
Huccetê û 'stî melameş ke neşod kebke qefes (fr)  
Müflûsî sem' u beserdır, o ne görsün, bu ne ses (tr)  
Daweta sûret lew nedî, kî nebûbe, nîn e kes (kr)  
Ma 'eleyna van, nameyê laîmê îbnî Seqer (krd)

Fa'lemen fellahu xeyrun hafizen halen-newa (er)  
Xasî ya, ba sebr û şewta nûr şevd narê hewa (fr)  
Rehberındır bil, bu derden, çunki O'dur dewa (tr)  
Yawerê rindan, nebî Ehmed, çi insaf û wera (kr)  
Dûrîyey yîne hevalo, kufri ya, ey bêxeber (krd)

Mewtuhu xeyrun lehu men fit-tereqî lem yekun (er)  
Hey şevd, an kî bixwaned, der dileş, îlmê ledun (fr)  
Ma'deni ehwalî 'alemdır benim qelbım bugün (tr)  
Dewleta Şabur û Xaqan im li ser textê Hesên (kr)  
Xet û xalan ra eger nêbo, çi zanê ma keder? (krd)

Fate nûr-il hikmetî fi darî men fiha 'emûn (er)  
Xasî ya, xafil meşev, ba îin meqalet, ez derûn (fr)  
Rahi xızlane siluk çoq itdi erbabi finun (tr)  
Yazî yû xettê Humayunda bi te'wîlî zebûn  
Eşkera va ditişey Homay mehal û bê xeter (krd)

Men ye'îbû dînena ehlul hewayê bî'sel cehûl (er)  
Hikmetê îin rah nedaned merdê şebrah û ecûl (fr)  
Made-i Musâ'de olan nice ehbar u fûhul (tr)  
Damena şeyx Şeqqî girtin, bi wî re bûn xezûl (kr)  
Sûretê yîne sîya bo, yewme tesweddus suwer (krd)

Fexle'en ne'leyne kel-la tuncî mîn seyflîl-melam (er)  
Xatemê xub û 'ereb ra ta konem 'erzê meram (fr)  
Reşhe-i xamem burada dökür dürlerden kelim (tr)  
Yar û e'xyaran ku dîtin, aferîn gotin, tamam (kr)  
Yo sebeb ra ma zî bizan pêş kerî, na zî şeker (krd)\*

---

\*Çime: Ehmedê Xasî, Mewlûdê Kirdî, Xetê Zeynelabidîn Amedî, Qismê diyine, Diyarbekir  
1402 [1982], r. 10-12



## XATIR

Ali Aydın ÇİÇEK

Na dinya ser o  
her çi wayîrê yew rengî yo,  
wayîrê yew dilq û vengî...  
Pêro rindî, pêro rindekî.  
Bê înan çi qîymetê na dinya esto?  
Bê dare, kemere, pele  
bê awe, şilîye, vayî...  
Nê yê mal û milkê dinya  
Sewbîna her çi zur o.

Eke însan feqîr ame rîyê na dinya  
Talihê xo sîya bo,  
bextê xo kî çin bo  
reyna feqîr şono.  
Ez zanena,  
nê qiseyê mi şima dejnenê  
labelê ez se bikerî.  
Dem û cu wina yo.  
Eke aşme nêvejîna guneyê asmênî çik o,  
eke şilîye nêverana guneyê hewran çik o?  
Kam çi vano wa vajo  
xo vîr a mekerê  
însano ke xo zaneno,  
însano ke rîyê xo çarnito roştîye  
rîyê ey nêbeno sîya  
zereyê ey nêbeno xirab û qilêrin.  
Xo medejnê  
û mexapnê  
raştîye na wa  
na raştî ya...

Xatir bizanê...  
xatirê însanî  
xatirê tîje, aşme,  
erd û asmênî  
û teyr û turî...  
Xo vîr a mekerê!  
Xora tu kes  
wayîrê çîyê nîyo na dinya ser o.  
Sey awe ênîme  
û sey awe  
oncînîme û şonîme,  
bêrêçe,  
bêxêr,  
bêdem...

Peynîya peyêne de  
mîyanê erd û asmênî de  
benîme wele,  
benîme yew xeyal.  
Xatir bizanê  
û xatir bivînê.  
na dinya kesî rê nêmanena.\*

---

\*Na şîre "Musabeqaya Hikaye û Şîran ya Huseyîn Çelebî ya des û heştine" de qismê lehçeya kirmanckî de xelata yewine girewte.

# KIRMACKÎ DE AVERŞÎYAYÎŞÊ HUNERÊ HÎKAYE

Roşan LEZGÎN

Senî ke 'kurdî' nameyê panc lehçeyanê cîyayan, yanî nameyê muşterek yê **kirmanckî** (zazakî), **kurmanckî**, **sorankî**, **hewramkî** (gorankî) û **lurrkî** yo, bi eynî şekl 'edebîyatê kurdî' zî edebîyatê panc lehçeyan o. Yanî edebîyatê kurdî; şîira kurdî, hîkaya kurdî û romanê kurdî eynî sey ziwan û welatê kurdan parçeyanê cîyayan ra yeno pê. Seba neteweyêk parçebîyayîşe ziman û welatê aye, yan zî ma vajin eke neteweyêk bêro parçe kerdene, demeyêko derg bi hawayêko sîstematîk bibo amancê teda û çinkerdişî, na bena rewşeka sosrete. Labelê çiqas sosret bo zî, ziwan û edebîyatê kurdî ke wayîrê karakterêkê xoverodayoxî yo, rîyê sînor, alfabe û lehçeyanê cîyayan ra homojenîyêka xurte nîşan nêdo zî hewna gama ke merdim bala xo dano, sey baxçeyêkê rengînî, sey zaftewiriyêk ke heyecan danê merdimî aseno. Nê parçeyê yewbînan ra cîyayî wayîrê eynî qederê muşterekî û taybetîyanê karakterîstîkan ê. Naye ra, kam gama ke ma edebîyatê kurdî yan zî şaxêka edebîyatê kurdî ser o, ma vajin, gama ke ma hunerê hîkaya kurdî ser o xebitênê, ganî sey zarûriyetêk ma cîya-cîya bala xo bidin lehçeyan ser. Parçeyê cîyayî ke ma tesbît kerdê eke bidin têver, a game tabloyê gird yê 'edebîyatê kurdî' tamam beno.

Na meqala de tena çarçewaya edebîyatê lehçeya kirmanckî (zazakî) de ez do destpêk ra hetanî ewro bala xo bidî averşîyayîş û rewşa umûmî ya hîkaye ser.

Na lehçeya ke Kurdîstanê Bakurî de texmînen hetê çar mîlyon kurdî ra yena qisey kerdene mintiqayanê cîya-cîyayan de bi nameyanê cîya-cîyayan yê sey **kirdkî**, **kirmanckî**, **zazakî** û **dimilkî** name bena. Nisbet bi lehçeya kurmanckî û sorankî sey hewramkî hîna vêşî taybetîyanê ziwananê kehenan xo de muhafeze kena la mîyanê lehçeyanê kurdî ra ya ke tewr erey nusîyaya kirmanckî (zazakî) ya.

Kîtabo tewr verên ke na lehçe de nusîyayo, *Mewlûdê Kirdî* yê Ehmedê Xasî (1867-1951) yo. No esero menzûm serra 1899 de Dîyarbekir de Çapxaneyê Lîtografya de 400 nusxeyê ey ginayê çape ro<sup>1</sup>. No kitabê yewin ê kurdan o ke Kurdîstan de çapxaneyêkê

1-Malmîsanîj, Ehmedê Xasî, "Mewlîdê Nebî", *Hêvî*: Kovara Çandîya Giştî, No: 4, Êlon-1985, Paris, s. 75-97, Aktaran: Eşpar, J. Îhsan "Çend Nuştayê û Kitabê Kirdkî" Zend: Kovara Lêkolînî, No: 1, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Payîz 1996, İstanbul, r. 44-48

modernî de ginayo çape ro<sup>2</sup>. No eser seba ke welat de weşanîyeno û gelek nusxeyê ey mîyanê şarî de vila bîyê, hewna, seba ke hetê edebî ra zî eserêko erjaye yo, coka tesîrêko baş şarî sero kerdo. Kirmanckî de kitabê diyin *Bîyîşa Pêxamberî* zî, ancîna, metnêko menzûm o û badê weşanîyayîşê *Mewlûdê Kirdî* hetê Osman Efendîyê Babijî (1852-1929) ra nusîyayo. La no eser zaf serrî dima ra, serra 1933 de Şam de hetê Celadet Alî Bedirxanî (1893-1951) ra ameyo weşanayene<sup>3</sup>.

Tedaya ziwan û edebîyatê kurdî ser o ta dewrê Osmanîyan ra dest pêkerda<sup>4</sup> û dewrê komara Tirkîya de qedexekerdişî ra wetê derceya çinkerdişî de bi hawayêko sistematîk dewam bîya, coka nê her di metnananê verênan ra pey hetanî serranê 1970an tu xebatêka nuşteki nêbîya. Seba ke kurdê kirmancî (zazayî) tena mîyanê sînoranê îdarî yê Tirkîya de ciwîyênê, cayêkê bînî de zî tu eserêk bi na lehçe nênusîyayo. Hîkaye zî tede metnê destpêkî yê modernî reya verêne serra 1979 de hetê ziwanzan û tarîxnasê kurdan *Malmîsanijî* ra kovara *Tîrêje* de weşanîyayê. Senî ke edebîyatê modern yê kurmanckî kovara *Hawarî* ra dest pêkeno, ma şênê edebîyatê modern yê kirmanckî (zazakî) zî kovara *Tîrêje* ra bidin dest pêkerdene.

Hîkaya yewine ya kirmanckî (zazakî) bi nameyê “*Engîştê Kejê*” ke hetê *Malmîsanijî* ra nusîyaya, bi mexlesê *M. Birîndarî* serra 1980 de kovara *Tîrêje* de weşanîyaya<sup>5</sup>. Nuştex hîkaye de bi dîyaloganê mîyanê dersdar û wendekara ey de zulm û tedaya artêşa tirkan ke dewijanê kurdan ser o bena bi hawayêko realist û bi ziwaneke sade qisey kenê.

Na hîkaya yewine, tesîr û teşwîqo muhtemel ke do wendox û namzedanê nuştexiye ser o bikerdene nêkena. Çunke badê ke hûmara diyine ya kovara *Tîrêje* vejîyena ke na hîkaya zî tede ameyo weşanayene,

---

Xasî, Ehmed, *Mewlûdê Nebî*, (Transkîribekerdox: Mihanî Licokic), Weşanxaneya Firat, İstanbul 1994

2-Malmîsanij, Yirminci Yüzyılın Başında Diyarbekir’de Kürt Ulusçuluğu (1900-1920), Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2010, r. 18

3-Babij, Usman Efendî, *Bîyîşa Pêxamberî*, Kitabxana Hawarê, No. 4, 1933, Şam

- Bedirxan, Celadet “Zarê Dumilî û Mewlûda ‘Usman Efenedî’ *Hawar*, Hej: 23, 16 tîrmeh 1933 Şam (Cilda yekem a *Hawarê*, Weşanên Nûdem, r. 603-608

- Malmîsanij, Bedirxan, Celadet, “Zarê Dimilî û Mewlida Usman Efendî”, *Hêvi*: Kovara Çandîya Giştî, Hejmar: 2, Gulan-1985 Paris, r. 10, Aktaran: Espar, J. Îhsan “Çend Nuştex û Kitabê Kirdkî” *Zend*: Kovara Lêkolînî, Hejmar: 1, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Payîz-1996 Stenbol, r. 44-48

4-Malmîsanij, İlk Kürt Gazetesi Kurdistan’ı Yayımlayan Abdurrahman Bedirxan (1868-1936), Weşanxaneya Vateyî, İstanbul 2009, r. 89-90

5-M. Brîndar, “Engîştê Kejê”, *Tîrêj*: Kovara Çande û Pişeyî, Hejmar: 2, Sal 1980, İzmir, r. 32-37

demeyêko kilm dima ra, cûntaya 12ê êlule hemeyê Tirkîya, bitaybetî Kurdîstanê Bakûrî de her çî dana xo ver û sey kerrayanê arêyeyî teh- nena. O wext, eke kovar yan zî kasetêka winasî welatîyêkê sadeyî ser o yan keyeyêk de biameyêne dîyene, no ameyêne manaya bi aşman işkenceyanê giranan, bi serran heps û zindan û kiştişî. Mevajê ke nê kurdkî bê, a game rewşe zaf giranêr bîyêne. Esas na rewşe ronayîşê ko- mara Tirkîya ra bigêrêne hetanî serranê 2000an, yanî heta ke pakête vurnayîşê qanûnan yê seba beşdarbîyena Yewîya Ewropa meclisa tir- kan de qebl bîy, kêman yan zêde hertim wina dewam kerde. Rîyê na rewşa wêrankare ra tam 25 serrî badê cû, badê ke na hîkaya yewine ya kirmanckî (zazakî) çarçewaya projeyêk de serra 2005 de newe ra yena weşanayene hîna neslê neweyî yan zî hîkayenuştoxê neweyî aye ra xebardar benê<sup>6</sup>. Na rewşa keyexeripîyaya, esas qedere heme lehçeyanê kurdkî û her çar parçeyanê welatê kurdan a ke ganî sey eybêk hesabê dagîrkeran ser bêro nuştene. Rîyê na rewşa girane ra edebîyatê kurdkî de gelek eserî wextê cîya-cîyayan de la yewbînan ra bêxerber, hema vajêne ke sey zayîşêkê verênî ameyê xuliqnayene. Wendox û heskerdoxê edebîyatê kurdkî, namzedê nuştoxîye hetanî destpêkê serranê 2000an, yanî hetanî tîya ra bi des serrî verî zî bi hawayêko senkronîk eseranê edebî yê kurdkî ra xebardar nêbîyêne. Tayê romannusê kurdan ke bêtêdbîrîye kerd û bi hîsanê populîstan îdia kerd ke romanê yewin yê kurdkî hetê înan ra nusîyayo, hetêk ra sedemê naye zî na rewşe bî.

Dewrê cûntaya eskerî ya 12ê êlula 1980î de hema vajêne ke heme wendeyê kurdan amey tepîştene, heps û zindanî debîy. Nînan ra hûmarêka qijkeke firsendê xo dî û vejîyay bi Ewropa. Roşinvîrê kurdi yê xortî ke qismekê înan Swêd de kom bîy, seba averşîyayîşê zîwanê kurdkî yê nuşteki, bitaybetî warê hîkaye û romanî de dest bi xebatanê erja- yan kerd, gelek kovarî weşanay. A na çarçewa de ma hûmara hîrêyine ya kovara **Çira** de ke serra 1995 de weşanîyaya rastê hîkaya diyine ya kirmanckî (zazakî) benê. Na hîkaya bi nameyê "**Derdê Derwêşî**" hetê şair, hîkayenuştox û arêkerdoxê folklorî **J. Îhsan Esparî** ra ameya nuşte- ne<sup>7</sup>. Labelê na hîkaye zî eynî sey hîkaya yewine badê ke weşanîyena des serrî dima ra ke çarçewaya projeyêk de serra 2005î de newe ra yena we- şanayene, hîna neslê neweyî yan zî hîkayenuştoxê ke welat de yê aye ra xebardar benê<sup>8</sup>. Na hîkaye de têkilîyê katibêkê kurdi yê teqawitbîyayeyî

6-Munzur Çem, Antolojiyê Hikayanê Kirmanckî (Zazakî), Weqfa Kurdî ya Kulturî Li Stockholmê, Stockholm 2005, r. 57-63

7-J. Îhsan Espar, "Derdê Dewrêşî", Çira kovara kulturî-kovara komelaya nivîskarên kurd li swêdê, Hejmar 3, îlon 1995, Stockholm, r. 55-70

8-Munzur Çem, Antolojiyê Hikayanê Kirmanckî (Zazakî), Weqfa Kurdî ya Kulturî Li Stockholmê, Stockholm 2005, r. 31-56

ke zêde tirkî nêzano ciniya ey a ke bi şaşî teşxîsê nêweşiyêka mergî ro aye ronîyayo reyde, têkilîya ey derûdor û cîranan reyde, çarçewaya nê têkilîyan de serrê 1970an yê Dîyarbekirî, numayîşê sîyasî, hetê polîsan ra eştişê keyeyan ser û tedaya înan yenê qisey kerdene. Hikaye de tayê cayan de tarîxê kurdan zî îşaret bena.

Hewna eynî wextan de, di hikayeyê şair, nuşttox û çarnayox **Serdar Roşanî** ke serra 1994 de kovara *Armanç* û *Roja Nû* de bi lehçeya kurmanckî (kirdaskî) ameyê weşanayene, dima hetê nuştoxî ra tercumeyê kirmanckî (zazakî) biyê û serranê 1995-6 de hûmaranê 2-5. yê kovara *Çira* de weşanîyay. Hikayeyê bi nameyê "**Bircanê Dîyarbekirî ra Mektubêke**" û "**Gozêre**" ke hesreta azadiya neteweya kurdan qisey kenê, eynî sey her di hikayanê verênan, teqrîben des serrî dima ra, badê ke serra 2005î de newe ra yenê weşanayene, hîna neslê neweyî yan zî hikayenuşttoxê ke welat de yê înan ra xeberdar benê<sup>9</sup>.

Standardîzekerdişê kirmanckî (zazakî) surgunde gelek erey dest pêkerd. Grûbêk roşinvîrê kurdan ke bi hawayêko mecburî tayê welatanê Ewropa de sey multecî mendêne, serra 1996 de Swêd de kom biy. Roşinvîrê ke şaristan û qezayanê cîya-cîyayan yê Kurdistanê Bakurî ra biy, xo bi nameyê "**Grûba Xebate ya Vateyî**" name kerd<sup>10</sup> qaydeyê gramerê kirmanckî û formê çekuyanê ke sey standard ameyê qebul kerdene kovara *Vateyî* de day weşanayene. Kovara *Vateyî* ke hetanî nika 33 hûmarê aye weşanîyayê, kîştê nê xebatanê ziwani de, esas seba averşiyayîşê edebîyatê nesrî yê kirmanckî wezîfeyê wendegehêk dî. Gelek nuşttoxê ke reya verêne bi rayîrê na kovare musayî wendiş û nuştîşê kirmanckî yan zî bi rayîrê na kovare wendiş û nuştîşê xo aver berd, demeyêko kilm de her yewî di-hîrê kitabê hikayan weşanay. Mîyanê şeş serran de, bi nameyê "**Binê Dara Valêre de**" (2002), "**Halîn**" (2006) ve "**Ez Gule ra Hes Kena**" (2007) hîrê kitabê Roşan Lezgîni, bi nameyê "**Beyî Se Bena?**" (2004) kitabêkê J. Îhsan Esparî, bi nameyê "**Hikayeyê Koyê Bingolî**" (2004) kitabêkê Deniz Gunduzî, bi nameyê "**Hewnê Newroze**" (2005) kitabêkê Munzur Çemî, bi nameyê "**Omid Esto**" (2006) kitabêkê Huseyîn Karakaşî, bi nameyê "**Gorse**" (2007) kitabêkê Jêhatî Zengelanî û bi nameyê "**Xafilbela**" (2008) kitabêkê Murad Canşadî, pêropîya new kitabê hikayan bi kirmanckî weşanîyay<sup>11</sup>. Nê hikayenuşttoxan ra Huseyîn Karakaş û Murad Canşad zindan ra nusenê.




Hetê tema ra hikayanê kirmanckî de merdim rastê nimûneyanê

9-çc. r. 124-158

10-[http://www.zazaki.net/html\\_page.php?page=vate](http://www.zazaki.net/html_page.php?page=vate)

- <http://www.zazaki.net/haber/vate-33-cikti-340.htm>

11-[http://www.zazaki.net/html\\_page.php?page=wesanxane\\_vate](http://www.zazaki.net/html_page.php?page=wesanxane_vate)



kilîşeyan nêbeno. Ganî merdim na rewşe sewîyeya edebî/estetîkî ya edîbanê kirmancan ra girê bido. Çünke bi rastî zî hikayeyê kirmancî hetê krîteranê edebî ra, hetê kalîteyê hikaye ra, hetê şuxulnayîşê ziwani ra meydan de yo ke bi hawayêko pêroyî sewîyeyêk ser ra yê. Mîyanê hikayanê kirmancî de nimûneyê ke merdim goş nêdo û erjayeyê eleqeyî nêvîno zaf kêmi yê. Taybetîya tewr asaya ya hikayenuştoxanê kirmancan na ya

ke ziwani rast û ekonomîk şuxulnenê. Helbet bi hawayêko metaforîk şuxulnayîşê ziwani teybetîyêkê edebîyatî yo la ziwananê birindaran ê sey kurdî de ke tedaya girane ver merheleya standardîzekerdişî hîna tamam nêkerda, eke metaforîya ziwaniye bêkontrol û elelûsul bivirazîyo, a game ziwani de kaos/anarşî virazîyeno, heta ke do sîstemê bingeîn yê zwanî seqet bibo. Sey nimûneyî, mîyanê kurdanê kurmancan de gelek edîbê ke ziwani baş şuxulnenê estê la gelek nuştoxê kurdî yê kurmancî zî estê ke perwerdeyê tirkî dîyo û kewtê binê tesîrê asimilasyonêkê pêti, coka eseranê xo yê ke bi mentiqê tirkî nusnenê û bê ke redaksîyonêkê tenduristî ra yan zî kontrolêkê editoriye ra bivîyarnê, vejenê pîyase. Eke merdim nê hetî ra muqayseyêk bikero, semedo ke kirmanckî de mekanîzmayêka bikontrolê yê redaksîyonî ameya pê, coka ziwani bi hawayêko biistîqrar aver şino. Heto bin ra, semedo ke hikayanê kirmanckî de kalîteyêka asaya ameya pê, coka hikayenuştoxê ke dima beşdarê na seha benê, mecbur manenê ke na rewşe bigêrê verê çimî. Bi no qayde kalîteya hikaya sewîyeyêk ser ra manena.

Anika edebîyatê kirmanckî de şaxê sereke hikaye ya. Tewirê edebî yo tewr pê ke tewr zêde wanîyeno û tewr zêde nusîyeno hikaye ya. Payîzê serra 2009î de kitabê hikayanê kirmanckî "**Binê Dara Valere de**" ra hikaya bi nameyê "**Baba**" bi cynî nameyî bîye film<sup>12</sup>. Bi nê hawayî hikaye seba geşbîyena şaxanê binan yê hunerî zî bena çime û wina aseno ke no proses do hîna aver şiro.

Sey netîceyî, prosesê geşbîyena hikaye ke bi vejîyayîşê kovara *Vateyî* dest pêkerdo, bi cynî suretî dewam kenê. Warê hikaye de, kîştê xebata hikayenuştoxanê ke cor ra nameyê înan vîyartbi, nuştoxê neweyî zî beşdarê nê karwanî benê. Sey nimûneyî, nika tewr tay panc dosyayê hikayan *Weşanxaneyê Vateyî* de seba çape amade yê. Seke aseno, na rewşe naye îsbat kena ke, eke bineyke bo zî kurdî biresê rewşêka serbestîye, hem şênê xo aver berê hem zî serkewtinanê zaf girdan qezenc bikerê û sey her warî, warê edebîyatî de zî xo biresnê sewîyeya miletanê averşîyayan.

---

12- <http://www.zazaki.net/haber/kirmancca-zazacada-ilk-kisa-film-391.htm>



# ŞİRETÊ ŞAİRÎ

Xerîbzeman

I

Hero camêrdo! Pay bide erd ro tif bike  
Zaf Nemrudî binê linganê to de yî lanet bike  
Meyxane ra mevecî, birîna esaretî daru bike  
Dinya Silêmanî rê zî nê menda, çik derd meke

II

Bira! Samedê na dinya derd meviraze  
Binê na dinya diryayo, derz meviraze  
Gonîya engure firr bike, qet ceng meviraze  
Zenge deke milê aye ra xo rê şeng viraze

III

Zemano ke vîyart û şîyo pê ax meke  
Meşt zî nêameyo pê wel-wele meke  
Xeyalê vizêr û meşt rê xo wêran meke  
Enka roşan bike, demê xo îsraf meke

IV

Tim û tim xerepêno saz beno eno ca  
Zanayîşo mutlaq çin o megêr îta uca  
Pirnikê xo biveşne, karê xo zî bîya ca  
Zûrî meke, fekê xo biderz meşo her ca

V

Şewşewoka şewreng de xelwet çin o  
Merdîmê kîninî rê huyayîşê rojî çin o  
Merdîmê hesudî rê cayêk de lezet çin o  
O ke çikod û zikrut o, ci rê mirdone çin o

## VI

Mêriko kîbr ra dûrî şo! O gelêk ehmeq o  
Vano qey reseno koyan, erd qul keno  
Cor ra ewnîyeno, pîrriker zî berz keno  
Şeytan ci ra remano, o nêzano se keno

## VII

Mal û milk arêmedîn, willahî adiro sûr o  
Tim o ke merg esto, her çî jehr û ziqum o  
Derd, hurdi-hurdi vareno, eno ezabo pîl o  
Homa ma ceza keno peyen mewt û kul o

## VIII

Axirê zeman o, dostanî çewî de nêbena  
Zindewarî zî zalim a, ci ra umud nêbena  
Lo embazo! Pê ena qine camêrdî nêbena  
Xo rê zaf biwane! Bê qeleme doze nêbena

## IX

Boya tîfilê binê şuşa ra ma serxoş bîy  
Her çî ra ma fek vereda, ma zerrweş bîy  
Perey çin î, meyxanan de ma rehîn bîy  
Guneyê ma şuyayî, ma pank û temiz bîy

## X

Ehlê mey bîyayîş, her ca de azadî ya  
Haya geyrayîş derd o, rakewtiş bextîyarî ya  
Remayîş yew şeref o, mendiş zî risîyayî ya  
Qanûnê felekî no hawa yo, dinya eware ya

# J. Îhsan ESPAR: ŞÎIRE CEWHERÊ MEZGÎ Û AHENGÊ VENGÎ YA


## Roportajkerdox: Roşan LEZGÎN

*No roportaj seba keyepelê Zazakî. Netî virazîyabi û roja 03.10.2009 de weşanîyabi. Labelê seba ke edebîyatê ma de, bitaybetî warê şîire de roportajêko muhîm û erjaye yo, ma hûmara verêne ya kovere de newe ra weşanenê.*

\*\*\*

- Kek Îhsan, eke bi destûrê to bo, ez wazena seba wendoxanê Zazakî.NETî çarçewaya şîire de tayê persan bipersî. Ti keremê xo ra fikr û zanayîşê xo ma reyde pare bikî, ez zaf menun bena.

- Roşano delal, verê ez wazena to û embazanê to seba xebata Zazakî.Net zerrîya safî ra pîroz bika. Şima dest bi xebatêka gelek muhîme kerdo. Ez bawer kena ke kirdkîya şîirine bi weşanê Zazakî. Net hîna geş û xurt bena. Şima rê qewet bo! Bêguman ez bi keyfxweşî wazena cewabê persanê to bida, helbet eke ez bizana.



*Roşan Lezgîn û J. Îhsan Espar*

- Seba nezaket û kubariya to, zaf sipas. Ma wina dest pêbikin. Gelo şûre çi ya? Şûre senî tarif bena, yan zî yew tarifê şûre esto?

Persê to ra zî fehm beno ke ti zanê cewabê nê persî asan niyo. Nê persî roja rojên ra heta ewro sereyê gelek edîb, alim û filosofan deynayo. Înan ra her yewî waşt ke goreyê demê xo nê persî rê cewabêko maqul biveyno. Labelê na munaqêşe hema zî dom kena.

Ti zanê mitolojiyê yunanîyan de Orfeus esto. O lajê Homa Apollo yo û temsîlkarê muzîk û deyîrbazîye yo. Gelek weş enstrumana lîre (lyra) zî ceneno. Goreyê mîtoloji o hende weş ceneno û vano ke heme heywanê wehşî û kovî gama ke ey goşdarenê benê kedî, awa robar û çeman vindena seba ke ey goşdaro. Orfeus yew cinîya zaf rinde reyra zewecîyêno. Demêk ra pey marêk cinîye de dano, cinîye mirene. Orfeus delu-dîwane beno, yaban keweno û deyîranê derdan vano hetanî ke yeno kîştîş. Mergê ey ra pey lîra ey bena grubêka estareyan ke nika astronomî de bi nê nameyî, yanî "lyra" yenê naskerdiş. Yeno zanayîş çekuya "lîrik" yunanîya kan de yena manaya şûra ke lîre (lyra) reyde vajiyêna.

Platon îddîa keno ke şairî bi hunerê xo nêşiyênê hende şûranê weşan binusê, no dayîşê Homayî yo. Homa zereyê înan de û wayîrê înan o, coka ê şiyênê bixeliqnê. Eke şairî wayîrê hunerî yan zî wayîrê metodêkê arizî bibînî şiyaynê babetanê bînan de zî çîyanê weşan û hêcayan bixeliqnê. Ê bi sayeyê perîya îlhamî ya homayî xeliqnenê.

Zerrîya şairê namdarî Melayê Cizîrî dekwena waya mîrê Botanî. Rîwayetan gore, Melayê Cizîrî şînê Birca Belek ver de piştîya xo daynê yew kerra û waya mîrî rê şûrê xo wendî. Waya mîrî zî ameynê pencera ra şûrê ey goşdarîtinê. Vatişan gore kerraya ke Melayê Cizîrî piştîya xo daynê ci, eşq û zerrî ra wendişê şûran ver bîne sey adirî. Gama ke Melayê Cizîrî uca ra şînê cinîyanê Cizîre nanê xo daynê a kerra ro û pewtî.

No ware de Feqîyê Teyran ser o zî gelek meseleyî vajiyênê, mavajî vanê ê zîwanê teyran zanaynê. Ez zaf sereyê to nêdejna la derheqê şair û edîbanê mîletanê bînan de zî efsaneyê winasî estê.

Nê meseleyanê corênan ra ehemîyetê "vate"yî fehm beno, bi taybetî vateyê ke hetê westayanê hunermendan ameyê terbiye û tefsîrkerdiş heta newe ra ameyê xeliqnayîş û xebitnayîş. Vateyê winasî sey "Kelanê Qedîmî" pîroz û berz vîniyayê.

Tayêne gore, şûre heta demê romantîzmî binê tefsîrê Platonî de mende, yanî Homa îlham tena dano tayê ruhanê taybetîyan. Heta tayê îddîayan kenê ke almankî de çekuya "Dichten" (şûre nuştîş), "Gedicht" (şûre) û diktare (dikte kerdiş) zî têkilîyê xo bi na bawerîye esto. Yanî şûre çîya ke yena dayîşnuştîş, yena diktekerdiş. Swêdkîya ewroyîne de zî "dikt" "şûre" ya û "diktare" zî "şair" o.

Labelê sey heme çiyî, derheqê şûre de zî vînayîşî vurîyayî û fikrê hîna rasyonelî vejîyayî meydan: Dîderotî şairîye sey kedkarîye dîya. Mayakovskî zî karê şûre sey produksiyonî (üretim) hem zî produksiyonêko gelek zehmet û tēmîyankewte dîyo. Vînayîşê Ahmed Arifî zî nêzdîyê Mayakovskî yo: (...) “Û ez şair a/Yanî karkerê namusî ya/Karkerê zerrî. (...)”. Şairê fransizî Charles Baudelaire, îlham û ked û xebata şairî sey waye û birayan vînayî, o înan yewî ra zî nêviyarto. Hemwelatîyê ey Paul Valéry, mîrê şûre de estbîyayîşê îlhamî red nêko zî yewna perspektîf ra nê meseleyî ra ewnîyayo. Goreyê Valéry, *karê yew şairî hiskerdişê rewşa şîrkî niyo, wezîfeyê şairî serwbî kesan het xeliqnayîşê na rewşe yo*. Şairo namdar Paul Éluard zî nêzdîyê Valéry çîyan vano: *Şair îlham girewtîş ra vêsêr ganî îlham bido*.

Bêguman mefhumê ke tēkilîyê xo bi şûre estê, zaf ê. Voltaire wina vano: *Şima xo vîr kenê ke şûre verê-verkan malê hîsan a, şûre muzîkê rubî yo*. Rast o, hîs şûre de elementêko gelek esasî yo. Bêguman merdim her game gelek çîyan hîs keno, labelê hîso ke ez behs kena hîso şîrkî yo. No hîso terbîyekerde, nesilîyaye, dewlemend û ceribnaye yo. Wendox û goşdaritoxê şûre aşînayê nê hîsî yo. Bi şûre reyra her wendox şîyêno nê hîsan fehm biko. Bêguman şair ganî xo klîşeyan ra bipawo. Semedo ke şair bişîyo hîsanê wendoxî ser o tesîr biko, cîhanê xeyalanê wendoxî hîna hîra biko ganî bişêyo şûre de ca bido teşbîh, anafor û metaforan. Merdim ganî naye zî vajo, hîsê ke şair bi çekuyan mana dano înan, tena hîsê şairî bi xo nîyî, ê mîrasê cûya merdimeyî yê.

- **Beno ke îlham dayîş zafê nuştayan de estbo. Ferqê şûre çi yo?**

- Şûre tekstanê bînan ra tena bi şekil ney labelê hîna zaf hetê mana û muhtewa ra, hetê rîtm, harmonîyê vengan û hetê ziwanî ra cîya ya. Zaf rey manaya şûre hetê wendoxan ra cîya yena fehmkerdiş yan zî tefsîrkerdiş. Cora vanê “Her wendox/wendoxe şûra xo newe ra nuseno”. Yanî her wendox/wendoxe goreyê zanayîş û tecrubeyanê xo şûre bi hewayêko bîn fehm keno. Çunke zaf rey binê qisayanê zaf sadeyan de manayêka xorîne nimita ya. Yanî fehmkerdişê şûre de sewîyeyê cîya-cîyayî estê.

Nika ma bêrê terîfê şûre ser. Terîfê minê şûre çin o. Ez bi xo bawer nêkena ke terîfêko pêroyî yê şûre esto labelê ez vana qey merdim şîyêno şûre bi yew hewa fehm biko. Bêguman fehmkerdişê cîya-cîyayî estê. Nê rêzanê cêrênan de mi fehmkerdişê xo îfade kerdo:

(...)

Qisayî estê

zetal ê, krîstalî

hîsdar ê, şîrkî  
cewherê mezgî,  
ahengê vengî  
û sey zerrnê safî,  
sey yaqutê sûrî  
vêrenê  
dîwanê heme homayan de.

**- Her kesî rê şîire lazim a? Yanî, çi ihtîyacîyê însanî bi şîire esto, yan zî, ma vajin ke ihtîyacîya kamî bi şîire beno? Çira beno?**

- Seba qismê verênî, hema bê ke merdim zaf bifikirîyo, şîyêno vajo ke ney her kesî rê şîire lazim nîya. Labelê demêk ra ver mi cayê çîyêko winasî wendibi: Eke vilikî rîyê dinya ser ra wederîyî, hetê maddî ra dinya ney ra zîrar nêveynena. Labelê kam şîyêno biwazo wa vilikî rîyê dinya ser ra wederî. Belkî şîire her kesî rê lazim nîya labelê kam şîyêno vajo ke wa şîire çin ba. Eke cayê şîire cuya merdimî de çin bo gelo merdim namdarîya Homerosî senê şîyêno îzeh bikero? Wextê ey ser ra hema-hema hîrê hezar serrî vîyartê hema zî kitabanê tewr zaf roşîyayeyanê dinya mîyan de Îlyada och Odyssee, estê. Zaf miletî bi edîb û nuştoxanê xo yenê naskerdiş. Ez bawer kena ke merdim roşnvîrîya kurdan ke mezgê prosesê miletbîyayîşê kurdan o, bê Melayê Cizirî, bê Ehmedê Xanî, bê Ehmedê Xasî, bê Cigerxwîn ûsn. nêşîyêno bifikirîyo. Ez vana qey rolê şîire, nermbîyayîşê têkilîyanê însanan de, xurtbîyayîşê humanîzmî de û tekamulbîyayîşê wijdanê komelî de esto.

Gama ke ma tikêna çarçewa tenge bikerê vajê "ihtîyacîya kamî bi şîire bena, çira bena?" pers hîna zehmet beno. Çunke kes nêşîyêno kategorî yan zî grûbêk bimusno vajo na kategorîya komelî hîna vêşî ihtîyacê xo bi şîire esto. La ke merdim wendoxanê şîire ra biewnîyo, vînenê ke hîna vêşî kesê wende û roşnvîrî yî. Heme dinya de wendox-nuştoxê şîire zaf nîyî la welatê ma de hem nuştox û hem wendoxê şîire gelek-gelek tay ê.

Mi verê zî vatbi, şîire eserê zîwanî ya, zîwan zî tena wasitayê komunîkasyonî ney la wasitayê kulturî yo zî. Şîire hetêk ra neslan mîyan de bena pirdê kulturî, heto bîn ra zî hîsê merdiman şîire de benî sentezêk, şîire hîsanê merdimî bi motîf û renganê neweyan ne-qîşnena.

**- Gelo şîire zî yew wasitaya xoîfadekerdîşî ya, yan şîire yew çek a? Çi ya?**

- Verê ez wazena fikrê di şairanê namdarên pêşkêş bika: "(...) *Şîra tewr esîle, şîra tewr girde û şîra ke layiqê nameyê xo ya şîra ke tena merdim semedê zewqê şîrenuştîşi ra nuseno (...)*" Baudelaire wina vano. Labelê Mayakovski het şîre yew çeka têkoşînî yo. Gama ke seba xebata şîre pêşniyazanê xo nuseno, wina dest pêkeno: *Yê yewine: Gani komel de problemêk bibo û merdim winî bifikirîyo ke no problem tena bi şîre hel beno. Yanî emrêko komelkî. Yê diyine: Waştîşanê sinîfe yan zî cematê ke ti temsil kenî, gani ti baş bizanî yan zî his bikî, yanî mewzîyo ke ti nişan gênî (...)*.

Sey Ehmed Arifi Pablo Neruda zî cayê behsê "*namusê şîre*" keno. Ez bi xo "*namusê şîre*" ra di çîyan fehm kena: Yê yewine taybetmendiyê aye yê hunerî yê, mavajî xorînîye, ziwan, zerafet, rîtm ûsn. Yê diyine fonksiyonê şîre yo. Şîre ganî nêba wasitaya meth û wesfanê îqtîdar û serekan. Komel de xurtkerdiş yan zî destekkerdişê kult û putan karê şîre nîyo. Şîre haceta îqbalpeydakerdişî zî nîya.

**- Merdim şêno bi şîre se biko? Yan zî mavajin ke ma kurdî şênî bi şîre çi havile bikin?**

- Gelek hetan ra kurdî zî sey miletanê bînan ê. Sey miletanê bînan kurdî zî yew mintiqaya cografik de ciwiyênê û wayîrê ziwan, kultur, edebîyat, tarîx, urf û edetanê arizîyan ê. No het ra şarê bîni bi şîre çi havile kenê, kurdî zî abiasan. Labelê hetê ke kurdî miletanê bînan ra çîya yê têkiliyê xo raste-rast şîre reyra estê. Ziwanê kurdkî hema zî Kurdistanê Vakurî de ziwanê perwerdeyî nîyo. Çiyê ke nê serranê peyênan de hetê musbetî de vurîyayî, averşîyayîşê ziwanê kurdkî ser o zaf tesîrêko gird nêkenê. Çunke dewleta Tîrkîya bi politikaya xo ya asîmilasyonî ya dergûdilaye, texribatê ke komelê (toplum) kurdan de kerdê, texmînanê ma ra zaf-zaf xirabêr ê. Politikaya kemalîstan a şovenîste ziwanê kurdkî kokê xo ra abirnayo. Ewro çi heyf ke ziwanê ma bîyo ziwanê ê kurdan ke tirkî nêzanê. Nê kesî zî roj bi roj hîna kêmi benê. Hezar heyf ke ewro ziwanê kurdkî êdî ziwanê qîcan û ciwananê kurdan zî nîyo.

Serra 2007î de mi Înternet de yew roportajê şair Rojen Barnasî wend. Roportajkerdox verê ke persê xo biko vano: "*Ti kurdan miyan de şaireko gelek şinasîyaye yî. Bi taybetî zî şîrê to hetê her kesî ra yenê zanayîş (...)*" Rojen Barnas, bi hawayêko gelek mutewazî, vano: "*Ti bêpeyme wesfanê mi danî, sipas! Belkî to rê wina bo, la rastîye wina nîya. Herçiqaş şair romantizm ra hes kenê zî ez merdimêko realist a. Beno ke heme Kurdistan de qasê 100-120 kesan nameyê Rojen Barnasî eşnawito, la înanê ke eserê ey wendê 40-50 zîyadeyêr nîyi. Na zî kitabênê minê roşîyayeyan ra bellî ya.*"

Semedo ke merdim bişîyo bi şîre çiyê biko ganî "bazar kesad" nêbo. Ganî şîre wendoxan biresa. Ma dewijan û nêwendeyan ca verdê gelek akademîsyenê kurdan ziwane kurdî de analfabet ê. Na trajedî sewbîn cayê dinya de çin a. Bêguman nê şertan de zî ganî şîre binusîya. Şîre ganî hemberê zulm û neheqî, azadî, heq û edeletî bipawa. Gelek rey şîre tehta sêneyê zulmî ser o zergûn biya û biya çimeyê hêvî û cuya newa. Şîre ge-ge wayîrê hêz û qudretêkê efsûnî ya. Ez fehmkerdîşê nê taybetmendîyanê şîre muhîm vîna.

- Faydeyê şîre ziwani rê çî yo? Mavajin eke yew ziwane de şîrî çin bê, yan kêmi bê, zirarêk ziwani rê esto? Yan zî, eke yew ziwane de şîrî zaf nusîyay, rewşa ziwani senî vurîyena? Xulasa têkilîya ziwani û şîre çî ya?

- Faydeyê şîre ziwani rê zaf o û têkilîyê ziwani û şîre zî taybetî yê. Eke merdim ziwani sey hêgayêk bifikirîyo, şîre zî sey bezreyî ya. Hêgayo nêramite û bê bezre beno beyar û çî ber nêdano. Ziwanê ke pey şîre, romanê nênusîyo, estetîze nêbeno û fonksiyonel nîyo. Helbet ziwane tena bi şîre nêbeno fonksiyonel. Ziwanêko winasî ganî ziwane edebîyatî, îdareyî, huqûqî, siyasetî, perwerdeyî, medya û yê dînî bo.

Şîre sey romanî, hikaye û ceribnayîşan yew hunero ke ziwani reyra beno. Ziwanê şîre xususî, weçînaye, sefênîyaye yo û zaf rey newe ra yeno xeliqnayîş. "Şîre, wayîrê yew manaya giran a ke ziwane rojaneyî caran nêşîyayo û nêşîno aye bido piştîya xo" Paul Valéry wina behsê ziwane şîre kerdo. Eynî problemî ser o Octavia Paz vano: "Şîre ziwane o. Ziwanêk ke verê ke bi qiseykerdîşê û nesrnuştîşê xirab bibo, o ziwano verên o."





Şîre eserêkê ziwani ya. La no ziwane, ziwane rojane ra çîya, ziwane kesîbîyaye, zirav, xurt û dewlemend o. Çekuye şîre de zaf rey manaya xo ya rojane ra teber yewna mana dana û hem hetê mana ra hem hetê ahengê vengî ra yena xebitnayîş. Vijnayîşê çekuyan pabesteyê muhtewaya şîre yo. Şîre de persanê esasîyan ra yew timûtîm no yo: Gelo şairî şîyayo ziwaneke neweyî, ziwaneke şîrkî bi-xeliqno yan ney?

**- Kirdkî de çiqas şîrî estê? Çend şairê bellikerdeyî estê? Şîrê inan senin ê? Rewşa şîra kirdkî senin a? Taybetmendiyê şîra kirdkî çî yê?**

- Ez nêzana çiqas şîrê kirdkî estê. Labelê nê serranê peyênan de kirdkî şîrî nusîyênê. Mavajî kovara Vateyî de hamnanê serra 1997 ra hetanî zimistanê serra 2009, 32 hûmaran de 252 hebî şîrî neşr biyê. Hetanî nika qasê ke ez zana nê des kitabê şîran vejîyayî: **Herakleitos**



(Malmîsanij), Dîwan (W. K. Merdimîn), **Dêsan de Sûretê Ma Nîmite (Roşan Lezgin)**, Min Hesretan de Mevirde Meso, (Îlhamî Sertkaya), **Zerîya Min To de Mend (Îlhamî Sertkaya)**, Azebe (Çetîn Satici), **Roja Sîpiye (Çetîn Satici)**, **Dilopê Zerrî (J. Îhsan Espar)**, **Delala Çimrengîne rê Qesîdeyî (Zulkuf Kişanak)**, **Dejê Nîmîteyî (Newzat Valêrî)**. Ninan ra Çetîn Satici û Îlhamî Sertkayayî her yewî di kitabê şîran nuştê.



Peymeyê şairîye çî yê, ez weş nêzana. Gelo şair îlle ganî wayîrê kitabê şîran bo yan şîrî bes ê? Eke merdim tena wayîriya kitabî sey peyme qeub biko heşt şairê kirdkî estê. Nê kitaban ra **"Dejê Nîmîteyî"** semedo ke newe vejîyayo, mi hema nêwendo. Ez ganî ro xo na ke mi şîrê Çetîn Satici û Îlhamî Sertkayayî hema bi baldarî nêwendê.

Meseleyê senîniya şîranê kirdkî de ez şîyêna naye vaja: **Şîrê ke sey kitabî neşr biyî vêşaneyê înan hem hetê muhtewa hem hetê zîwan û hem zî hetê strukturê şîre ra baş ê. Şîra kirdkî nîsbeten newa**


**ba zî miheqeq taybetmendiyê xo estê. La ez bi xo ser o nêxebitîyaya coka ez nêwazena çiyê vaja.**

**- To key dest bi nuştîşê şîran kerd?**

Mi şîra xo ya verêne destpêka serra 1990î de nuşte. Na şîre zimistanê 1991î de, hûmara 6. ya kovara Rewşenî de neşr bî.

**- Şîrnuştîş de ti binê tesîrê çiyê de mendî?**

Sebebanê meluman ra mi zî şîre bi zîwanê tirkî nas kerde. 1980î ra ver ez vana qey çend şîrê mamoste Malmîsanîjî yê kirdkî û çend hebê ke ey tirkî ra tadaybîyî mi wendê. Dima zî zaf şîrî nênusîyayî.



Herakleîtos, kitabo verên ê şîra kirdkî yo. Mi reyêk yew programê televîzyonî de vatibi ez tîya zî vana, no hem semedê şîra kirdkî û hem zî semedê şîrsînayoxanê kirdkî şansêk o. Çünke zaf rey çiyêk senê dest pêbiko winî dom keno. Herakleîtosî îspat kerd ke şîre “eman û hewar” nîya, “welat û şewat” tena qet nîya. Şîre kede, zanayîş, his û xeyal o; şîre rîtm, aheng, erje û rûmetê çekuyezanayîş o. Ez vana qey ez nê şîran ra zaf muteessîr bîya. Hetê xebitnayîşê zîwanî ra, hetê awankerdişê strukturî ra ez gelek çîyan nê şîran ra musaya.

**- Ti kamcîn şairan ecebnenî?**

Ti zanê dinya de şairê başî verê zî estbîyî û ewro zî estê. Keyeyê înan awan bo zaf şîrê başî nuştê. Çend nameyê ke yenê vîrê mi nê yê: Kurdan ra Rojen Barnas, Ehmed Huseynî, Kemal Burkay. Şîrê tirkî yan ê ke mi bi tirkî wendê: Ehmed Arif, Cemal Sureya, Enver Gökçe, Can Yücel, Jacques Prevert, Konstantinos Kavafis, Mayakovskî, Pablo Neruda...

**- “Dilopê Zerrî” ra pey ti êdî şîran nênusenî?**

- Eke kerjalê dinya verdo, ez wazena binusa.

**- Kek Îhsan. To derheqê şîre de malumatê zaf muhîmî dayî. Seba ke to wextê xo mi rê abirna, ez to rê zaf sipas kena.**

- Keyeyê to zî awan bo ke to xo kerdo binê nê barê giranî, ti xizmetê millet û zîwanê xo kenê.

# PAWITENE

Mehmed Eli SADIQ

Zerrîya mi veşena zerrîya mi  
Sek kila adirî kewta ganê mi  
Bîya lete-lete qesebaya mi  
Erê, to ez caverdaya şîya ça?

De vace dîlberê ti ser a şîya  
Pawena nêpawena qey ti nîna  
Heta key no cîyabîyayîşê ma  
Erê, to ez caverdaya şîya ça?

De hên bê, mi dir nêmend sebir  
Mîlçikanê wesarî ra bê tedir  
Werêkna ti biameyne bi mi dir  
Erê, to ez caverdaya şîya ça?

Ti sey nameyê xo yew melek a  
Zerrîya mi de yew gul û vilik a  
'Umir qedya pawebê to vinderta  
Erê, to ez caverdaya şîya ça?

# ROMANANÊ MEHMED UZUNÎ DE ENSTRUMANÊ MUZÎKÎ

Murad CANŞAD

Roman, edebîyat de çeşîdêko newe yo. Tarîxê xo hende tarîxê şîiran û hikayan kan (kehen) nîyo. Çendeyê hezar serran ra ver şîirî nusîyayênê, la roman çendeyî seserrî yo ke nusîyeno. Roman eserêko çarçewahîra yo. Metnê xo dergûdila yo, hedîseyê xo dergûdila yê. Zereyê na çarçewaya hîraye de komel esto, komelêk ra leteyêk esto. Nuştox bi hunermendîye têwgêreno, heyat û hedîseyanê zereyê çarçewa hurdî-hurdî neqîşneno. Nuştox karê xo de çiqas westa bo, zereyê çarçewa zî hende weş neqîşneno. Seke roman çarçeweya xo hîra ya û sey vatişê Stendhalî “ganî tede keweyê asmênî zî çamura kuçeyan zî estbo”, ma eşkenî cîya-cîya krîteran esas bigîrê û goreyê nê krîteran romanan tehlîl bikerê.

No war de romanê Mehmed Uzunî xeylê-xeylê destdaye yê. Ey bi kirdaskî hewt romanî nuştê û romananê ey de şaro kurd esto. Dewijî, şîwaneyî, bêrivanî, roşnvrî, rayberî, dengbêjî... Beno ke merdim bi cîya-cîya krîteran a romananê ey ser o bivindo. Ez wazena nê nuştayê xo de hetê muzîk û enstrumananê muzîkî ra romananê Mehmed Uzunî ro nîyabida (nîya bida).

## Tî

Romanê ey o verên “Tî” yo, 1985 de çap biyo. Qehremanê romanî xortêko welatperwer o. Xorto welatperwer seke zerrîya xo esta ke seba heqan û azadîya welatê xo duştê kolonyalîstan de mucadele bikero; tepîşîyeno, tewqîf beno, îşkence vînenno, hepîsxane de maneno, hucreyêka tarîya tek-tenaye de maneno... Xortêk ca-ca behsê gedeyîya (domanîya) xo keno, wendoxan gêno beno bi ê rojanê verênan. Behsê bajarê xo, komel û keyeyê xo keno.

Cayêk de xorto welatperwer hucreya tarî de, tek-tena kêzike de qisey keno:

“Mi sanika Memê Alan ra zaf hes kerdênê. A seba mi her çî biye. Mi Memê Alan pîrika xo ra zîyadêr, waştênê ke pîyê xo ra goşdarî



bikera. Çünke lulîya (bilure) ey estbî, ey cenayênê. Ey sey sanikan ney, sey deyîran vatênê û cenayênê.<sup>1</sup>

Di lulîyê pîyê xortê welatperwerî estê. O hebêk dergûdila wina behsê înan keno:

*“Lulîyî sey di xortanê leşderganê pîlanê camêrdan, rîyê dêsi ra aliqnîyaye bîy. Hetêkê dêse oda de di lulîyî, hetêk de zî di tîfingê seydi çep-rast aliqnîyaye... Lulîyê pîyê mi dûri ra beriqîyayênê. Pîyê mi ê sey çimê xo seveknayênê, sey ma, miqateyê înan zî biyênê. Lulîyî, yewere kalikê ey ra, yewere kalikê mi ra ci rê mendbîy. Her mence o ronîştênê, bi sa-*

*etan a lulîyê xo pak kerdênê, bi rûnê vaman a ê beriqnayênê. Nêno mi vîr ke lulîyî çi dar ra virazîyabîy, çend qulîkî pîra estbîy. La ê zaf xasek bîy. Rengê xo qeweyî bî. Bêçikê pîyê mi bi hunermendiye qulikan ser o reqîsîyayênê. Bêçikî biyênê berz û niştênê. Sey govendgêran bîy; pîya ca vurnayênê, bi aheng a tédîma biyênê berz, xo lewnayênê û ancî şîyênê bi cayê xo. Vengêko zelalo melul ci ra vejîyayênê...”*

*“Pîyê mi werîştênê, lulîyêk gîrewtênê, agêrayênê bi cayê xo; şopêk pîro nîya dayêne. Bêçikê xo ser o reqîsnayênê, veng kerdênê zelal û nerm, çimê xo qemîtnayênê pêra, xo ra şîyêne. Ma ra qet veng nêvejîyayêne; odaya ronîştîşî bi vengê lulîye zimmayêne...”*

*“Vatişê çend beytan dima, ey lulîya xo ancî hêdîka gîrewtêne, fekê lulîye dayênê bi lewê xo yê cêrêni ser, ancî dest bi lulîye kerdênê.”<sup>2</sup>*

### **Mergê Kalêkê Rindî**

“Mergê Kalêkê Rindî” romano diyin o, 1987 de çap bîyo. Nê romanî de “Kalêko Rind” û xortêko welatperwer, Serdar Azad, esto. Serdar Azad hedîseyanê sîyasîyan ra nêşkeno êdî welat de bîmano, terkê welatê xo keno. Derbasê binxetî beno ke uca ra şiro bi welatanê vakurî, Stockholm-Swêd. Binxet de, dewêka feqîra îp-îpelaye de rastê serrekêkê (kokim) korî yeno. Serrek qet nêmendo bi dewijan. Qîseya xo, hal-hereketê xo sey dewijan nîyê. Serdar Azad meraq keno ke serrek kam o, çitur ameyo bi na dewe, mîyanê dewijan de çi karê xo esto... Serrekî de qisey keno, la kokim fekê xo pêt gêno. Sîrrê xo nêdano teber. Fîkr û nezerê serrekî zaf bala

1- Uzun, Mehmed, Tu, İthaki Yayınları, İstanbul, 2005, r. 65

2-e.c., r. 67-68



Serdar Azadî anceno. Serdar Azad keweno bi dima ke no fikr û nezer tekabulê çîyî keno, felsefeyê xo çî yo...

“Mergê Kalêkê Rindî” de nuştox xeylê cayan de behsê luliye û vengê luliye keno. Luliye babeta xeylê rîpelan a. Çünke serrek luliye ceneno û bengîne luliya xo yo. Luliye ra teber tebayê xo çin o. Keye-kulfetê xo çin o. Nêzewijiyayo. Tef-teftalê xo zêde niyo. Banê xo pêro-pêsero yew çime ra, odayêk ra îbaret o.

Serdar Azad şan de erey resto bi dewe. Şodir, bi vengê luliye hişyar beno.

“(…) ez bi vengêkê delalî yê luliye hişyar biya. Roja min a verêne nobême sinorî de bi vengê luliye dest pêkerdene.”

“Kışta banê şıwaneyî de banêko bin zî estbî. O ban zî sey banê şıwaneyî bî. (...) O vengo delal uca ra ameysêne. Vengê luliye bi hawayêko zîzo delal derg biyêne şiyêne. (...) Çi wext ra bi ke mi xo wina rehet û xayîs his nêkerdîbî.”

“[Kalo Rind] Luliya to, vengê luliya to ez dewe ra girewta berda leyê di luliyanê binan. Di luliye ke odaya tewr pile ya keyeyêk de biy. Yanî, o keyeyo ke êdî pey de, hewnanê mi de mendbî. (...) Ê luliye pîr û pîrbaban ra mendbîy. Zaf bêçikî înan ser o gêrabîy, zaf lewan ê fiknabîy, zaf hurnermendan înan ra vengo weşo melulo naziko pêt vetbî.”

“Wexto ke vengê luliya to uca verê berê şıwaneyî de ez sermest kerd, ê her di luliye roşnakî (bereqiyayeyî) û destê ke înan mişt danê, amey vîrê mi. (...) Wexto ke bêçikî ê luliyan ser o gêrayênê ruhê min o pepuk sey pêlan zereyê hêlekane de şiyêne ameyêne.”

“Mi hebêk dîr ra selam da û ez ver bi ey şiya. O, siya dare de, kulavêkê sûrî ser o ronîştîbî, luliya xo pak kerdêne. Wexto ke mi ver bi ey çend gamê binî estî, o wext mi hina rind dî ke o se keno; ey luliya xo bi dendikê gozan a mişt dayêne!”<sup>3</sup>

Nuştox (fekê Serdar Azadî ra) luliya Kalê Rindî wina teswîr keno:

“Luliya ey zaf xaseke biye. Luliye derga bariye... Rengê xo qarweyî bî, hetê xo yê cêrin hebêk hîra bî û bi panc helqeyan a amebî neqîşnayene. Heto corên, hetê fekî zî bi hîrê helqeyan, verê, biyêne hîra, dima ancî biyêne teng. Luliye cêr ra hetanî cor bi heşt helqeyanê seyyewbinan a amebî neqîşnayene, mabênê helqeyan de qulikî estbîy. Mabênê helqeyê corênê heştin û ê

3-Uzun, Mehmed, Mirina Kalekî Rind, İthaki Yayınları, İstanbul, 2005, r. 23-31

*hîrê helqeyanê corênan ê fekî de luliye biyêne hîra, biyênc di qatê mabênê ê heşt helqeyan. Eşkera bi ke luliye destê westayan ra vejîyabi. A, bi nazdari û delaliya xo verarda Kaloyî de beriçiyayêne.*<sup>4</sup>

Kalo Rind wina behsê xo û luliya xo keno:

*“Temam... Luliye nika biye nipînewa. Ganî ez do reyêna yan bi dendikanê vaman yan zî bi dendikanê gozan luliye mişt bida. Vengê xo hîna beno weş, bêçiki pîra hîna rind gêrenê.*

*“Eee... mabênê ma weş o, ez ci r arazî ya.*

*“Ya... luliyêka xasek a. Çend serrî yo ka ma pîya yê. Xeylê-xeylê ser-ran ra ver, dostêkê mi na luliye seba mi viraşte û daye mi. A roje ra nat, ez û na luliye, ma pîya yê. Ma xo dayo yewbînî. A bena nemedara tenayiya mi zî...”*<sup>5</sup>

Kalo Rind wina behsê xususiyetanê luliya xo keno:

*“Na luliye, luliyêka xeylê-xeylê xusûsî ya. Luliye winasî darêka zaf xusûsiye ra virazîyênê. Nameyê xo “kevûk” a. Na dare her ca de nêbena. Tena dorûverê Cizîra Botanî de, koyanê nêzdiye Cizîra Botanî û dorûverê Araratî de bena. Darê xo zaf huşk û pêt o. Ley-lejgê xo çewt-mewt niyê. Lejgê ke yenê birnayene, qisim-qisim benê, ci ra luliye virazîyena. Seba nê karê hesasê tenikî sebr û hunermendiye lazim a. Embazê min o rehmetî ke na luliye mi rê viraştbi, çar serrî ser o xebitîyabi. Tam çar serrî! (...) Dergîya luliyanê winasiyan zafane hewtay santîm ê. Ganî merdim westayêko çust bo ke ci ra veng vejo.”*<sup>7</sup>

Rojêk, Serdar Azad, Kalo Rind, şiwane û çend dewijî odaya Kalê Rindî de ronîştê, suhbet kenê. Kay, yarenîye, huwayîş... Tûrikê dewijan pîrrê mesela û sank ê! Şewe xeylê şina. Kalo Rind vano, “Şima xeylê qisey kerd, de bes o, meke ez şima rê luliye bicena.” Nuşttox fekê Serdar Azadî ra derheqê a game de wina vano:

*“Mi ra vêşêr dewijan keyf kerd. Înan hema destî day pêro. Reya verêne mi a şewe dî ke Kalo bi terzêkê binî zî luliye ceneno; vengê luliye nika keyf, yarenîye û şênayî varnayêne. Nika herinda ê vengê zîzê melulê kedernakî de vengêko şên estbi. Kaloyî çimê xo girewtbîy, hêdî-hêdî luliya xo puf kerdêne. Destî, ê bêçikê barî ancî bi westayiye piştîya luliye ro gêrayênê. Bêçikan hema bi nîzami qulikê luliye diyêne, bi rehetîye ser*

4-e.c., r. 36-37

5-e.c., r. 36-37

6-**Kevûk:** Kamcîn dar a, mi doz nêkerde. Ferhengê Îzolî ferhengê Z. Farqînî de “Kevot” esto. Kevot çeşidêkê lepikêran a. Hîna zêde koyê Gebarî de bana. Qîrmê xo qalînd o, qama xo dum-duz û derga-derg a. Velgê xo hîrêserre yo; sereyêk cayê mabenî de, di sereyî kîştene ey de... Darê xo zaf pêt û huşk o. Ci ra luliye, qelune, koçike û çemçe virazîyeno. Wisar tewr varê na dare zergun bena. Na dare ser o xeylê deyîrî estê.


7-e.c., r. 60

*girewtêne û verdayêne. Ge-gane bêçîkêk çend rey serê eynî qulike girewtêne û veradayêne. Kalo timûtim rihuyaye bî. Ey bi keyf, bengîni û melulîya xo puf kerdêne.*

*“Yê dewijan zî keyf û kelebut bî. Vengê lulîye ver ruhê inan hejîyayêne. Deyîra ke Kaloyî bî lulîye cenayêne, inan zanayênê û ge-ge veng wedarîtêne û ver de lornayênê. Wexto ke nêlornayênê zî destî dayênê piro, biyêne nêmdarê muzîkî. Ge-ge zî Kalo vistêne miyanê heyecanî, vatênê ‘Helal!... Helal bo to rê!’”<sup>8</sup>*

### **Sîya Evîne**

“Sîya Evîne (Sîya Sînayîşî)” romano hîrêyin o, 1989 de çap bîyo. Beno ka ma nê romanî ra bivajê “romano biyografîk”. Çun-ke tede heyatê Memduh Selîm Begê Wanîjî qisey beno. Memduh



Selîm Beg roşinvîranê kurdan ra yo. Destpêkê seserra vîstine de, Îstanbul de, organîzasyonanê kurdan de ca gêno û seba heqanê kurdan mucadele keno. Mistefa Kemal û embazê xo ke îdareyê dewleta newîye gênê xo dest, ca ro ey beno teng, 1923 de Îstanbul ra remeno şîno bi Sûrîye. O wext xeylê roşinvîr û serekê kurdan Sûrîye de kom bîyê. Şikitewerdişê hereketê kurdan yê serra 1925î dima hûmara nê roşinvîr û serekan benê zêde. Memduh Selîm Beg zî tede, nê roşinvîr û serekî uca zî mucadeleyê xo dewam kenê, bi nameyê “Xoybûn” partîyêk ronane. Ê serran bi serekîya Îhsan Nûrî Paşayî dorûverê Agirî de kur-

dan sere wedarito. Xoybûn piştî dano nê mucadeleyî, Memduh Selîm Bego ke dest bi amadekarîya veyveyê xo keno, dano piro şîno Agirî. La hereket şikîyêno, apey agêreno bi Sûrîye. La êdî ne waştîye menda, ne veyve, ne partî...

Nuştoxî nê romanê xo de enstrumananê muzîkî ra giraniye daya kemañçeyî ser. Çunke waştîya Memduh Selîm Begî Ferîha (kêneka çerkesê) kemañçe cenena. Nuştox xeylê cayan de behsê vengê kemañçeyî keno, kemañçeyî ser o malumat dano. La bê lulîye zî nêmaneno!



Memduh Selîm Beg û embazê xo yo çerkes (pîyê Ferîha) meyxaneyêk de ronîştê, pîya konyak şîmenê. Nuştoxî meyxane wina teswîr kerdo:

*“Bajarêkê qijekî de meyxaneyêko qijkek esto, ‘meyxaneyê armenîyan’. Masa û sendelîyê texteyênî. La neqîşnaye û cilakerde. Erd ra xalîyê Wanî. Xalîyê welatê Memduh Selîm Begî. Dêsan ra resimê xasekî. Bi franskî, erebkî, tirkî û armenîkî rêzê qijekî. Verê masayan de nargîle û qelunî. Masayan ser o çîyê werdene û şîmitene. Lulîvanêk verê dezgeyî de ronîştoto. Bi kincanê milîyan ê armenîyan. Dumanê cixara, qelun û nargîleyan. Huyayîş û ziwanê cîya-cîyayî.”*<sup>9</sup>

Nuştox eynî ca de vengê lulîye ser wina vano:

*“Vengê lulîye. Vengê lulîya kokima lulîyan. Vengêko girano melul. Vengê derd û kulan. Vengê xatirayanê keyveşayan. Vengê bextreşî û şînî. Û konyako germ. Demê winasîyan de his û heyecanê tenîkê zîzî zerrîya Memduh Selîm Begî gênê bi xo ver. O beno melul û zerrîveşaye. Kelebermî. Qey meyxane de hewayaya winasîye yena cenitene? Ma dinyaya ser o sewbîna meyxane esto ke tede lulîye bêro cenitene?”*<sup>10</sup>

Rojêk ancî Memduh Selîm Beg şîyo meyxane. Xem û kederî o girawto. Agirî de şikite werdo, senî ke o şîyo û nêameyo, senî ke ey dima xebera mergê ey ameya, Ferîha zî şîya Urdun de çerkesêkê kokimî rê bîya cinîya hîrêyine. Memduh Selîm Beg bi nê xem û kederî meyxane de ronîştoto, eraq şîmeno. Nuştoxî a vîstike wina teswîr kerda:

*“Bi sereyê xo, tena. Masa ser o çend çeşîdî werdê armenîyan. Xovîrîrakerdîşê dost û yaran û teselîye; şûşeyê eraqî. Cacix. Pakêta cixaraya Gitane. Goşeyê meyxaneyî de, sey her roje, lulîvanêko kal. Vengê lulîya ey a melule. Çend kesê bînî dormeyê çend maseyan de.”*<sup>11</sup>

### **Rojan ra Rojêka Evdalê Zeynike**

“Rojan ra Rojêka Evdalê Zeynike” romano çarin o, 1991 de çap bîyo. No roman, romanê heyatê Evdalê Zeynike yo ke o bi xo dengbêjêko namdar o. Coka mîyanê pelanê romanî ra timûtim venngê demgbêjan û lulîye yeno.

Nuştoxî no romanê xo fekê Ehmedê Fermanê Kîkî ra nuşto. Seke nuştox Mehmed Uzun nîyo, Ehmedê Fermanê Kîkî yo! Ehmedê Fermanê Kîkî dengbêjê Celadet Bedirxanî yo. Celadet Bedirxan ke Sûrîye de ca beno, giranîya xo dano bi ziwan û edebîyatê kurdkî ser. Hesneno ke terefê Tirkîya de dengbêjêko namdar esto. Sînor

9-Uzun, Mehmed, Siya Evînê, İthaki Yayınları, İstanbul, 2005,

10-e.c.

11-e.c.



ra derbas beno, ey gêno beno bi Şam ke fekê ey ra edebiyatê kurdî yê fekkî qeyd bikero, bigêro qelem.

Roman de, verê, Ehmedê Fermanê Kîkî kilma-kilm behsê xo û serebutanê xo keno: Senî kes o, çitur ameyo Şam de ca bîyo, rojê xo çitur vîyarenê, Celadet û birayê xo Kamuran senî kes ê... Ehmedê Fermanê Kîkî sîtemkar o ke Celadetî û birayê xo gîraneyê ey de girawto vanê illa ti bi çeku û qiseyanê xo ya romanê Evdalê Zeynîke binusne. Vanê, ti dengbêj î, dengbêj halê dengbêjî zano.

Ehmedê Fermanê Kîkî îtiraz û sîtemkarîya xo wina ano zîwan:

*"Lawo ezqeda<sup>12</sup>, gîraneyê mi rabi-verde. Çitur ke hetanî nika mi vato şima nuştö, na sanike zî ez bivajî şima binusnê. Lawo nuştîş karê mi nîyo, ez westayê vatşî ya. (...) Mi xo teslîmê bextê şima kerdo, mi şerpeze mekerê, ez hal-hewalê nuştîşî ra teba fehm nêkena. (...) Ez nêşkena luliya xo bikera qeleme."<sup>13</sup>*

Axir, Ehmedê Fermanê Kîkî Celadet û Kamuranî de çare nêvînenö, dest bi romanê Evdalê Zeynîke keno! Lajê Evdalî Temoyê xêvekî siqulingêko baskîkite diyo. Evdal û cinîya xo Gule se kenê çitur kenê baskî siqulingî weş nêbeno. Ci rê çare çin o. Roman de wina behsê çareyî beno:

*"Ê kewtbîy çareyî dima la çare bi xo xebera înan ci ra çin a, vejîya ame. Çare tembur (temur), lûlî, vengê Evdal û Gule û taniya keyeyî biye. Siquling sey merdimêk musabi keye û înan. Temoyî o berdêne deşt û warrayan ra fetelnayêne, Gule o şutêne û kerdêne pak, Evdalî zî tey qisey kerdêne, ey rê deyîrî vatêne."<sup>14</sup>*

Rojêk, kerwanêk yeno bajar. Şiliye rayîr ro karwanî birnayo, xanêkê bajarî de mendo. Xebere şina bi qonaxa Tahar Xanî ke mîyanê karwanî de, nameyê xo Şêx Silê, dengbêjêko yeman esto. Evdal qonax de dengbêjê Tahar Xanî yo. Tahar Xan wesêneno bi Şêx Silê, her di dengbêjî meclîsê ey de şanenê têver û kewenê reqabet. Ge Evdal vano ge Şêx Silê vano... No têvernayîş û reqabet di rojî û di şewî dewam keno. Cayêk de no cengo yeman wina îfade bîyo:

12-Ezqeda: Yanî, ez qedayê to/şima bigêro, qedayê to/şima mi rê bêro. Kirdaskî herinda na çekuye de "ezbenî" esto.

13-Uzun, Mehmed, Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê, Weşanên Avesta, İstanbul, 1995, r. 170

14-e.c.

*“Goşdarê wayîrê sebrî, çi heyf ke bi çekuyanê ma yê xaman a no lej nêno salix dayene, la lej anegoreyê zerrîya hazir û goşdaran bi. Evdalî wina vat:*

Şew a, weş şew a  
Çemî û hênî ma ser o xuş-xuş a  
Hetêkê ma rom, yewer uris, yewer ecem  
Vengê mi luliye, ziwanê mi qeleme  
Embaz û dostê mi aşiq û dengbêjê ma dinya  
Ez emşo vana, willayî vana  
Hetanî ajê ajan, xo vîr ra mekero kes na şewe

Şêx Silê zî, verê, bi luliye cewab dayêne Evdalî, dima, bi deyîre vatêne:

*Rast a, lo westayo qedrberzo  
Şew a, weş şew a, şiliye varena xuş-xuş a  
Gelê hazir û goşdaran, Homayî kenê şahid bê  
Evdal o, dengbêjêko namdar o  
Rîhanê fekê gelîyan o, wextê xo de biyo zergun, şax û pel dayo  
Nika kokimê çuw û çoganan o, sewt ci ra nêvejêno, vengê xo kewto  
Şima ci rê bivajê, wa êdî xo bido kalekêk”<sup>15</sup>*

### **Bîrê Qederî**

“Bîrê Qederî” romano pancin o, 1995 de çap biyo. No roman heyatê Celadet Bedirxanî ser o nusîyayo. Beno ke ma sey “Sîya Evîne” seba nê romanî zî bivajê “bîyografi-roman”.


Tornê mîreyê Botanî Mîr Bedirxanî Celadet Bedirxan 1893 de Îstanbul de ameyo dinya. Mîyanê mucadele û organîzasyonanê kurdan de pîl biyo. Çünke pîyê ey Emîn Alî Bedirxan mîyanê nê karî de yo. Mistefa Kemal û embazê xo ke Anqara de hukmatî ronanê û game bi game hukmê xo aver benê, bedirxanî Îstanbul terk kenê. Celadet Bedirxan şino bi Almanya. Dima şino bi Sûrîye, vera sîyasetê Mistefa Kemalî de mucadele keno. O û embazê xo partîya Xoybunî ronanê. No kar ke ser nêşino, destê xo sîyaset ra şuweno, giraniye dano bi ziwan û edebiyatê kurdî ser.

Nê romanî de zî enstrumananê muzîkî ra luliye sereke ya. Nuştox keylê cayan de hurdi-hurdi behsê luliye keno.

Celadet Bedirxan pêhesîyayo ke terefê Tirkîya de dengbêjêko namdar (Ehmedê Fermanê Kîkî) esto, derbasê terefê Tirkîya biyo ke

---

15-e.c.



ey bigêro bibero bi Şam. Roman de fekê Celadetî ra wina behsê nê meseleyî beno:

*“Mîyanê çend saetan de, hurdî-hurdî, mi ci rê behsê hal-hewalê xo, meqsed û miradê xo kerd. Ey bêveng ez goşdarita. Wexto ke qiseykerdişê min o hebêk dergo hîsin qedîya, ey kilawa xo naye bi sereyê xo ser, kulaw eşt bi doşan ser, solê xo yê lastîkênî pay kerdîy û mi ra va, ‘De kerem bike mîreyê mi, ma bikewê bi rayîr...’ Wexto ke ma ber ra bîy teber, ey dest eşt bi luliya xo, keye ra tena lulî girewte.”<sup>16</sup>*

Şam de şan kewto, bîyo şewe. Şam hewn a şîyo, bîyo xayîs. Celadet Bedirxan û dengbêjê xo çila ver de ronîştê, dengbêj luliye ceneno, Celadet zî şîran

vano. Nuştox a game wina teswîr keno:

*“(...) Nê wext û demê hewnaşîyayîşi de, di merdimî, di kurdê nefiyî, mîreyêkê kurdan û dengbêjê ey, verarda şewe de, bi lorîna vayê vakurî yê deryayê Sipî, roşnîyêka sey gîyê estareyî ya çilayêka kane ver de, luliya hezar serran a kurdan cenenê, luliya ko û wareyanê welatî goşdarî kenê û luliya ke nişanê tarîxêkê kanî ya, nuşnenê.”*

*“Dengbêj lulî ceneno; luliya derga barîya narîne yena ziwan, sewda û sewdadariye, hes û heskerdiş, cîyayî û hesrete, derd û keder ana ziwan. Bêçîkê dengbêjî bi westayî û hunermendiye qulikanê luliye ser o fetelîyênê; zidkarî û rikdariye, çimsîyayî û hesudîye, fend û fêlbazîye, fitne û fesadiye mîyanê qulikan ra şîne û yenê. (...)”*

Dengbêj û lulvan fekê luliye beno hetê rastî yê fekê xo, her di lewanê xo anceno û bi nefesêkê dergî luliye ceneno; vengê luliye mîreyê tenamendeyî û dengbêjê ey gêno beno xorîniya dewr û dewranan, leweyê beg û mîreyan, veyve û dîlanan, ceng û pêrodayîşan, seyde û seydbazan, egîd û cengaweran... Vengê luliye înan erzeno bi sanikanê ‘Hezar û Şewêk’<sup>17</sup> ra piştîya muyêk ser û beno welatê hewn û xeyalan, welatê pîr û kalan.”

*“Lulvanak nefesêkê xorîni anceno, ancî lulî beno fekê xo û ceneno; mîre û lulvan, bi vengê luliye xasekiya cîhanî ro, delalîya cenetî ro û xezebê cehenemî ro niya danê. Veng pêl bi pêl beno berz. Çikîya sewdaya bêmirade, omîdê şikîyayeyî pêl bi pêl zerr û ruhî pêşenê. Poro derg, çimê*

16-Uzun, Mehmed, Bîra Qederê, Weşanên Avesta, İstanbul 1995, r. 170

17-Hezar û Şewêk: Meclîsê şewe yo. Şan ra cemat yeno pêser, dengbêj cematî rê “stran”, sanik û hikayan vano. şewe bi no tore pêropîya yena vîyarnena.

*sîyayê kilkerdeyî, awirê nermî, bêvengîya sewda û yare, game bi game durî kewenê. Kile nişena bi zerrî ra pêl bi pêl. Çimî yenê girewtene, gonî damaran ra şîp herikîyena. Vengê lulîye mîre û lulvanê ey gêno beno, Per-ran pê dano pira kuwtene.*

*“Lulvan fek lulîye ra veradano, bi eşq û hurmet, seke gedeyêk hewn a bifişno, lulîye kaleka xo de karyola ser o ronano. Lulvan qefelîyayo.*

*“Dengbêj ancî dest erzeno bi lulîye, aye beno verê fekê xo û beno lul-van; vengo zîzo nermo weş ê lulîye wextan şaneno pê, dewr û dewra-nan keno têmeyan ra. Wext, dewr, tarix, hedîse, merdim û merdimîye serê perranê astereyanê hezar serran ê şewanê Şamî de şinê yenê.*

*“Lulvan zimbêlanê xo yê sipîyan tadano, ziwane xo lewanê xo ser o fetelno, gulîya xo keno hît, çimanê xo qemitno pêra, qirika xo keno bull, xorîn-xorîn nefesêk anceno bi pişikî xo, bi aheng lulîye ce-neno; veng ge beno berz ge beno nizim. Vengê cîya-cîyayî yê lulîye, perde bi perde, xo resnenê bi ruhê mîreyî.”<sup>18</sup>*

*Wexto ke vengê lulîya Ehmedê Fermanê Kîkî wina perde bi per-de reseno bi ruhê Celadet Bedirxanî, o ronîştî şîra xo “Bilûra Min” nuşeno. Nuştîx hal-hewalê ey zî wina teswîr keno:*

*“Mîreyo nefî, serkarê kovara Hewarî, goşê ey vengê nermî yê lulîye ser o, qeleme dest de, kaxita sipîye ser o nuseno:*

Lulîya min a şîrine  
Ti ferfecir de  
Û tarîyê şanî de  
Embaza bêembazan  
(...)

*“Mîre qedeha xo ya eraqê Lubnanî ra çend qultan şimeno, cixara-ya xo ra nefesêkê xorinî anceno, sereyê xo devacêr keno, şopêk çimgirewte fikirîyeno, ancî agêreno bi kaxita sipîye ser û nuseno:*

Vengê lulîya mi,  
Ko û wareyê berzî  
Hênîyê gul û rihanî  
Eşkeftê asêyî  
Goşdarê to yê!  
(...)

*“Mîre, çimê xo rêzanê nuştîyî ser o, tena lulîye goşdarî keno. Tena vengê lulîye yeno bi goşê ey. Mîre, qedeha nêmcete ya eraqî keno bi xo ser de, erdiş û zimbêlanê xo keno pak û nuseno:*

Lulîya mi, vengê xo berz bike!  
 Dinya, sey gedayêka sarwa ya  
 Kewta derguşa xo;  
 Vengê xo berz bike lulîya mi  
 Ci rê bilorne, efkarê ci def bike!  
 (...)”<sup>19</sup>

Rojêk, ancî şewe kewta, Celadet û Ehmedê Fermanê Kîkî şîyê bi gorrna (mezêlê) Mîr Bedirxanî (kalikê Celadetî) ser. Dengbêj lulîye ceneno, Celadet zî hal-hewalê xo kalikê rê bermeno. Nuşttoxî wina nuşto:

“Şewe, bêvengîya şewe... Mîyanê bêvengîya şewe de vengo nermo tenik ê lulîya Ehmedê Fermanê Kîkî...

“Lulvan lulî ceneno, fikirîyeno; emrê xo yê extîyari ser o, qederê xo yê balkêşî ser o fikirîyeno; dewa xo yena vîr, banê xo yeno vîr. (...) dêsanê keyeyî ra tîfîng, xencer, îstireyê xezal û peskovîyan, û lulî dardekerde yê. Tîfîng înan parêzmeno, xencer tore û edetê pîr û pîrbaban o, istireyê xezal û peskovîyan zî rayîrê wareyan, ko û gêrisan nişan dano bi înan. Xora lulî heyatê înan a, vengê dewr û dewrananê înan ê vîrîraşîyayan a. Lulî sîrr û efsunê înan a. Senî ke banê înan him, estun, kutek û kêranan ser o arwan benê, heyatê xo yê dewe zî veng û awazê lulî û lulvanan ser o arwan beno.

“Vengê lulîye, dostê teyr û turan, embazê vayê ko û wareyan. Lulî, estuna şevbuhêrka<sup>20</sup> mîre, beg û gîregîran, yara yeweka şewanê dergan ê zimistanan ke verê adirê lojînan de vîyarenê.

“Lulvan gulîya xo keno hit, zîwanê xo lewanê xo ser o fetelneno, hebêk feselneno û ancîna lulîye beno bi fekê xo, ceneno û fikirîyeno; emrê xo bîyo se, ê rojanê gedeyîye ser ra se serrê rengînî vîyartê... Fikirîyeno; dewa qedeyîya xo yena vîrî, pes û dewarê dewe yenê vîrî (...) Guwanê mîyan pirrî şit bîy. Bêrîwanê ke çîcîkê xo sey say û porteqalan ê, şîyêne bi guwanê mîyan ver. Vengê teyr, mî û bêrîwanan kewtêne bi tēmîyan. Ū vengê lulîye. Lulîya şîwane û lulvanan...”

“Celadet Beg, begzadeyo îstanbulîj, la pîyê Sînem û Cemşîdê şamîjî, vengê lulîya Ehmedê Fermanê Kîkî goşdarî keno û rîpelêkê kovara xo Hawarî ke êdî nêvejîyena, akeno û hêdîka çend rêzanê şîrêka derge waneno:

Ku yo Cudî, ku yo Herekol, ku yo Kepîr?

Ku yê wareyê Mîr Bedirxanî, bavê Têlî, ku yo, kamî berd?<sup>21</sup>


19-e.c. r. 225-228

20-Meclîsê şewe yo. Şan ra cemat yeno pêser, dengbêj cematî rê “stran”, sanik û hikayan vano. şewe bi no tore têreyra yena vîyarnayene.

21-e.c. r. 225-228

## Roşnî Sey Evîne – Tarî Sey Mergî

No roman romanê şeşin o, 1998 de çap biyo. Ziwanê xo alegorîk o. Hedîseyî “Welatê Pîlî” de vîyarenê. Welato Pîl çend welatan ra yeno meydan; Welatê Vakurî, Welatê Başurî. Welatê Dengizan, Welatê Golan, Welatê Koyan. Welato Pîl terseno ke xo mîyan de parçe bibo. Welato Pîl zulmkar û kolonyalist o. Mabênê Welatê Pîlî û Welatê Koyan de ceng esto. Eskeran îdareyê Welatê Pîlî girewto bi xo dest.



Baz û Kevoke qehremanê romanî yê. Her di zî Welatê Koyan ra yê. Baz hîna ke pizez biyo dewê xo amey veşnayene, şarê xo ameyo qir kerdene, bi destê Welatê Pîlî ameyo weye kerdene, ordîya Welatê Pîlî de ca girewto; esl û fêslê xo ra xeberdar nîyo. Kevoke zî hîna ke pizez biya dewa xo ameyo tal (veng) kerdene, Welatê Pîlî de pîl biya, paytextê Welatê Pîlî de unîversîte wendo; esl û fêslê xo ra xeberdar a.

Baz û Kevoke Welatê Koyan de yenê têduşt. Welatê Koyan de ceng esto. Baz esker o, Kevoke gerîla ya. Kevoke esîr kewena bi Bazî dest. Mabênê her dîyan de cengê çekan qedîyayo. Cengê hisan, bengîniye û zerrî dest pêkerdo.

No roman hetê muzîk û enstrumananê muzîkî ra sey romananê bînan “dewlemend” nîyo. Nuştox dergûdila behsê enstrumanêk nêkeno, veng û awazê ci teswîr nêkeno. Çend cayan de nuştox behsê marşanê eskeran, behsê muzîkê reqsî (dans) keno la zêde ser o nêvindeno. Wexto ke nuştox peyî ser û behsê domaniya Baz û Kevoke keno, çend cayan de behsê dengbêj, bêriwan, deyîr û dîlananê Welatê Koyan keno. La nînan ser o zî zêde nêvindeno. Cayêk de gerîlayêk yew deyîre vano.<sup>22</sup> Nuştoxî hebêk veng û hewayaya ci teswîr kerdo. Deyîre ziwanê Welatê Koyan ra ya. Cayêk de zî Kevoke ziwanê dayîka xo ra deyîrêk vana.<sup>23</sup> Vengê xo nerm, vengê xo xemgîn, vengê xo derd û keder... La her di tena bi vengê sadeyî... Tede enstruman çin o. Keso ke romananê bînan ê nuştoxî ra biyo bengîyê vengê luliye, nê romanî de bêriya ci keno!

22-Uzun, Mehmed, Aşk Gibi Aydınlık Ölüm Gibi Karanlık, (Kürtçeden Çeviren: Muhsin Kızılkaya) Gendaş Yayınları, İstanbul, 2000, r. 45-46


23-e.c. r. 264

## Hawarê Dicle – I, - II

“Hawarê Dicle” romano hewtin o, cildo verên 2002 de, cildo diyin 2003 de çap biyo. No roman formêkê şevbihêrkan de yo. Dengbêj Biro vano, “Şima waşt, ez zî vana. Qendîle tabifişnê û goş bidêne vîrîraşîyayan ser.” Û dest pêkeno, çend şewî behsê mîreyê Botanî Mîr Bedîrxanî keno. Şexsîyet û hedîseyanê ê demî ser o goşdaran de qîsey keno. Denbêj Biro şewa peyêne vano “De qendîle bitefênê û şorê.”

Her di cildanê nê romanî de sera-ser linga merdimî dengbêj û lulîyan ra rast nêbena. Hema-hema her rîpel de vengê awazê înan esto. Ver û verarde pirrî şiwane û bêrîvan ê!

*“Ap Xelefêslê xo êzîdî bî, dima bîbî mushuman; kar û barê xo şîwaneyîye biye, bî rengê vengê xo û lulîya xo ya şeşqulikine kewtêne qalib bi qalib.*



*Hem westayê vengê hem zî westayê lulîye bî. Sey vengê xo lulîya xo zî, verê, xizmetê pesî de biya, dima xizmetê însanan de... Hendê însanan pes zî, bîlxassa miyî, nêmedarê heyatê ey ê neçarî biy. Ey ziwanê înan ra, înan zî nefes û lulîya ey ra zaf weş fehm kerdêne.”<sup>24</sup>*

*“Mi ra teber, meclis heme weriştî bi pay. Dengbêj û sazband û lulanê meclisî vengê xo birnabî, her kes pay ra û ez goşdar kerdêne, hurmet û rêzdarîya xo nişan dayêne.”<sup>25</sup>*

*“(...) heyatê Ap Xelefî ra ey rê tena şîwanîye, lulîye, deyîrî, vengê xo û meseleyê xo mendbî, (...) lulîyêka kane ya deyîranê kanan ra yadîgar mendîye (...). Huyayîş, kaykerdiş, deyîrvatiş, lulîcenayîş û ge-ge qîseykerdişê mi ra nîya mede mevaje ke nê qet çetîniye û derd-keder nêdîyo (...).”<sup>26</sup>*

*“(...) dormeyê hênîyanê bînan ê Lalêşî de kom biyênê, miyanê vengê lulî, def û tembûran de şêx û qewalî<sup>27</sup> goşdaritêne (...)*

*“Mi uca fehm kerd ke kelim, qewl, lulî, def û tembûr seba êzîdiyan*

24-Uzun, Mehmed, Diclenin Yakarışı, (Kürtçeden Çeviren: Muhsin Kızılkaya) Gendaş Yayınları, İstanbul, 2002, r. 45-46

25- e.c. r. 83-84

26-e.c. r. 100-101

27-Qewal: Bawerîya êzîdiyîye de keso rayber. Îtîqadê êzîdiyan de şêx esto, şêxî dima qewal esto.



heyat o. (...) Qewl, lulî û deyîranê kurdî timûtîm hêzêko manewî dayênê êzîdîyan. (...)”<sup>28</sup>

“(…) Goş bide guwayîşê vayê koyê Cudî ser, goş bide vengê lulîya şîwaneyî ser.

“(…) vengê lulîya şîwaneyî de hedîseyê vizêrênê kedernakî…

“(…) Wa, va bi vengê lulîye, dengbêj (...) bibo yew (...)”<sup>29</sup>

“Qeraxê Dicle yo ke bi awazê dengbêjan û vengê lulîyanê şîwanan a şên bîyêne, nika tede girm-girma çekan bî. (...)”

Welhasilî kelam; veng û awazê dengbêjan û lulîye wina dewam keno şîno…

Qey wina bîyo? Muzîkê kurdan de cayê dengbêjan û lulîye çî yo, yenê çî mana? Nuştoxî vato, “Senî ke banê înan hîm, estun, kutek û kêranan ser o awan benê, heyatê înan ê dewe zî veng û awazê lulî û lulvanan ser o awan benê.” Nuştoxî no îfade Ehmedê Fermanê Kîkî ser o vato. La şexsê ey de heme mîletê kurdan qest kerdo. Ma no tesbît rast o? Nuştoxî romanênê xo de qey hende giraniye daya bi lulî û dengbêjan ser?

Lulî enstrumanêka kompleksê nîya. Viraştîşê aye zor-zehmet nîyo. Dar ra virazîyena, zil ra virazîyena… Tede pêropîya hewt-heşt qulikî… Vengo ke nê qulikan ra vejîyeno zî pêropîya yew û nê mî oktav (game) o. Problemê xo yê akordî çin o. Akordê lulîye xirabe nêbeno! Labelê darê aye maseno û deforme bena. O wext ci ra veng weş nêvejêno. Seba ke darê xo nêmaso û deforme nêbo, daranê huşkan/pêtan (sey şîmşîrêre) ra virazîyena. Serranê peyênan de metal û plastîk ra zî virazîyena ke ne masena ne zî deforme bena.

Lulî enstrumana komelanê koçberan a. Hesas nîya. Ne hende rehet şikîyena ne zî problemê xo yê akordî esto. Merdim eşkeno xo reyde sey çuyî bifetelno. Senî ke qam-qilafetê xo ra manena çuyî, hîna zêde anegoreyê zerrîya koçberan a. Terzê heyatê koçberan lulîye rê dest dano la enstrumananê hesasan rê dest nêdano. Xora lulî, esas enstrumana şîwanan a.

Ma kurdî pêro lulî cenênê? Mîyanê heme komelanê kurdan de ca û manaya lulîye eynî yo?

Ney!

Kurdî mîletêko multî-kulturel î. Cîya-cîya komelan ra yenê meydan. Wayîrê çendayê lehçeyan ê, çendayê dîn û mezhebê xo estê. Kulturê xo, tarzê heyatê xo, edet û toreyê xo yewpare nîyê. Nê heme

28- e.c. r. 193


29-e.c. r. 225-226

komel bi komel vurîyenê. Terzê muzîkê xo û enstrumananê xo zî yewpare nîyê, komel bi komel vurîyenê. Mîyanê tayê komelan de giraniye temburî (saz) ser o ya, mîyanê tayênan de def û erbane, yê tayênan de luliye... Ma vajî ke mîyanê elewî û yaresanan de cayê temburî xeylê-xeylê ezîz o. Nê komelî îbadetê xo bi tembur kenê. Tena îbadet de ney, heme heyatê nê komelan de tenbur esto. Înan rê bîyo ruh û manewîyat. Wina aseno ke tembur bi destê nê komelan, bi destê kurdan îcad bîyo, mîyanê cîya-cîya komel û mîletan de vila bîyo. La senî ke heme kurdî lulî nêcenenê, heme kurdî tembur zî nêcenenê. Çunke enstrumanî goreyê terzê heyatê komelan vurîyeno.

Tembur enstrumanêko kompleks o. Viraştişê ey rehet nîyo. Ci rê daro xususî lazim o. Darê xo ganî hurdî-hurdî, tenik-tenik bêro taştene. Darê xo yo pêt çiqas weş bêro taştene, vengê xo hende weş û hol vejîyeno. Dar bi tena sereyê xo bes nîyo. Têlî, perdeyî, goşî, berzîn... Yê her têlî xususîyê xo cîya yo. Tembur hetê vengê ra xeylê-xeylê dewlemend o. Akordê xo hesas o, ci rê westayîye, hunermendîye lazim a. Tembur anegoreyê terzê heyatê koçeran nîyo, enstrumanê komelanê cayîbîyan (bi tirkî: yerleşik) o.

Mîyanê kurdan de senî ke eşîrê kirdasî (kurmancî) badê-badê cabîyaye (bi tirkî: yerleşik) bîyê û hîna zî tayê eşîrê xo koçer ê, enstrumana înan a serekîye lulî ya. Labelê senî ke eşîrê kirmancan (zazayan) koçer nîyê, mîyanê kirmancan de sey kirdasan koçerîye çin a, kulturê xo kulturê dewan û cite yo, enstrumanê xo yo sereke tembur o. Badê, bi tesîrê dîna û îtîqadî kirmancanê cêrî (kirdê sunî) fek tembur ra veradayo. Kirdasanê elewîyan zî eynî semed ra dest bi tembur kerdo. Tirkanê elewîyan zî...

Mîyanê eseranê kirdasan (kurmancan) de dengbêjîye menşur a ke na zî xususîyetê komelanê koçberan o. Terzê dengbêjan û terzê hozanan/şairan/aşiqan eynî nîyo. Dengbêjî ca bi ca gêrenê, sanikan vanê, "stran"an vanê. Terzê "stran"an sey terzê kilaman (deyîran) nîyo. Kilaman de peyme esto; tayê bi 11 heceyan a yenê vatene, tayê bi 7 heceyan a... "Stran"an de peyme çin o. Kilamî bi enstrumanan a yenê vatene. "Stran"î timûtîm bi enstrumanan a nê nê vatene. Selîm Temo vano, "Nêbeno ke ma 'kilaman' ra bivajê 'starn'. 'Stran'an de peymeyê heceyan ('hece ölçüsü') çin o û her dem bi enstrumanan a nêvajîyênê.<sup>30</sup> Sanikê ke dengbêjî vanê, sanikê hazir ê; sey Mem û Zîne, Sîyabend û Xece... Enstrumanê dengbêjan çin ê. Ca-ca xo de luliye fetelnenê. La senî ke mumkin nîyo ke merdim eynî deqa hem luliye biceno û hem



zî bivajo, vengê dengbêjî û vengê luliye tēmîyan de nêneqışiyenê, yewbinî ra cîya manenê. Ewro terzê dengbêjan hina zêde wina yo: Tizbîye gênê xo dest, dest erzenê bi kerrikê goşî, hayy haa hîî... kenê. A game ke çi ame bi fek... Muzikê xo bêritm û bêpeym û bêenstruman o. Tena vengo silt û sade...

Mîyanê eşîranê kirmancan (zazayan) de bîlxassa mîyanê kirmancanê corî (zazayanê elewîyan) de dengbêj ney, hozan/şair esto. Yew komelî ke koçerîye ra fek verada û bi komelo cabîyaye, hozanî/şairî cayê dengbêjan gênê. Enstrumanê xo zî vurîyeno, lulî

sîna, enstrumanêko bîn yeno. Mîyanê kirmancan de no enstruman tembur o. Keso ke tembur ceneno û vano, ci rê “hozan”, “şair” yeno vatene. Seyîd Qazî xo rê “şair” yanî “hozan” vato. Kilamanê ey ra nimûneyê:

*“Efkar meke şairê mi, êyê to berat o*

*Maya mi loqme da pîyê mi zerrê Heq viraşto.”*

Yanî, xem meke şairê mi, ê to berat o; maya mi loqme dayo pîyê mi, zerrîya Heqî viraşta.

*“Vaje şairê mi vaje dîna tim ma goş do”*

Yanî vaje şairê mi vaje wa dinya timûtim ma goşdar bikero.

*“Uşîra xo ceno, şairê mi kata?”*

Yanî, uşîra xo gêno, şairê mi kam het a (se ra) şîno?

Terzê dengbêjan û terzê şairan eynî nîyo. Şair hina zêde xo reyde tembur çarneno. Tayê şairî estê ke tembur ra teber yewna enstruman xo reyde çarnenê. Mesela, enstrumanê Silê Qijî kemaçe yo. Şair hem ceneno hem vano. Her di vengî tēmîyan de yewbinî tamam kenê. Vateyan de peyme û rîtm û aheng esto. Şairî bi xo ge-ge dewe bi dewe feteliyenê, ge-ge zî şar bi xo şîno bi dîyarê înan, hal-hewalê xo înan rê vano. Ma vajî, kesêkê xo merdo. Şairî rê behsê ê kesî keno. Şair, verê, hîkaya ê kesî goşdareno, dima enstrumanê xo gêno bi xo dest û kila-me erzeno kesê merdeyî ser.

Şair bê enstruman nêbeno. Mîyanê kirmancanê corî de tena cinî sey dengbêjan bê enstruman vanê. Enstrumancenayîşê cinîyan eyb yeno diyene, coka cinî tena bi vengê silt-sadeyî vanê. (Labelê badê-

badê, cinîyan zî dest eşt bi enstruman.) Cîya-cîya sebebana ra bo zî terzê cinîyanê kirmancanê corî û terzê dengbêjan eynî yo.

Seserra vîstine de kulturê eşîranê kirdasan xeylê-xeylê bî populer. Heme kurdî bi nê kulturî amey zanayene. Kulturê ma yo dewlemen-do rengîn sîya na populerîye de mend. Beno ke ez vajî kurdî hema-hema pêro kewtîy bi vayê na populerîye ver. Înan bi nê çimî xo ra nîya da, mîletanê bînan zî bi nê çimî ewnîya înan ra. Sazge û dezgeyanê ma zî na populerîye ra teber taba nêard xo vîr. Ewro behsê muzîkê kurdan ke bî, hema dengbêjî û lulîye yena vîrê merdimî. Edebîyat û huner de veng û awazê nînan esto, timûtim behsê nînan beno. Mehmed Uzun zî kewto bi nê vayî ver. Romananê xo de timûtim heyatê eşîranê koçeran romantîze keno. Şiwaneyî, bêrivanî, dengbêjî, mîyî, xeymî, lulîye... Ca-ca wina behsê xeyman keno ke ti vanî qey qesr û qonaxan teswîr keno. Mehmed Uzun hem kewto bi nê vayî ver hem zî hêz dayo bi ci. No va bi eseranê ey hîna zêde bîyo pêt.

Ez hêvîdar a ke kurdî hîna zêde mîletê xo yê multî-kulturelî nêzdî ra nas kenê, qîymetê dara xo ya rengîna wayîrê şax-şafîlan zanê. Dare tena bi yew şax nêbena!

# BÊRE

Hemîd HOZAN

Bêre bira  
Vaje mi ra  
Pêxamberî  
Ma r' rêberî

Bêre dedza  
Vaje leza  
Bike ferza  
Meverd qeza

Bêre lajo  
Pî to r' vajo  
Bi destmajo  
Bik nimajo

Bêre bawo  
Vaje lawo  
Laj û keyna  
Yew vînena

Bêre dayê  
Vaje wayê  
Laj û vewî  
Mi rê yew î

Bêre keyna  
E' to r' vana  
Ti se kena  
Nêwanena

Bêre bapîr  
Vaje dapîr  
Ma weş zanî  
Dinya fanî  
Bêre heval  
Vaje delal  
Awa zelal  
To rê helal

Bêre Hemîd  
Vaje mecîd  
To rê şîret  
Mek xiyamet

# HETÊ ŞUXULNAYÎŞÊ ZIWAN Û ÎDYOMAN RA TEHLÎLÊ HÎKAYA “BEYI SE BENA?”

Bîlal ZÎLAN

## 1. DESTPÊK

Edebîyatê modern ê zazakî bi kovara *Tirêje* serra 1979 de dest pêkerdo. Mehemed Malmîsanijî nuştayê tewr verênî yê modernî weşanayî. Hîkaya yewine ya kirdkî (zazakî) zî serra 1980 de bi nameyê “Engîştê Kejê” hetê Malmîsanijî ra bi mexlesê M. Birîndarî kovara *Tirêje* de weşanîyaya.<sup>1</sup> Na hîkaye serra 2005 de “Antolojîyê Hikayanê Kirmanckî (Zazakî)” de rayna weşanîyaya.<sup>2</sup>

Badê 12ê êlula 1980î gelek nuştex û roşnivîrê kurdan şîbîy Ewropa. Ewropa de gelek kovarî amey weşanayene ke nînan ra yewe zî *Çira* bî. Serra 1995 de hûmara hirêyine ya *Çira* de hîkaya diyine ya kirdkî bi nameyê “Derdê Derwêşî” hetê J. Îhsan Esparî ra weşanîyena.<sup>3</sup> Na hîkaye “Antolojîyê Hikayanê Kirmanckî (Zazakî)” de rayna weşanîyaya.<sup>4</sup> Nê wextan de di hîkayeyê Serdar Roşanî ke kurmanckî ra tadîyayê kirmanckî (zazakî) serranê 1995 û 1996 de hûmaranê 2 û 5. yê kovara *Çira* de weşanîyayê. Nameyê nê hikayan, yewe “Bircanê Dîyarbekirî ra Mektubêke” û ya bîne “Gozêre” yo. Nê hîkayeyî zî “Antolojîyê Hikayanê Kirmanckî (Zazakî)” de rayna weşanîyayê.<sup>5</sup>

1-M. Brîndar, “Engîştê Kejê”, *Tirêj*: Kovara Çande û Pişeyî, Hejmar: 2, Sal 1980, İzmir, r. 32-37.

O ke neql keno: Roşan Lezgîn, “Kirmackî de Aversîyayîşê Hunerê Hikaye”, <http://www.zazaki.net/yazi/kirmack-de-aversiyays-huner-hkaye-101.htm>

2-Munzur Çem, *Antolojîyê Hikayanê Kirmanckî (Zazakî)*, Weqfa Kurdî ya Kulturî Li Stockholmê, Stockholm 2005, r. 57-63, O ke neql keno: Roşan Lezgîn, “Kirmackî de Aversîyayîşê Hunerê Hikaye”, b. linkê corên

3-J. Îhsan Espar, “Derdê Dewrêşî”, *Çira*, Kovara Kulturî-Kovara Komelaya Nivîskarên Kurd li Swêdê, Hejmar 3, Îlon 1995, Stockholm, r. 55-70, O ke neql keno: Roşan Lezgîn, “Kirmackî de Aversîyayîşê Hunerê Hikaye”, b. linkê corên

4-Munzur Çem, *Antolojîyê Hikayanê Kirmanckî (Zazakî)*, Weqfa Kurdî ya Kulturî Li Stockholmê, Stockholm 2005, r. 31-56, O ke neql keno: Roşan Lezgîn, “Kirmackî de Aversîyayîşê Hunerê Hikaye”, b. linkê corên

5-Munzur Çem, *ecv*



Serra 1996 de kurdê zazayî ke Ewropa de mendênê Swêd de bi nameyê “Grûba Xebate ya Vateyî” kom bîy.<sup>6</sup> Na grûbe serra 1997 de Swêd de kovara *Vateyî* vete. Serra 2003 de Îstanbul de Weşanxaneyê Vateyî ronîya û kovara Vateyî hînî Îstanbul de ameye çap kerdene. Na kovare hetanî 2010î 34 hûmarî vejîyaya û weşana xo hema zî dewam kena.<sup>7</sup> Hetanî ewro zaf xebatê edebî yê kirdkî na kovare de neşr bîy.

Hîkaya “Beyi Se Bena?” ke ma ser o nê tehlîlî virazenî, nameyê kitabê hîkaya yê J. Îhsan Esparî yo. Na hikaye, tewr verî 1997 de kovara *Vateyî* de hûmara 2, 3 û 4. de qi-

sim bi qisim weşanîyaya (8). Qismo yewin kitab de rîpelê 1-19, qismo diyin kitab de rîpelê 19-43, qismo hîrêyin ke kovare de weşanîyayo, kitab de rîpelê 43-62 miyan de ca girewto.

Badê, ma vînenê ke hûmara 8. de Roşan Lezgîn yew nuşteyê xo de hîkaya Îhsan Esparî rexne kerda. R. Lezgîn, no nuşteyê xo de tewirê na hikaye rexne keno û hetê şuxulnayîşê ziwani de nuştişê tayê çekuyan ra îtirazê xo vano.<sup>9</sup> Rayna eynî hûmare de J. Î. Espar, bi nuşteyêkê dergî cewabê rexneyanê Roşan Lezgînî dano û miyanê nê cewaban de derheqê hîkaya xo de zî gelek melumatan dano û rexneyanê Lezgînî ra xo paweno.<sup>10</sup>

Hîkaya “Beyi Se Bena?” bi nameyê ke kovare de weşanîyaya, badî bi eynî nameyî 2004 de hetê Weşanxaneyê Vateyî ra çap bîya.<sup>11</sup> Kitab

6-Grûba Xebate ya Vateyî: [http://www.zazaki.net/html\\_page.php?page=gruba\\_xebate](http://www.zazaki.net/html_page.php?page=gruba_xebate)

7-Kovara Vateyî: [http://www.zazaki.net/html\\_page.php?page=vate](http://www.zazaki.net/html_page.php?page=vate)

8-J. Îhsan Espar, *Beyi Se Bena?*, Vate, Kovara Kulturî, Numre: 2, Payiz 1997, Stockholm, r. 77; Îhsan Espar, *Beyi Se Bena?* - II, Vate, Kovara Kulturî, Numre: 3, Zimistan 1997, Stockholm, r. 50; J. Îhsan Espar, *Beyi Se Bena?* - III, Vate, Kovara Kulturî, Numre: 4, Wisar 1998, Stockholm, r. 79

9-Roşan Lezgîn, “Boya Welatî”, Vate, Kovara Kulturî, Numre: 8, Hamnan 1999, Stockholm, r. 62

10-J. Îhsan Espar, “Derheqê Boya Welatî De”, Vate, Kovara Kulturî Numre: 8, Hamnan 1999, Stockholm, r. 76-79

11-J. Îhsan Espar, *Beyi Se Bena?*, Weşanxaneyê Vateyî, Îstanbul, 2004

de tena yew hîkaye ca gêna û na hîkaye qasê 60 rîpelî yê. Bi no hawa merdim şêno sey yew hîkaya derge bihesebno. Hîkaye çî moc ke kovara *Vateyî* de weşanîyaya, no hewa zî kitab de ca girewto. Tena, çend cayan de ke xeletiyê herfan biyê, ameyê rast kerdene.

## 2. KUNYE

Nameyê nuştox û kitabî: J. Îhsan Espar, Beyi Se Bena?

Weşanxane: Weşanxaneyê Vateyî

Tarîx, cayê çapkerdişî, rîpel: Payîz 2004, Îstanbul, 62 rîpelî

## 3. TEHLÎLÊ MEWZUYÊ HÎKAYE

**a. Mewzu (Babete):** Hîkaye de yew cinîya vîyamenda ke mêrdeyê aye raştî de nêmerdo, tena vîndî biyo û tay çiyê nebaşî ke na cinî sereyî ser de yenê, nînan ra behs beno.

**b. Xulasa:** Hesên Axayî rê xebere yena ke lajê ey esker de merdo. Dewe de xebera mergê Serdarî vila bena. Hesên Axa yew het ra lajê xo rê dejenoyew het ra zî halê veyva xo ser o fikirîyeno. Seba ke dewe de derheqê veyva ey Beyi de zaf qalî vajîyenî, Hesên Axa veyva xo, lajê xo yê bînî ke zewejnayeyo, ey rê mare keno. Na ray bîneteyê di veyvan de qewxe û bêhuzurî yenê meydan û Beyi wazena ke xo axur de bixeqneqna. Labelê vistirîya aye pêaqîyena û aye xeqnayîş ra xelisnena.

Rojêk eskerî yenî dewe û benê mêmânê zamayê Hesên Axayî, Mela Mehmudî. Yew esker Beyi serê ortmeyî de vînenoyê û çim şikneno. Bengî zî nê halê eskerî vînenoyê û eskerî kuweno. Labelê badê, eskerî yenê dewe Bengî û Mela Mehmudî pîya benê dekenî hepis. Semedo ke her di lajî zî Hesên Axayî dest ra şiyê, Hesên Axa zaf qehirîyeno. Demeyêk vîyareno, lajê Hesên Axayî ke esker de vîndî biyo û înan vato qey merdo, yeno dewe. Hîkaye bi ameyîşê lajê vîndîbiyayî qedîyena û bi persa “Beyi nika se bena?” qedîyena.

**c. Strukturê Mewzuyê Hîkaya:** Hîkaya “Beyi Se Bena?” new qisman ra ameya meydan. Nê qisimî bi numre bellîkerde nîyê labelê bîneteyê her qisimî de hîrê hebî estareyî (\*\*\*) ronîyayî û bi no hawa babetî yewbînan ra cîya biyê.

Hîkaye, bi behsê Hesên Axayê Sayêreki û dewa Sayêreki dest



pêkena. Vernî de teswîrê dewe, banê Hesên Axayî û Eynîyê Derdî beno û meseleya nê eynî vajîyena. Hem meseleya eynî de hem cayanê bînan de behsê çiyê folklorîkî beno. (r. 9, 57) Qismê bînan de nuştox fesal-fesal dekeweno mîyanê hikaya xo ya esasî.

Nuştoxî hikaye bi çimê xo vata. Labelê zaf cayan de bi çimê qehremanan zî hikaye dewam kena. Bi xususî, wexto ke mîyanê hikaye de qehreman ewro ra şêro zemanoyê wîyarte, o wext hikaye bi çimê qehremanî dewam kena. Hikaye de Hesên Axa û Geloyê Xîntî ser o ca-ca no uslub ameyo xebebnayîş.

Nuştox zaf rey teswîrê cayan û merdiman keno. Mavajîn wexto ke Beyî ra behs keno bi hawayêko derg şekl û şemalê aye teswîr keno. (r. 17) Serqehremananê hikaya de tehlîlê psîkolojîkî zî estê. Bi taybetî, Geloyê Xîntî ser o tehlîlê psîkolojîkî zaf î. (r. 24-32)

Hikaye de tayê cayan de bi fekê qehremanan behsê bawerî (dîn) beno. Ge-ge bi çimêkê objektîfî, ge-ge zî bi çimêkê rexnekerdişî behs beno. Mîyanê hikaye de zaf cayan de behsê tarîxê kurdan beno û bi hîsê millî tayê meseleyî vajîyenê. Mavajî, vernîya hikaye de qiseykerdişê Hesên û Huseyn Axayî de hetê cuntaya 27 gulane 1960 ra surgunkerdişê kurdan vîyareno (r. 15). Dima ke heyatê Geloyî ra behs beno, Şêx Elîyê Palî ser o fikrê bawerî û dînî ra bi hewayo derg û bi çimê rexneyî yeno behs kerdene. Reyna, analîzê karakterê Şêx Efendî û Geloyî de dewaya kurdayetî vajîyena. Wexto ke Hesên Axa meseleya Beyî ser o, fikirîyeno şino verê resmê Şêx Evdîrehîmî ke wazeno tede ardim biko û derg û dila fotografi reyde qisey keno. Ewta de meseleya Şêx Evdîrehîmî ra behs beno ke çawa camêrd û egîd bîyo û derheqê mergê ey de malumat dîyeno.

Peynîya hikaye de wexto ke Geloyo Xînt vejîno banî ser û veng dano dewijan, weyra de tay edetê dewijan xirab vîneno, vera eskeren de tersayîşê dewijan rexne keno û behsa yewbîyayîşê kurdan keno (r. 61). Ma ney ra ma fehm kenî ke nuştox wazeno ke meseleya Beyî ser o yew fikro neteweyî zî bido wendoxan.

ç. **Ca û Wext:** Hikaye, esas dewa Sayêreki de vîyarena, ge-ge hikaye de tayê bînan ra zî behs beno.

Wext tam dîyar nêbo zî ma dîyalogê Hesên û Huseyn Axayî ra fehm kenî ke serra 1960 ya, Tirkîya de îxtîlal bîyo, cuntaya Cemal Gurselî bîya hukmat û tayê kurdî hetanî Sêwas surgun bîyê. (r. 15)

d. **Qehremanê Hikaye:** Hesên Axayê Sayêreke (Hesên Selîmanî), Perîxani (cinîya Hesên Axayî), Huseyn Axa (pîyê Beyî

û datzayê Hesên Axayî), Derdi (cinîya Huseyn Axayî û maya Beyi), Serdar (lacê Hesên Axayî), Beyi (Cinîya Serdarî û veyva Hesên Axayî), Bengî (lacê Hesên Axayî), Ziravi (cinîya Bengî), Mela Meh-mud (zamayê dewe), Hesîba (cinîya Mela Mehmudî, waya Hesên Selîmanî), Gelo (Geloyo Xînt), Bîlal (Kerwa Bîlal), Çawuş (cendirme).

#### 4. TEHLÎLÊ ZIWANÊ HÎKAYE Û ÎDYOMÎ

**a. Hetê Ziwane Standardî ra:** Seba ke na hikaye verî kova-ra *Vateyî* de neşr bibî û o çax hema derheqê kirdkî (zazakî) de tayê çiyê standardî tesbît nêbibîy, hikaye de tayê cayan de çekuyî bi fekê mehelli nusîyayê. Mesela, tayê çekuyî ke ganî pîya binusîyê, cîya nusîyayê. Mavajî, tede sey “te de”; pêser sey “pê ser” nusîyayê (r. 19). Semedê îzafeyê makî, “-î” xebetnîyayo labelê nika standard de “-e” ameyo qebl kerdene. Nuştokî hetê zemîrê şexsan ra ziwano standard şuxulnayo. Mesela; “ey”, “aye”, “înan”. Herinda “ko” de zî “do” ameyo xebetnayene ke no standard o. Labelê hetê zemîrê îşaretî de fekê mehelli şuxulnayo. Mavajî, herinda “a” de “aw” xebetnayo. Rayna ma vînenê ke herinda edatê “bi” de “ebi” ameyo şuxulnayene. Sewbîna, tayê kelîmeyê ke bi fekê mehelli nusîyayê, nê yê: vîşêr, hutin, tetun, tînc...

Hikaye, çiyê ke ma cor ra vatîy, înan ra teber, bi ziwaneko standard û fesîh ameya nuştîş. Wexto ke merdim waneno, seke ewro nusîyayo, ci ra weş fehîm keno. No zî yew het ra nawneno ke standardê kovara *Vateyî* binê xo dekerde û saxlem o.

**b. Çekuyê Tekrarbîyaye û Diletayî:** Hikaye de zaf caran di çekuyê tekrarbîyayeyî ke sey “ge-ge”, “verra-verra”, “yew bi yew”, vîyarenî. Reyna çekuyê diletayî zî sey “rut û repal”, “zem û zuran”, “tarr û turr”, “dije-mije”, “taket-naket”, “inheta-aheta”, “exxaynî-puffaynî”, “nâyîn-rijnaynî”, “naşt-daşt”, “tarr û turr”, “çiy-mîy” mîyanê hikaye de gelek cayan de vîyarenê.

**ç. Çeku û Termê Dewan:** Seba ke hikaye dewe de vîyarena, gelek çeku û termê ke hîna zaf dewan de şuxulnîyênê yan zî derheqê dewan de yê, zaf vîyarenî. Hetê **cografya** ra nameyê dewan “Sayêreki” û “dewa Binêkoy”; nameyê eynîyan. Nameyê “Eynîyê Sayêreki”, “Eynîyê Derdî”; nameyê cayan “bostan”, “goli”, “axpîn”, “axir” û sey înan zaf çekuyî vîyarênê. **Nameyê daran** ra “dehlêr, sayêr, mişmişêr, aluncêr, saluncêr, navlêr, murwêr, encilewr, mazêr” û sey nînan

tayna nameyê daran mîyanê hîkaye de vîyarênê. **Karê dewe** ra: “ci-tekerdiş, çînayîşê terkan, birnayîş û piştîşê rezan, awdayîşê hêgayan, velgbirnayîş, bostanawdayîş, xetekendiş, eşêfekerdîş û sey nînan tayê çekuyê bînî vîyarênê. Nameyê bînî ke eleqeyê înan û heyatê dewe esto, nê yê: “ortme, nazbalî, maxî, mirdaqî, mênêb, lindan, huwe, arîş, zixêre, toxim, şîrne, firaq, niqr, lêyê mehsirî, tar û turro wişkkerde, nivîn...”

**d. Vateyê Verênan, Zewtî û Teşbihî:** Zaf cayan de nuştoxî vateyê verênan, teşbihî û zewtî şuxulnayê. Vateyê verênan ra, “Hûmay da Hûmay girewt”, “Tasi ke rayê çiringay, ha zurî ha raşt, rayê çiringaya”; teşbihan ra “tînci eynî sey qutiya tutinê to bereqîyaynî”, “ridê Hesenî ra ewnîya ki sey şewî tarî bîyo”; zewtan ra “Mela key înan bixerepîyo” ma şênî sey mîsalî nîşan bidê.

**e. Şuxulnayîşê Îdyoman:** Îdyomî, dewlemendî û rindîya ziwani nîşan danê û esaletê ziwani nawnenê. Merdim eşkeno yew paragraf bi yew îdyom îzah biko. Mîyanê îdyoman de tarîx, orf û adetê milletî ca gêno û xezîneya kulturî muhafeze keno. Heto bîn ra zî nuştîş û qiseykerdişî de şuxulnayîşê îdyoman nîşan dano ke nuştox yan zî qiseykerdox hakimê ziwani yo, eleqeyê ey û ziwani zaf xurt o.<sup>12</sup>

Hîkaya “Beyi Se Bena?” de hetê şuxulnayîşê ziwani ra tewr muhîm belkî zî xebebnayîşê îdyoman o. Kitab 62 rîpelan ra îbaret o û tede 70 ra zêde îdyomî estê. No zî nawneno ke nuştox hetê îdyoman ra hîkaya xo gelek dewlemend kerda û têkilîya nuştoxî û ziwani zaf xorîn a.

**ê. Îdyomê ke Ameyê Tesbît Kerdene:** Îdyomê ke kitab de vîyarênê û ma tesbît kerdî 73 heb ê. Îdyomî kitab de mîyanê cumle de çi hawa û kam rîpel de vîyartê, ê zî pîya nûsiyayê.

**pişa xo xişn biyayene:** Labelê semedo ki, pişa sayêrekijan biney xişn bena, ebi lacekê binêkoyijî qayil nêbenî û keyneki nêdanî. (r. 8)

**aqil firnayene:** Lacek na keyneki ser o aqil firneno û yaban keweno. (r. 8, 17)

**porê kesî sipî kerdene:** Heyana ki tetun erînaynî çend muyê porê rotoxî sipî kerdinî. (r. 9)

**pîze pê nêveşnayene:** Sewbîna guran ser o nê, la herçî qaydê tetunî rê pîzze peran nêveşnaynê (r. 9)

12-Roşan Lezgîn, Ferhengê Îdyomanê Kurdî (Kirmanckî / Zazakî); Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2005, r. 5

**goşî bel kerdene:** Hema xafil ra hewranê sîyayan goşî bel kerdî, verra verra hewrî giran bî, varanî dest pêkerd û laser ame... (r. 10)

**destî xo ra vera nêdayene:** Tena dayka Serdarî, Perîxani, destî xo ra verra nêdaybî; nê cayan ra şêx û mela nêverdabi ki nêşîbî hetî, zîyari nêmedîbî ki nêşîbî ser. (r. 10)

**gan ci ra vejîyayene:** Mergê Serdarî ra pey yewrayî gan ti re vejîyabi, zerd û zirmêlêqi bîbî. (r. 11)

**serê zîwanî ra qisey kerdene:** Ebi seredê zîwanî aye reyra qisey kerdinî. (r. 11)

**tersê xo şikîyayene:** Nê serranê peyenan biney tersê aye şikîyabi. (r. 11)

**paşte pêt bîyayene:** Demeyêk o her di lacê xo zî zewecnaybî paştey aye hîna pêt bîbî ki Hesenî hinî fek zewacî ra verra dayo. (r. 11)

**fek ci ra veradayene:** Hesenî hinî fek zewacî ra verra dayo. (r. 11)

**ca bide nêkewtene:** Ca bide nêkewtinî, nêşaynî texmîn bika ki Hesen do xeberdayîşê aye ra pey se biko. (r. 12)

**kîştanê kesî qul kerdene:** Axa, zanî nê datizanê to bi qalanê xo kîştê mi qulî kerdî. (r. 12)

**sereyê xo girwetene û rageyayene:** Ez serey xo bigîra kam heta rageyra? (r. 12)

**zerrîya xo dinya ra serd bîyayene:** Destê ey nêgirewtinî karêk biko, zerra ey dinya ra serd bîbî. (r. 12)

**telîyan ser o ronîştene:** Herçiqas nêano xo ser zî seki teluyan ser o ronîşte bo. (r. 15)

**tewî girewtene:** Tewî girewtbî, nêzanaynê se biko. (r. 15)

**rike bestene:** Ez nêzana nê hukumatî çî rê rika xo Şêx Elî Efendî besta. (r. 16)

**derd kesî têwdayene:** Helbet Huseynî rê zî weş nêbi ki derdê Hesenî têwdo. (r. 16)

**pê dejayene:** Naşt-daşt ra tanî qalî ey goş ra kewt bi, pey dejabî. (r. 16)

**bi risipîniye xelesîyayene:** Nika înan ganî çîyê bikerdinî, no bela ra ebi risipîney bixelesîyaynî. (r. 16)

**şerefê xo panc perey bîyayene:** Hûmay nêko eki çîyêdo xirab biqewimîyo, şerefê înan beno panc perey. (r. 17)

**qîymîş nêbîyene:** Ridê Hesenî ra ewnîya ki sey şewî tarî bîyo, qîymîşê ey nêbi. (r. 17)

**rîyê xo roşn bîyayene:** Va “dato, ma şewî qedênay” yewrayî rîy Hesenî roşn bi... (r. 17)

**dinya xo hesnayene:** Eki Perîxani a cili mîyan di nêdînî dinya xo hesnaynê. (r. 18)

**sere masayene:** Xirrayîşê aye endî vîşî bînê ki beyi gêj bînî, serey aye masaynî (r. 18, 59)

**çimê xo pêser nayene:** Biney çimê xo naynî dim a weriştinî şînî bostan aw daynî. (r. 19)

**aqil birnayene:** Aqilê to na mesela ra çi birneno? (r. 20)

**di gamê xo pê nêmendene:** Labelê di gamê ey pê nêmendinî. (r. 20)

**murizê xo tirş kerdene:** Her di leweyî xo ser pêsernay, murizê xo tirş kerd, çimê xo girewtî, leweyê ey çend ray pêro ginay. (r. 20)

**qale ra dejnayene:** Lezalez nêwaştinî qalê ki dewijî şênî pey bidejî, biko. (r. 21)

**sereyê mesela ronayene:** Hesîba biney sereyê mesela bironaynî ka micêci ey abo... (r. 22)

**yew çilka gonî nêameyene:** A game yew kardî bidaynî mi ro, yew çilka gonî mi ra nêameynî. (r. 22)

**ne hewanayene ne zî ronayene:** Mi hinî ne hewanay ne zî ronay. Ez weriştta xo rê şîya. (r. 22)

**goşanê xo ra bawer nêkerdene:** Mela Mehmudî gama ki Hesîba goşdarit, goşanê xo ra bawer nêkerd, ey vatinî qey Hesîba di caran qalî nêvindena... (r. 22, 30)

**mesela têwdayene:** Nika ey zî şîyaynê na mesela biney têwdo... (r. 22)

**dekewtiş gandê kesî:** Mesela Beyi hinî gandê ey kewtibî. (r. 24)

**vîye kewtene:** Çi rê wina no derd, kul û kederê dinya heme kewto mi vîye? (r. 25)

**zîr û zeberê çi vetene:** Ti çirê endi meraq kenî, wazenî zîr û zeberê heme çi vejî? (r. 25)

**ca teng biyayene:** Vatinî qey ard û asmîn nika pê resenî, ca piro teng bibi. (r. 25)

**nêşînayîş xo tepîşayene:** Ez qey endi nêbîyaye ya ki ez nişna xo bitepîşa? (r. 26)

**dekewtiş tengane:** Kotî yew bisilmane bikewtinî tengane ey xo bide resnaynî, de rê ardim kerdnî. (r. 27)

**aqil sere ra kerdene:** Tersabi ki Efendî bi qiseyanê anaserênan ey aqilê serî ra biko. (r. 31)

**gan û îman xo ro girewtene:** Huskîyê şiwani gan û îman xo ro girewtbi, qeza ra hetanî Sayêreki vazdabi. (r. 33)

**qeseba veşayene:** Eki Serdar ezeb bibînî, ez ka rayna derdê xo bi-anca, ka qesebaya mi biveşa la ka Hûmay sebir bido mi. (r. 35)

**rîyê kesî vajor kerdene:** Ti şarê xeribî ca verdi ez senê ridê Dat Huseynî vajor bika! (r.35)

**pê fek huyayene, pey de mezêlê yewbînan kendene:** Ti zanî ma çend nêbiyayeyî; ma pê fek huwenî, la pey di ma mezêlê yewbînan kenenî. (r. 35)

**xo fek ro dayene:** La qalê dewijan nêqediyaybî, zaf meseleyê bînî zî bîy ki înan xo fek ro daynî. (r. 36)

**rî nêgirewtene:** Seki pêrû pîya yew suco giran bikî û rîyê înan nêgiro yewbînan ra biewnî. (r. 36)

**bi serê zîwanî qîsey kerdene:** Ziravi, Perîxani di zî ebi sereyê zîwanî qîsey kerdinî. (r.37)

**sere werdene:** To serey Serdarî werd, nika dora Bengî ya. (r.37, 59)

**camêrd peysayene:** Qey to rê camêrd peysa bi? (r. 37)

**kewçika kesî de vejîyayene:** Wazeno o teres to xo rê mare biko, ti çirê kewçika mi di vejîyêna? (r. 38)

**dinya çîmanê kesî de sîya kerdene:** Bi qîseyanê xo a kiştîbî, dinya çîmanê aye di sîya kerdbi. (r. 38)

**sîy teqîyayene:** Ekek kesî xortê balixbiyayeyî zî bihûmartitînî sîy biteqaynî ancax dewî ra pancas-şetî camêrd vejîyaynî. (r. 40)

**guneyê kesî girewtene:** Dewijan guney ey girewtinî vatinî: "Mela semedo ki zikat û fitran heq biko wina keno." (r. 40)

**kesî ra bi çîmê xirab ewnîyayene:** La nika ki Beyî amey ortmî ser û cendirme ebi çîmbê xirabî ti ra ewnîya, reng Bengîyî ra nêmend... (r. 42)

**keyeyê kesî veşnayene:** Nê keyxerepîyayî key ma veşna, da hukumatî ro! (r. 42)

**har bîyayene:** Gîdîno, bêrê Bengî harr bîyo, dayo hukumatî ro! (r. 42)

**zik û ziwa mendene:** Perîxani zik û ziwa mend bî. (r. 43)

**hêş sere ra şîyene:** Hêş mi sere ra şîbi, mi ê bînî nêdî. (r. 48)

**quça neletî bîyene:** Bengî bibi qareman, Huseyn zî quça neletî. (r. 50)

**eştîş adirî miyan:** Kerway mi ebi destanê xo eşt adirî miyan! (r. 50)

**kabeyê kesî şek ameyene:** Xora dewijî înan ra weş nêbî, nika kabeyê înan şek amebi. Ebi pîleya înan yarî kerdinî. (r. 51)

**pirnika kesî ra kewtiş:** Mi yew xort dî, to vatinî qey hema Serdar pişkayo û vato "çelp" pirnika ey ra kewto. (r. 53)

**zîwanê xo nêşîyayene:** Werrekîna ez nêpersaynî (...) Ez bi zîwanê xo nişna... (r. 54)

**lingî erd ra mendene:** Willay eki ez vaja lingê şîma ard ra manenî. (r. 54)

**qali feke de cawitene:** Herê ti se vana vaji, ti çi qali fekê xo di cawena? (r. 54)

**fek heta pey goşan şiyene:** Qali weşî kerdî, fekê ey şî heta pey goşanê ey. (r. 55)

**goş nayene:** Eke keko Hesen goş mi no, emşo na bêyewma çiftelî erşaweno keyeyê bawke aye. (r. 55)

**qeseba çizayene:** Beyi ra ewnîyay, qesebay aye çizay, va “Ya Rebbî ma ecrê na keyneki ra senê xelîsîyênî?” (r. 57)

**hewa kewtene:** Kam gama ki nê qiseyan pey hesîyaynî hêrsan ver hewa kewtinî. (r. 59)

**fek akermende ewnîyayene:** Dewijî zî fekê înan akermende ey ra ewnîyaynî. (r. 60)

## 5. NETÎCE

Hîkaya “Beyi Se Bena?” hetê struktur û teknîkî ra qasê hikayanê modernanê bînan serkewte ya. Mewzûyê hikaye şinasî yo û mîyanê cuya şarî ra ameyo girewtene. Hikaye esasê xo de bi tewirêko realîst ameya nuştene. La hikaye de hetê hisê neteweyî ra nîyetê mesajdayîşî zaf xo dîyar keno.

Hikaye hetê şuxulnayîşê zîwanî ra zaf dewlemend asena û xusûsiyetanê na hikaye ra o tewr muhîm no yo. Zîwanêko zaf tebî ameyo şuxulnayene û no zîwan mekan û babeta hikaye reyde zaf munasib şino. Senî ke dewe de pîlanê kirdan wexto ke cematêk de qisey kerdîn, di qalanê înan ra yew vateyê verênan yan zî îdyomêk bi, qehremanê na hikaye zî di vateyanê xo ra yewe de îdyomêk şuxulnenê. Yeno zanayene ke nuşttox Îhsan Espar, verê na hikaye bi nameyê “Tanî Estanîkî û Deyîrê Ma”<sup>14</sup> yew xebata folklorîk kerdbî û na xebata xo de folklor û kulturê Pîranî ra nimûneyî arêdaybî. Wina aseno ke na babete de techîzat û pisporîya nuşttoxî, bîngehê zîwanê na hikaye zî viraşt.

Na hikaye, hem edebîyatê kirdkî de nimûneyê hikayanê verênan ra ya û hem zî edebîyatê modern ê kirdkî de cayê xo yê muhîm esto. Hetê folklor û şuxulnayîşê zîwanî ra nimûneyêka baş a û nê cîhetî ra tam dana wendoxî.

---

13-Tanî Estanîkî û Deyîrê Ma, Weşanên Rewşen, Berlîn 1995/ Çapa diyîne: Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2004

## 6. BÎYOGRAFÎYA J. ÎHSAN ESPARÎ

J. Îhsan Espar 1956 de Pîran de maya xo ra bîyo. Ey 1979 de, Dîyarbekir de Enstîtuyê Perwerdeyî qedênayo. Demeyêko kilm Kurdîstan de mamostetîye kerda. Menga nîsana 1982 de Kurdîstan ra vejîyayo û nika Swêd de ciwîyeno. J. Îhsan Esparî unîversîteyê Stockholmi de tarîx û averşiyayîşê ziwane ciwananê diziwaniyan û yê Gävle de zî îlmê cematki wendo.

Hetanî ewro gelek nuştayê eyê kurdki (kirmancki, kurmancki), tirkî û swêdki, hikaye û şîrî eyê kirmancki kovar û rojnameyan de neşr bîy. O serra 1997 ra endamê redaksiyonê kovara Vateyî û serra 2001 ra zî yê Weşanxaneyê Apecî yo. J. Îhsan Espar Grûba Xebate ya Vateyî reyra standardîzekerdişê lehçeya kirmancki (zazaki) ser o zî gurîyeno.

### Eserê ey ke weşaniyayê:

Tanî Estanikî û Deyîrê Ma, Weşanên Rewşen, Berlîn 1995/  
Çapa diyîne: Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2004

Beyi Se Bena?, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2004

Dilopê Zerrî, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2008

Ferhengê Tirkî-Kirmancki (Zazaki) çapa hîrêyîne ya hîrakerdiye, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2009, (No Ferheng, Grûba Xebate ya Vateyî reyra amade kerdo.)

Rastnuştîşê Kirmancki (Zazaki), Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2005 (No kitab, Grûba Xebate ya Vateyî reyra amade kerdo.)

Nê kitabana ra vêşêr 17 hebî kitabê tadayeyê ey weşaniyayê. Zafaneyê nê tercumeyan hikaye û estanikê ke seba domanan ameyê nuştîş ê.<sup>14</sup>

---

14-J. Îhsan Espar [Biyografi], amadekerdax: Roşan Lezgîn, <http://www.zazaki.net/haber/j.-hsan-espar-99.htm>



# ZERRÎYA TO PELEYÊ VEWRI

OktaY ERSOY

Zerrîya to heway peleyê vewri ya  
Gedeyo ki hema newe marda xwi ra beno  
Ti zî heway gedeyî ya  
Wexto ki rîyê to huyeno  
Tede gulî abenê  
Gumî to wirdî polona şonê war  
Û qulqulikî benê  
Çimê to beriqyenê  
Ayo wext  
Zerrîya mi têdi kaykena  
Ez heze ki bena yew mîlçiki  
Perê mi bibî  
Beno ki ez bifira.

## DERSA KIRDKI DEST PÊKERD

### Berxwedan PÎRANIJ

Serra di hezar û des  
Mamosta Roşanî va bes  
Gelê kirdan pêser bîn  
Seba dest pêkero ders

Dersa kirdî lehçe ya  
Ma kirdanê dimilan  
Va lez bikerê erey o  
Şad bikerî ganê medan

Vernî, va, ez bi qirban  
Niyadê goş bidê mi  
Şima rê biyara ziwana  
Armanco girs û giran

Armancê ma o yewin  
Qal û qisey û xeberdayîş  
Yê dîyin û hîrêyin  
Weşwendîş û rastnuştîş

Çi wendekar û suxtey  
Çi malim û mamostey  
Pêro pîya pêser bîn  
Têqewet kewî bi rindey

Ger pers kerî vajîme  
Rayîr çi yo mamoste!  
Ez do vajî musayîş  
Reyna, tekrar musayîş

Badê na rayberî û  
Şîreto zaf erjaye  
Va qey emşo bes nîyo  
Şewe amey nêmey şewe

Ma va, sipas mamoste  
Ti merdimêko delal î  
Do heme dost û hevalî  
Tim o paştîya to bigêrî

Ali Aydın ÇİÇEK

-I-

*Bêriye...*

Îstanbul, Taxa Gazî

Şewa tarî ya. Teber ra hurdî-hurdî şiliye varena. Lambayê kuçeyî yew bi yew roştîye danê şewe. Roştîya lambaya kuçeyî kewena yew banêde qijkekî ser; banê domananê Xalitî ser. Kuçe de serê silondî de çend kutikî bibî kom û lawayêne yewbinî. Hebê cêrê înan de zî di pisingî koka yew dare de înan ra nîyadayênê. Wexto ke bîyêne şewe taxe kutik û pisingan rê mendêne. Serê her silondî de yan kutikî bîyêne kom yan zî pisingî. Êdî hetanî şodir bîyêne zelal veng û qijayîşê înan nêbirîyayêne.

Taxa Gazî de banê kanî têkîşte de hetê barajî ser bîyêne derg û şiyêne. Çeyê domananê Xalitî tîya bî. No hetê taxa Gazî hîna sey dewe bî, mîleto ke nê hetê barajî de nîştêne ro, zafê înan rojhelat ra amabîy nê cayan. Ê ke tîya nîştêne ro feqîrî bîy, pêro zî karkerî bîy; şodir şiyêne kar û şan de gêrayêne ya ameyêne çeyê xo. Nê hetê taxe de dîwaranê banan pêrunê ra sloganî amebîy nuştene û sîyasetê taxe nê hetê de germin bî... Wexto ke bîyêne zimistan nê hetê taxe de mîletî soba nayêne ro û kolî û komir vîştêne ta. Dûyê lojînan, seke dewe bo, winî taxe ser a bîyêne berz û bîyêne vila.

Hetê cêrê taxe ser zî apartmanî bîyêne derg û şiyêne. No hetê taxe goreyê corî rewşa xo tayêna rinde bî û wayîrê mal û milk bî. Êyê nê hetî dewlemend bîy. Nê hetê taxe de nêweşxaneyî, karxane û dikanî estbîy. Wayîrê înan zî çiqas ke qismêk hetê rojhelatî ra bê zî zafêrî reyna rojawan ra bîy. Coka no hetê taxe de lojînan sey hetê corî dû nêkerdêne; nê hetê taxe de gazê tebiî amayêne taviştene.

\*\*\*

- Heqooo! Êdî bes ooooo!

Zereyê banê qijkekî de vengê Xalitî bêvengîye kerde lete. Senî ke Xalit qîra Memed Alî û Ferhadî ser, înan odaya peyî ra xo eşt mîyanê

salone, elektrîk vîşt ta, zereyê salone bî roşt. Verê pencera banî ra yew kewoke pertî day piro û vîyarte. Xalit mîyanê araqî de mendbî. Bîna xo nêamayêne, bibî top, bibî qasê lapê. Mîyanê cile de giran-giran nalayêne.

Xeylê wext o ke halê xo wina yo; hewn çiman nêkuno...

Ferhad hama şî leyê pîyê xo û destê pîyê xo pêgirewt û virane vîşte pîyê xo ra. Memed Alî winî lingan ser o vinet û qayîtê pîyê xo kerd û va:

- Bakil, ez qida, se bî to nîya qerena?

- Qida qida, çiyêde mi çîn o, çiyê çîn o!

Ferhad leyê pîyê xo ra uşt ra şî yew xewlîye arde, araqê rîyê pîyê xo kerd pak, dermanê ey ardî day ci. Xalit heliyabî, zaf bibî zeif. Çimanê ey de roştîye nêmendbî. Rîyê Xalitî ra kifş biyêne ke rewşa ey zaf rind nîya. Dest û payê Xalitî lerzayêne. Ferhadî destê pîyê xo kerdî mîyanê lapa xo û zixm şedinîti. Xalitî qayîtê zereyê çimanê Ferhadî kerd û hebê vengêde barîkekî va:

- Ero lajo lajo, çiyêde mi çîn o! Mi yew hewnêde xirabin dî coka...

Ferhadî hebê vengêde nerm va:

- Wilayî to rind nîya bakil, to rind nîya! Ma nê nêweşxane verday ne zî doktorî verday Îstanbul de. Ma reyna zî derdê to rê çarê nêdî. Heya nêweş a tamam, labelê no senê jan o kewto canê to, to şew û roj wîna nalena û nêkuna ra?

Xalitî binê çiman ra nîyada û va:

- Ero bawo bawo, o yo ke bîyo şîyo, şima qe xo dejnenê ke bîlasebe. Xora destê şima de çi esto ke şima çi danê mi? Na saete ra dime mi rê merdene teyna ke rind a, teyna ke kar a. Xora doxtoran zî va, "êdî erey kewto no, cîgerê nê qedîyê. Xo rê bicê berê..." Mi bi goşanê xo hêşna, mi bi goşanê xo...

Vinet, sereyê xo kerd berz û qaytê saeta dêsî kerd. Saete ameyêne çarê şodirî. Seke xo bi xo de qisey bikero reyna ver kerd ci û va:

- Lo şimanê Heqî kenê mi nê Îstanbul ra, na taxe ra bivejê ez qida û belayê şima bicerî. Mi berê welatê mi. Mi bîrîya erdî kerda, bîrîya dar û kemerî... Ez şorî serê mezela Gula xo rîyê xo wela mezela aye ra kî. Hena ke nêmerdo ez xo rê şorî yew rey reyna ê cayan bîvînî. Heya, zanena dewijî ma mi ra hes nêkenê labelê... Mi vizêrî yew xeyal dî bawo, ez mirena, wele bena mi ra sey maya şima. Ez şima ra teyna yew çi wazena yewbîn ra wayîr bivejîyê, yewbînî bizanê û yewbîn medejne. Kesî medejnê, kesî... Mi zaf xeletî kerdî, zaf însanî dejnay bîlasebe labelê nika senê mi de kulî biyê kul û derd, bîyê jan...

Qiseyê xo nêqedînayî û vinet.

Memed Alî erzîya û pîyê xo ra va:

- Wudaaay! Ma to se winî vana! Na merdena çik a? Na merdene çik a serê zonê nêkunena war a nê rojan. Qa na nêweşîya Heqî teyna to rê çin a to sey pepugî wanena. Yew zî na taxa Gazî de zaf dewijê ma estê. Meşte-bîro yew bi yew pêro seba to yenê. Tayê xo are de eyb o.

Domanan êdî xo ra veng û vaj birna. Labelê înan zî rind zanitêne ke rewşa pîyê înan rind nêbîye û qet kes zî nîyamêne û çêverê înan nêkerdêne ya. Înan zî rind zanitêne qet yew dewijî înan pîyê înan ra hes nêkerdêne. Pîyê înan û çend dewijan millet û dewijanê xo rê xeletîye kerdbî. Coka...

Xalitî destê xo berdî sêneyê xo û înan ra va:

- Xwezila her çî heyana tîya yew xeyal bîbîyêne. Yew xeyalo derg...

Domanan ra ke veng nêvejîya Xalitî hebê vengêde barî û nermî reyna vat:

- Ferê mi lo xêrê merdanê xo kena yew qilme awe nêdana mi, zerepişkê mi bî ziwa.

Ferhad sivik cayê xo ra uşt ra ver bi mitbaxe şî...

Teber ra giran-giran şiliye varayêne û vengê şiliye hurdî-hurdî ameyêne zereyê banî.

\*\*\*

Xalit hewtayserre bî, bejna derga tenike sey dara vîyale bîbî çewt, por sey vewre sere ra bîbî sipî, çimî rind bîbî tarî. Xalit çênaya xalê xo Zere de zewajîyabî û hîrê domanê xo bîbî: Memed Alî, Ferhad û Xase... Xase dewe ra qet nêvejîyabî û lajê yew xinamîyê xo de zewejîyabî. Ferhad û Memed Alî zî dewe ra rewna vejîyabî û amebîy Îstanbul. Hetê ra karê tekstîlî de xeberîyayêne hetê ra zî kewtbîy dima sîyasetî...

Ne a şewe ne zî şewanê bînan Xalit xeyalanê xirabinan ra nêxelesiya. Êdî her şewe halê xo wina bî... Aqilê ey de, sêneyê ey de teyna jan bî... Xeyalan de mar û milaxunan, helî û qilancikan o rehet nêverdayêne. Kamcîn xeyal de nê çin bîy ke! Kamcîn xeyalî de Feqîr û Ele... Xeyalî tarî bîy, xeyalî xirabin bîy. Xeyalî bîbî qîrayîş, bermayîş û nalayîş...

Xalitî nêzdîyê şeş serrî dewa xo de seba dewlete qorîcîyîye kerde, dewa xo rê, cîrananê xo rê bî dişmen. Ne bira zanit ne waye ne zî ciraniye. Ey serre bi serre sey xo kerd û goş dabî qiseyan û propagandaya qereqolî ser. Zaf pîyayî day destê dewlete, zaf dewan ra feteliya û zaf çeyeyê welatperweran veşnay.

Heya, feqîr bî, zaf feqîr bî... Feqîriye dest û payê ey girê dabîy, êdî

mecbur mendbî; domanî çeye de vêşan û têşan bîy. Kesê xo zî çin bî ke yew hetê ser şoro. Domanî hurdî bîy. Mecbur bî, mecbur mebiyêne qet qebul kerdêne wina...

Koranîye arde çimanê xo ser, domanê dewa xo bi destanê xo day kiştene. Bi destanê xo Ele daye kiştene. Ele çênaya torna misayîbê ey bîye. Lajê Rizî, Feqîr zî ey dabî dest. Feqîr çar rojî destê leşkeran de mend, kuwa, oyo ke arde sereyê Feqîrî ser de tena Heq zano. Qîrayîşe Feqîrî de teyr û tur berba...

Qîrayîşê Feqîrî, çimê Ele winî şew û roje verê çimanê Xalitî de bîy. Çimê Ele, qîrayîşê Feqîrî, poşmanîye û jan...

Derbaz bî wext. Derbaz bî wext labelê cuyê ey de her çî bî têser û têbin ra...

Xalit... Xalito girs. Xalit miyanê poşmanîye de, Xalit welat ra dûrî miyanê janî de, şew û roje jan kewto can winî vileyê xo çewt, miyanê poşmanîye de dano xo ra û berbeno. Êdi erey kewtbî û xo bi xo nalayêne û vatêne:

- Heqoooo! Mi se na koranîye arde çimanê xo ser de. Mi se domanê dewa xo, mi se domanê xo day kiştene? Mi se cîranê xo, mi se mordemê xo dejnay? Ez miyanê nê guneyê girsî ra se vejîna? Ez se...

Xalitî sey pepugê çolî wendêne û dayêne xo ra labelê adiro ke kewtbî canê ey, jano ke kewtbî cigeranê ey nêşiyêne xow ra; roj bi roj dayîna bîyêne zîyade û o dejnayêne.

\*\*\*

Bîbî panc aşmî labelê kesî çeverê ey nêkerd ya û ey ra pers nêkerd. Kesî nêvat, "Bira bira, çiyê to esto, to qey wina şew û roje nalena?" Ey zî rind zanitêne ke der-dormeyê çeyê domananê xo de zaf çeyê dewijanê xo estê labelê nêamayêne... Ge-gane Memed Alî o vetêne teber, giran-giran kuçanê taxe ra pîya gêrayênê. O wext çimê kamcîn dewijî inan biginayêne ey ra rayîrê xo vurnayêne.

Aşman ra aşma êlule ya. Teber germ o, tîje roştîye dana dinya. Memed Alî û Xalitî xeylê ke taxe de gêray û qefelîyay, amey serê yew tumêde berzî ser, duşê lîseya Gazî de niştî ro. Tîje tanîyade weşe kerdêne vila û rîyê inan ver bi roştîya tîje bî. Cêrê inan dormeyê lîse ra erebeyî sey morcelayan nêvînetêne; amayêne û şiyêne.

Xeylê wext wina bêveng niştî ro. Dime ra Xalitî cêbê êlega xo ra yew qutîya cixara vete û xo rê yew cixara ci ra vete, bi nifte cixara vîşte ta û giran-giran ver kerd ci şimite. Hetê ra zî qaytê trafikê taxa Gazî kerd. Xeylê ke qaytê ereban kerd dîyax nêkerd, va:

- Lo lo mi de çi û çinayê nînan nayênê. Nê medaxa sey mîloçikan ancînê-ancîne peynîya xo nêna, nêqedînê nê wey!

Memed Alî huya û va:

- Too! Ma rind ke to hîna nêşîya hetê Emînonu û Taksîmî. Ê cayî tewr serheb erebeyî xilxilînê.

Qaytê yewbînî kerd û huyay. Dime ra Xalitî va:

- Hela qaytê, se xilxilînê! Ero qa dewa ma de teyna erbenê gayan estê, ê zî çar-panc tene yê. Lo Heq bo neke nê medaxî bêrê hetê ma, willê-bîlê çê ma weşeno. Erebe wînasî teyna qerekol de estê yew zî ê Ekoşî esta, a zî hefte de, di hefte de rey ya şona suke yan zî nêşona: timûtîm verê ban de wina vinetayî ya.

Şopê wina lex û luxî kerdîy û huyay... Êdî wexto ke amayêne çeyê verê Cemxaneyî ra derbaz bîyêne. Memed Alî gêra pîyê xo ser û va:

- Bakil wazena ma şopê şîme Cemxane?

Xalitî cayê xo de bî mat û vînet. Sereyê xo ver bi çeverê Cemxaneyî çarna û nîyada. Vînet û çîyê nêvat. Ê ke çîyê nêvat, Memed Alî reyna va:

- Bakil to vana çi, ma şîme yan meşîme?

Xalitî sereyê xo kerd verê xo û va:

- Of off! Ero rîyê mi çîn o ke ez şorî Cemxane. Hem na saete ra dime şorê se beno, meşorî se beno. No gunayo ke vileyê mi de, no qilêro ke çareyê mi ra yo...

- ...

Memed Alî nê qiseyanê pîyê xo ra vet ke êdî ê her çî sereyê xo de qedênayo. Se bîkero zî Xalitî her çî ra dest verdayo ra. Zerrîya ey bi na rewşa pîyê xo zaf veşa.

Memed Alî kewt hermeyê pîyê xo û ver bi çeyeyî giran-giran kewtîy bi rayîr.

-II-

*Agêrayîş...*

Roja yewşemeyî ya, peroj o. Ferhad û Memed Alî ewro çeye der ê; nêşîyê kar. Xalitî mîyanê cile de meredîyayo ra û naleno. Cîla Xalitî verê penceraya oda de viraştî ya. Roştîya tîje pencera ra dana cîla Xalitî ro. Riyê Xalitî sey leymune bîyo çeqer. Verê cîla Xalitî de serê sehpa ra xeylê dermanî nayê ro labelê Xalitî êdî dermanan ra fek verdayo ra.

Memed Alî û Ferhadî rind fam kerdbî ke seba Xalitî êdî se bîkerê zî çarê çin bî. Qerar dabî: Xalitî ganî hîna ke nêmerdo berê dewe. Xora xebere rewna dabî dewe, xebere dabî waya xo Xase.

Memed Alî rîyê pîyê xo de nîyada û berba. O ke berma Xalitî çimê xo kerd ya û ey ra vat:

- Lajo, to qey berbena?  
- Çiyê çîn o bakil, çiyê çîn o!  
Xalitî bi vengêde nerm va:

- Lajo ero ez her nîyo, ez zaneno to qey wîna kena. Bîlasebe xo medejne. Mi na merdene heq kerda, to zanena.

Memed Alî qaytê Ferhadî kerd û xo ra veng û vaj birna. Ferhatî dizdênîya pîyê xo Memed Alî rê îşaret kerd ke wa zaf ey meqefelno. Lebelê Xalitî reyna ver kerd ci û va:

- Bawo ma dewe de hîrê pîya çekê dewlete girewtî: Ez, Şayîder û Rizê Weze. Ma se bî? Çend serrî ma gonîya cîrananê xo şimîtê, çê bira û wayanê xo veşnay. Çi kewt destê ma: tewr. Şayîder, dewlete bi xo o kerd vînd, Rizê Weze rema şî Îzmîr, êdî se bî Heq zaneno. Ezî kî na wo halê kutikî der o. Ax ax! Mi goş nêna qesanê Gula xo ser. Gula mi... Haya, ma vêşaniye ra bimerdêne zî ganî ma çekê dewlete megirewtêne xo dest. Ganî ma...

Bîna Xalitî birîya. Sereyê xo na banişna ser. Ferhad şî destê pîyê xo kerd mîyanê lapa xo û va:

- Bakil ma bîleta to birna, ma roja sêşemî pîya şonîme dewa xo.

Xalitî êdî goş nêdayêne qisayanê Ferhadî ser. Xo bi xo qisey kerdêne û vatêne:

- Kes nîyame... Kes nêno. Yew pîya... Yew pîyê nîyame û çêverê ma nêkerd ya. Ganî ma...

Ferhad û Memed Alî sivik çêverê salone ant û vejîyay teber...

\*\*\*

Sêşeme...

Roştîya tîje dayêne deryayî ro û qaqlîbazan serê deryayî ra, dormeyê tekne û gemîyan de firdayêne.

Xalit, Ferhad û Memed Alî yew otobuse de ver bi Mûşî rayîr gêne. Memed Alî û Xalit têkîşte de nîştê ro, Ferhad zî duştê înan de leyê yew cinîka kokime de yo...

Otobuse giran-giran İstanbul ra serê pirdê boxazî ra derbaz bîyêne û şîyêne ver bi rojhelatî...

\*\*\*

Dewe...

Cemê şanî yo. Ereba kewta mîyanê dewe, domanê dewe pêro der-dormeyê ereba de ameyê pêser, bîyê kom sey gilindika pirçî. Xora



hertim halê domanan wina bî. Seba yew şekir, yew meywe yan zî seba çî-mîyê kay û werdene çimê domanan rayîrê ereban de bî. Dewe de teyna ereba Ekoşî bîye; yew erebayade sûre, kan û korte.

Domanî xeylê dormeyê ereba de erzîyay we û qayt kerd ke kes çiyê nêdano înan giran-giran reyna bîy vila û şîy kayê xo ser.

Seba Xalitî kes nêamebî, teyna çênaya ey Xase û teba virana Xase de yew domanêda qijkeke. Dewijan mîyanê dewe de dûrî ra dûrî qaytê Xalitî kerdêne û mîyanê xo de xorîn-xorîn qisey kerdêne. Ferhat û Memed Alî kewtîy binê hermanê pîyê xo û o ereba ra kerd peya. Xalit rind bibî giran. Senî ke Xalit ereba ra bî peya Xase bilerz şîye destê pîyê xo. Labelê Xalitî destê xo nêda Xase, teyna virane vîşte Xase ra û çareyê aye ra maçî kerde, halê yewbîn ra persay. Domanan zî yew bi yew virane vîşte yewbîn ra û halê yewbînî pers kerd û kewtîy verê xoşebere.

Xalitî derg-derg qaytê tornê xo kerd û huya. Dime ra va:

- Torna mi zî mendo pîrika xo Gule. Pîrnikesey aye qijkek a.

Seke hinî va Ferhad û Memed Alî qaytê yewbîn kerd û huyay. Ferhadî virana Xase ra domane girewte û va:

- Qa se bîyo bakil to xo înkâr kena torna xo ra. Hela nîyade, hetê çim-miman ra zî menda ra to. A ha!

Û huyay...

Wexto ke amey nêzdîyê çeyeyî seke çimê kutikî ke ginay Xalitî ra hama erd ra vaşt ra û ver bi Xalitî rema û ame xo pilosna linganê ey ra. Xalit zî bî çewt yew lew na çareyê Yamanî ra û va:

- Yamanê mi, delalê mi ez zaneno to bîrîya mi kerda. Ero ez na wo amo, ez na wo amo amo êdî!

Sewbîna çiyê nêvat û bêveng derbazê banî bî.

\*\*\*

Payîz o, koyî mîyanê mij û dûmanî de bîyê vîndî. Dewe mîyanê bêvengîye de ya. Xalit sodir ra cila xo ra vejîya, çoganeda zixme girewte xo dest giran-giran ver bi mezelan şî.

Mezelê dewe nêzdîyê dewe bîy labêlê Xalitî sey domanan lingî eştêne. Nêm saete ra zîyade derbaz bibî Xalit ame reşt mezelan. Vernîye şî mezela Gule ser. Xeylê ser a vinet û berma. Xo bi xo qisey kerd û xeylê wext winî vinet. Aye ra dime serê mezela Gule ra uşt ra şî leyê mezela Ele û Feqîrî ser. Mezelê înan têkîşte de bîy. Ame mîyanê mezelanê înan de nişt ro. Qefelîyabî, xo serheb verda ra. Destê xo yew bi yew kerd wela mezelanê înan ra. Sey yew filmî domanîya Ele

û Feqîrî yew bi yew verê çimanê ey ra derbaz bîye. Yew zî ê hedîseyî peyênî... Destê xo berd sêneyê xo û xo bi xo bi vengêde nerm va:

- Sêneyê mi de zaf derd û kulî estê labelê cayê di kulan zaf xorîn o. Dil û cîgerê mi nînan kerdî lete, nînan... Xêr nêmodo dinya de, xêr nêmodo. Çiyê nêdî mi serê na dinya de, mi çiyê nêdî: ne xêr ne zî rindekîye. Feqîrîye, belengazîyê vileyê mi kerd çewt. Emrê mi şiwaniye de, emrê mi xulamîye de, emrê ni karê şarî de qedîya. Mi şenik sere nêna dar û kemerî ser, vêşan-têşan menda labelê wijdanê mi pak, zereyê mi pak bî. Labelê a qorîcîtiye ez kerdo kor, ez kerdo qilêrin... Mi xo kerd qilêrin labelê êdî qedîya...

Vinet. Dûrî ra dûrî hetê dewe ra nîyada. Darê mîyanê dewe, dormeyê dewe pêro bibî rit, dewe zî sey ey ritûrepal bibî.

Gêra ya ame çeye. Kesî de yew çekuye qisey nêkerd. Şî oda pey de verê pencera banî de serê yew sendalî de nîşt ro. Derg-derg pencera ra qaytê teberî kerd. Serê yew dara girse de qertalî bibîy kom û nata-bota firdayêne. Yew hetê ra zî vengê lawayîşe Yamanî amayêne goşanê ey. Çiqa ke şî nê vengî mezgê ey de kewtîy têmîyan, mijê teberî çimê ey sey perdeyî girewt û Xalit xo ra şî...

\*\*\*

Roja bîne cemê şanî serê mezelan ra teyna hîrê-çar pîyayî bîy, yew zî kutikê: Yaman. Bê nînan qet yew dewij nêamebî mezela Xalitî ser, pêro dewe de serê kom û merekan ra yan zî penceranê bananê xo ra mezelan ra nîyadayêne.

Mezela Xalitî leyê mezela Gule de kinite û o uca darde we. Teyna çênaya ey Xase bermayêne. Ferhad û Memed Alî bêveng bî. Ferhad û Memed Alî zerrîya xo rehet nêbî. Yew janode girs zerrîya înan de bibî kewe û ê dejnayêne. Labelê êdî naye ra dime ortê miletî de sereyê xo rehet kerdêne berz. Sîya pîyê înan, guneyê pîyê înan êdî vileyê înan de nêbîy. Na merdene hetê ra înan rê girane bîye labelê hetê ra zî...

Xeylê wext ke mîyan ra derbaz bî pêrone mezeli caverday û amey dewe, amey çeyê xo. Teyna Yamanî rike kerdbî û mezele ser a dûr nêkewtêne. Ferhad û Memed Alî giran-giran ver kerdbî ci çî-mîyê xo yê rayîrî dayênê arê. Roja bîne şodir ra rayîr ra bîy.

A şewe vayêde yaman ameyêne. Dewe de teyna vengê vayî ameyêne heşnayene: vengê fitîka vayî. Û yew zî serê mezelan ra zurayîşe Yamanî...

# ŞALA SÎYA

Roşan LEZGÎN

Wexto ke wina zaf wext yaban ra, keyeyê xo ra, cinî ra dûrî mendêne, înan xo mîyan de henekî kerdêne. Yewbînan ra vatêne, “Boya kelceyî to ra yena.” Nika ke no serê şefeqî rew wina bi heyecan qamyone ramitêne, no vate ameyêne vîrê ey.

Şan de şefê înan vatbi “Nê parçeyanê kompresorî ke xeripîyayê, ganî ti meşte berê dayre, bivurînê, ê neweyan bîyarê.” Ey zî vatbi “Şefê mi, eke ti destûr bidî, ez şefeqêk rew werzena şina. La verî ke ez şira Diyarbekir, ez şina qasê saetêk Hêni de, keye de kincanê xo vurnena, hema şina Diyarbekir.” A game şef zî embazê ey zî pê huyabîy û vatbi “Xora ha boya kelceyî to ra yena! Eke ti nêşî keye, yew weqîet destê to ra vejêno...”

Nika gama ke binê Pasûrî ra vîyartêne, xo rê xo peşmirîyayêne. Na qale ameyêne vîrê ey û ser o fikirîyayêne ke, hende zî veng ra nêameya vatene. Bala xo da ke rasta zî boya kelceyî ey ra yena. Êdî davîst rojê ey tamam bibîy ke yaban ra bi, çimê ey bi keye nêkewtbi.

Zemanêk wexto ke dewe de bîy, înan pes kerdêne weye. Weş ameyêne vîrê ey. Hema ke tuşkî nêbîyê kelce, înan yew tuşko xurt û qelew seba toxumî mîyanê celeyî ra vetêne, ê bînî heme xesênayêne. No tuşk êdî zere de bîyêne weye, veranêdayêne mîyanê pesî, çimê ey nêginayêne yew bize ro. Werdê ey zaf bi dîqet dayêne ci. Baş kerdêne weye, kerdêne xurt. Payîzî, êdî bîyêne yew kelceyo hêç. Şan de wexto ke bola pesî yaban ra ameyêne, gêwe de kelce veradayêne mîyanê bizan. Ame vîrê ey ke zafê reyan gama ke ey bi xo cew berdêne dayêne kelceyî, yew boya ecêbe kelceyî ra ameyêne.

Sereyê xo acêr kerd, yaxeyê gomlekê ey heta gocaga hîrêyine ak-erde bi. Sêneyê xo boy kerd, a boya ke kelceyî ra ameyêne, nika sêneyê ey ra zî ameyêne. Zinciya ey boya kelceyî ra biye pîrr. Zûrî nêbî, rasterast boya kelceyî bî.

Înan rayîrê mîyanê Pasûrî û Mûşî viraştêne. Verûverê Gelîyê Pasûrî, kaş û kendalan ra rayîr viraştbi, Gola Nêrî ra vîyartbîy, nika resaybîy

Dîyarê Qozmeyî. Zozananê Şênê de şantiye naybî ro. Gama ke mazotê înan qedîyayêne, yan zî yew wesaîte ariza dayêne, ameyêne gureyê xo dîyêne û apey agêrayêne. Destê xo têwdayêne, çunkî nê koyan ra payîzî rew vewre varayêne, hetanî aşma gulane nêhelîyayêne. Zaf varayêne. Coka wext tay mendbi, ganî pêsero û leze bixebitîyayêne.

Rasta ci, hamnan zimistan kar û gureyê înan wina bi. Rayîrî viraştêne, rayîrê ke rijyayê tamîr kerdêne, zimistanî vewre rayîran ra rutêne. Reye estbî hewteyêk, des rojî, pancês, vîst... Heta ke reye esta aşmêk zî yaban ra mendêne. Çimê înan bi keye û kulfetî nêkewtêne. Rojanê şeme û yewşemeyî zî xebitîyayêne. Bi no qayde meaşê înan bîyêne dila, hîrêla. Pere weş kewtêne destê înan la zafê reyan hende keye ra dûrî mendêne ke êdî xebate ra aciz bîyêne. Heta ke boya kelceyî înan ra ameyêne. Nika ke hewna xo boy kerde, canê ey ra, zereyê şofermehlî ra, her ca ra boya kelceyî ameye.

Gama ke qamyona ey fetlan û hokan ra tadîyayêne, xeyalê ey de tena keye estbi. Bêriya her di domanan zî kerdbî la nika cinî hîna vêşî ameyêne kewtêne mîyanê xeyalanê ey. Verê çimê ey de hende sehneyê erotîkî virazîyayêne ke heyecan ra destê ey, heme canê ey lerzayêne. Tevzikî ginayêne piro. Ewnîya saete ra, hema wext rew bi. Nê msaetêna badê cû resayêne bi Hêni. Qamyone berdêne Aycan Petrol de park kerdêne. Qasê yew-di saetî şîyêne keye. Boya xo vetêne, xo şutêne, kincê xo vurnayêne. Dima, weniştêne qamyona xo û verê xo dayêne bi Dîyarbekir.

Hetanî ke o bişîyêne keye, domanî şîyêne mekteb. Domanî hetanî saete duwês mekteb de benê. Duwês de paydos kenê, yenê keye de werd wenê û hewna şinê bi mekteb. Ame verê çimê ey ke nika cinîya ey tena ha keye de. Arayî daya domanan, şawitê bi mekteb. Ha kewta derûdorana, keye weçînena, pot û pertalanê keyeyî baxçe de weşanana, keye ruwena. Belkî nika cinîya ey zî wina ey xeyal kena la qet nêzana ke o key gure ra agêreno yeno bi keye. Wexto ke şiro ber bikuwo, aye rê beno sey yew surprîzê weşî.

Ge-ge yew kilama sivike mîyanê lewanê ey ra vejîyayêne, yew heyecanî o girewtbi ke zerrîya ey pirtayêne, wina pêsero tevzikî ameyêne canê ey. Cinîya ey bi her şeklê xo ameyêne verê çimê ey. Heme şeklê aye zî rindek û şehwetinî bîy. Cinîya xo ra hes kerdêne. Qet zî zûrî nêbî ke nika zaf bêriya aye kerdbî.

Wexto ke yew embazê înan hetê keyeyî wa bişîyêne, înan şantiye de ey dima henekî kerdêne, vatêne, nika ha wina keno, nêzana wina

beno. Û xo rê hir-hir huyayêne. Ame vîrê ey ke nika embazî badê ey zî xo rê qalan vanê û huyenê. O zî huya.

Saete tam heşt û nêmd de resa bi Hêni. Erebeya xo park kerde. Verê xo da keye û gamê xo hîra eştî.

Banê ey yew bereqaya yewla, mîyanê yew baxçeyî de bi. Nê bereqayî badê erdlêzê 1975î amebîy viraştene. Berê baxçeyî kerd a, ame verê berê zereyî.

Ah ha! No çi yo? Ber girewte yo. Hetê teberî ra kilîtkerde yo.

Kes keye de çin bi!

Hewesê ey qursaxê ey de mend. Mûrê ey xeripîya. Qet moral tede nêmend. Heyecanê ey vurya, heme bi hêrs û reyanê ey ra bi vila. Xo rê xo de va “Na kutikbawe şîya kora?”

Ard vîrê xo ke yew kilîtê keyeyî ey de zî esto. Destê xo berd tunika çakêtê xo. Kilît dî. Ber akêrd. Ewnîya mitbaxe ra, ewnîya firaq-miraqan ra, bellî bi ke cinîya ey vîstikêk verî keye ra vejîyaya. Bi awiranê vengana nat ewnîya, wet ewnîya. Nêzana se bikero. Axir ber ra kewt teber, sereyê xo serê dêse mîyanê baxçeyê xo û cîranê xo ra kerd berz. Venga cîrana xo da:

- Ha cîron, ha cîronê!...

Cîrane ameye teber. Camêrdî va “Eylekê ma keye de nîyê. Ti nêzona şîyê kora?” Cîrane va, “Serê sibay mi dî a û tutî pîya vejîyay teber. Ez vona, belkî şîya keyeyê maya xo. Vizêr qal kerd bi ke maya aye nêweş a.” Cîrane rê teşekur kerd, zereyê xo de zî vistirî ra nengî çinay. Agêra şî zere. Wexto ke agêra, cîrane ey dima epey ewnîya.

Cîrane fama bîye, weş hal ra fehîm kerdêne. Camêrd senî ke ageyra şî zere, cîrane lezûbez şala xo daye xo ra û kewte teber. Şîye ke xebere bido cîrana xo, vajo “Mêrdeyê to ameyo, ha keye de.” Û uca ra zî şo sûke, dikanê Xelîlî ra tayê çî-mî biherîno.

Camêrd zere de odayan ra wina tewş geyra. Hetanî ewro no ban ey rê hende xir û xalî nêamebi. Ame verê berî, nat û wet ewnîya kuçeyî ra. Teber a kes çin bi. Hewna ageyra şî zere. Ewnîya saete ra. Qet nêzana se bikero. Ame vîrê ey ke nika embazê ey şantiye de behsê ey kenê û xo rê werreyê xo bi ey anê. Henek-menekan kenê û huyenê. Ewnîya halê xo ra, yew rey hêrs bi. Bi o hêrsê xo ber kilît kerd û kewt teber. Nêzana ke ser a şîro. Dima, lingê ey bi xo hetê keyeyê vistirî ser wedarîyay.

Hêdî-hêdî şî. Serê kuçeyî ra tadîya. Kîştî Parka Mezelekî ra vîyart. Êdî kewt bi sûke. Wina cadeyê sûke ra rast hetê Mehla Dêrî ser

şiyêne. Keyeyê vistirî a mehla de bi. Bala xo da ke sûke zî êdî bîya qelebalix. Selam da çend esnafan la na saete de dewijî amebîy sûke. Xo rê kel-mel erînayêne, sereyê esnafan germin bi.

Hêrsan ra waşt ke agêro rast şiro wenîşo qamyona xo û verê xo bido bi Dîyarbekir. Seke qet nêameyo Hêni. La bê kê o biwazo, lîngan o hetê keyeyê vistirî ra berdêne.

Lîngan o berdêne keyeyê vistirî la gureyê ey keyeyê ey de estbi. Çi îşê ey keyeyê vistirî de bibi? Eke nêweş a, xora nêweş a! O se biko? Xora tim vana “Ez nêweş a”.

Derdê camêrdî no bi ke ganî xo bişutêne, kincê xo bivurnayêne û rew bikewtêne rayîr. Eke şiro keyeyê vistirî, ganî bineyke uca bimano. Ha çay bişime, ha nan biwere. A han to rê, bineyke zî naz û nuzê vistirî. Ha qorteyê mi dejen, ha paştîya mi dejena, ha veyvî kêneyê şarî yê, nêewnênê mi ra. Ha flankese wina vato, ha a bîne kul veto!...

Gama ke wina dayêne têver ke şiro yan ney, a vîstike de nişka ra kewt verê çimê ey ke cinîyêk ha wet ra yena. Cinîke hetê Camîya Pîle ra ameyêne. Cinîke ge ewnîyayêne xo ra ver û ge zî ewnîyayêne ey ra.

Hêni de, hema vajêne ke heme cinî gama ke bivejyayêne teber, şala sîya xo ra piştêne û rîyê xo ser o zî peçe veradayêne. Bi no qayde hemeyê cinîyan mendêne yewbînan. Heme cinî bîyêne seypê.

Cinîke ne zaf derge bîy, ne zî kilme. Ne zaf zeîfe bî ne zî goştine. Mîyanê çarşeba sîya de tam edetî aseyêne. Labelê wina şikiyabi zer-rîya ey ke a cinîyêka rind a. Û ha ewnêna ey ra!

Camêrdî ard vîrê xo ke beşna ey sey yew sewle tîk a. Zimbêlê ey sîya û tarî kenê. Çareyê ey hîra û pehn, zincîya ey sey zincîya yew beranî ya. Xo semt dîyêne. Mîyanê se camêrdî de bîyêne zî bale antêne xo ser. Nika ke na boya kelceyî zî ey ra ameyêne, xora êdî qet mevajêne.

Xo ê hetî ser da. Ey zana ke cinîke çim verdayo ey, ha a zî xo hetê ey ser dana. Ey bineyna zî xo hetê cinîke ser da. Gama ke têkîşte ra vîyartîy, cinîke qet veng xo ra nêvet la binê şale ra destê xo kerd derg, nuçikna pira û vîyarte şî. Nişka ra yew heyecanî o girewt ke qet mevajêne. O hêrsê ey heme vurya, bi yew heyecanêko ecêb. Çokê ey bîy sist. Çend gamî eştîy, xo ser de feteliya. Xo ra pey ewnîya cinîke ser. Ey dî ke cinîke zî gamî kerdê sist, a zî fetelîya, xo ra pey ewnîya ey ra. Hem zî bi baldarî ewnîya. Se ke vajo, “De agêre, bikewe mi dima...” Qelbê ey bêhed pirta. Bineyke vindert, nat û wet ewnîya sûke ra. Bin ra kes înan ra haydar nêbibi. Xo rê xo de fikirîya ke gelo cinîyê

winasî şaristanê înan de estê yan ney? Ame vîrê ey ke ge-ge tayê embazê şilabendesistî yê ke wina pinanî gureyan kenê, înan qal kerdêne la hetanî nika caran yew çîyo winasî nêamebi sereyê ey de. Hewna feteliya, pey ra ewnîya cinîke ra. Cinîke hêdî-hêdî şîyêne, gamê xo hurdî-hurdî hûmaritêne. Gama ke pey ra ewnîya, zerrîya ey xeriqîya. Fek şîyayîşê keyeyê vistirî ra verada. Agêra, kewt cinîke dima.

Cinîke gama ke tam hoka vera Parka Mezelekî ra destê rastî ser feteliya, hewna xo ser de feteliya û ewnîya ey ra. Epey ewnîya. O zî cayê xo de mat mend. Yew cixara viste ta. Dûman xo ser de verada. Cinîke zî êdî hoke ra tadîyabî. Senî ke cinîke goşe ra bî vîndî, camêrdî zî aye dima gamê xo hîra eştîy, kewt ra şopa cinîke ser.

Hema ke nêkewto rayîrê Arqenîsî ser, pey ra resa cinîke. Dorê xo ewnîya, kes çin bi. Bi vengêko sistek va:

- Şîşt!

Nê vengî reyde cinîke feteliya, ewnîya ey ra. Cinîke qet şîyayîşê xo nêvindarna la gamê xo kerdîy sist. Qet xo ra veng-meng nêvet. Peçeyê serê rîyê xo zî wenêdart. Camêrdî xo kerd pîrr, kerd veng. Nêzana ke nê tewir cinîyan reyde merdim senî qisey keno. Embazan rey-rey xo mîyan de gama ke qalê nê çîyan kerdêne, vatêne "Mi vato, herê to ez helnaya, ti reyke mi nêkena mêman?" Wexto ke tam kaleka cinîke ra vîyartêne, fekê xo berd verê goşê aye û nê çekuyî, senî ke fekê embazan ra eşnawitbîy, bi no qayde fekê ey ra xovero vejîyay.

Cinîke qet veng xo ra nêvet. Camêrdî xo aye ra dûrî da. Nat û wet ewnîya. Xo ra pey ewnîya. Kes nêasayêne.

Bineyke şaş bibi. Nêzana ke se bikero. La dima ra hişê xo da arê. Hewna xo da nêzdîyê cinîke, heme cesaretê xo ard pêser û va, "Keyeyê mi tîya ra nêzdî yo. Kes keye de çin o. Mi dima bêre. Qasê nê saete keye de bimane, ez yew banqnoto kewe dana to." Cinîke xo rê peşmirîya, sereyê xo berd û ard. Camêrdî fehîm nêkerd ke tam vana çî.

Camêrd, êdî reyke kewtbi mîyan la nêzanayêne ke se bikero. Gamê xo kerdîy sist.

Cinîke hêdî-hêdî şîyêne, ge-ge xo ser de feteliyayêne û ewnîyayêne camêrdî ra. Cinîke sakîn bî û binê şala sîya de peşmirîyayêne. Camêrdî ra zî dûr nêkewtêne, coka camêrdî hewna xo kerd pîrr, cesaret kerd. Şî hetê aye ra. Va "Eke pere tay bo, ez di hebîne bida." Cinîke huya. Bi vengêko nermek û şehwetin va "Temam!"

Camêrdî seke cebhe de zorê yew artêşe berdo wina muzaffer, dest eşt zimbêlanê xo, cor de bi destê xo acêr şane kerdîy. Hewna dorê

xo ewnîya. Kes kuçe de nêasayêne. Xo da nêzdiyê cinîke, va “De ez ha şina, ti mi dima bêre. Kes keye de çin o. Ez berî akerde verdena. Rast bêre zere.” Wina va û kewt cinîke ra ver, gamê xo bi heyecan û şidênaye aver eştîy.

Êdî amebi serê kuçeyê keyeyê xo. Camêrd leze şî, berê baxçeyê kerd a. Binê çiman ra zî nat û wet ewnîya ke hela cayê cîran-mîranê ey teber a asenê yan ney. Qet kes çin bi. Xo ser de feteliya ewnîya ke cinîke ha rast ver bi ey yena. Lez kerd şî, berê zereyî kerd a. Xo da hetê zereyî û pabeyê cinîke vindert.

Cinîke qet dorê xo nêewnîya. Seke keyeyê aye bo, wina rehet rast berê baxçeyî ra kewte zere. A game wina heyecanêk camêrdî girewtbi ke heme canê ey lerzayêne. Qelbê ey kerdêne ke vindero. Camêrdî huşk ber de girewtbi û wina bi dîqet hem ewnîyayêne cinîke ra û hem zî sereyê xo bineyke mîyanê berî ra vetêne teber, nat û wet ewnîyayêne ke gelo kes teber a esto yan ney.

Cinîke senî ke ber ra kewte zere, ey qirp û ber ser de girewt. Va, “Ti xeyr ameya.” Cinîke qet veng xo ra nêvet, şî eywane. O zî dima şî. Ê qet firsend nêda ke cinîke ronîşo, yan şala xo vejo, hema pey ra a qefelna. Ey cinîke kerde verara xo, her di destê xo eştî serê memikan, piştîya aye sêneyê xo wa pêt şidêna. Qirpî estikanê aye ra ame. Bi vengêko sistek va “Cinîya mi şîya keyeyê maya xo. Ez bawer nêkena ke hetanî teştare bêro.” Ê qiseykerdişê xo de zî şala cinîke sereyê aye ra şequetna, fekê xo berd hetê alişka aye ra.

Aaa!...

Nişka ra qîştînî kewte cinîke ser. Sey yew qijika birîndare bî qij-qija aye. Cinîke sey marî xo mîyanê destanê camêrdî ra xelisna û sey pisînga ke kutikî a kerda kujê dêsî, winî pencikê xo eştîy rîyê camêrdî.

Camêrd senî ke çim gina rîyê cinîke ro çimê ey mat bîy, ziwan fek de bi lal, her di destê ey ver de bêruh amey war, payanî ra bi sey kerra û mend.

Diyarbakir, 19.12.2007



# VEWRSIPÎYEKE

Almankî ra çarnayox: M. DOGAN

Yew bî, yew çin bî. Orteyê zimistanî bî. Vewre sey purtikê zeren-can asmên ra ameyêne war. Qiralîçayêke verê penceraya ke çarçewaya aye dara abanoza sîyaye ra virazîyabî de niştêbî ro û xo rê karê deştene kerdêne. Gama ke deştêne, semedê ke qayîtê vewre kî kerdêne, derzîne şîye bêçika aye ra. Hîrê dilopê gonî çilkayî serê vewre. Seba ke rengo sûr vewre ser o zaf rindek asayo, aye zereyê xo de vato, “Werrekna yew domana mi bibîyêne, wa posteyê aye sipî sey vewre, lewê aye sûr sey gonî û porê aye zî sîya sey abanoze bîyêne.” Demê ra dima yew kênaya aye bîya. Posteyê kêneke sipî sey vewre, lewê aye sûr sey gonî û porê aye zî sîya sey abanoze bîyo. Coka nameyê aye Vewrsipîyeke naya ro. Çitur ke kêneke ameya dinya, qiralîça merda.

Eynî serre de qiralî xo rê cinîyêna arda û zewijîyayo. Cinîyêka rindeke bîya, la rindekîya xo de kî xo ra zaf razî bîya. Eke xo ra rindekêr kese bidîyêne, zaf celiyayêne. Yew eynika aye ya efsûnêne kî estbîya. Hertim şewdir ra şîyêne verê eynika xo û persayêne, vatêne:

“Eynîkê, eynika rîyê dîwarî,  
Kam a tewr rindeka nê dîyarî?”

Eynike timûtim vato:

“Ti ya qiralîçaya mi, tewr rindeka nê welatî.”

O wext memnun bîya, çike zanayo ke eynike tim rastîye vana.

Labelê Vewresipîyeke bîya pîle, daîma bîya rindekêre û wexto ke resaya bi hewtserrîya xo, sey roja paka hende delale bîya. Qiralîça ra kî rindekêr bîya. O wext gama ke qiralîça eynike ra pers kerdo vato:

“Eynîkê, eynika rîyê dîwarî,  
Kam a tewr rindeka nê dîyarî?”

Eynike cewab dayo vato:

“Qiralîçaya mi, tewr rindeka nê cayan ti ya.

La rindekîya Vewrsipîyeke to ra hezar qatî ya.”

Qiralîçaya ke qîseyê eynike heşnayê, vilişîyaya pêro û hesûdiye ra gonî rîyê aye de nêmena. O dem ra tepîya zerrîya qiralîça Vewrsipîyeke ra menda û aye ra nefret kerdo. Hesûdiye û ezamet sey vaşê bengî zerrîya aye de roje bi roje rewîyayo, heta ke huzur tede nêmendo. Venga seydwani dayo, vato:

“Na domane bere bi birr, çimanê mi ra dûrî fiyne. Aye uca bikişê û sey delîlî mi rê pişik û cîgera aye bîyare. Ez wazena sole de bipewzî û biwerî.”

Seydwanî goş ro aye nayo, Vewrsipîyeke girewta berda bi daristan. La gama ke kardîya xo veta û waşto ke zerrîya aye ya mesûme ra qilaşno, Vewresipîyeke dest bi berbayaîşî kerdo vato:

“Ax seydwano, eza qurbane. Ruhê mi megîre. Ez reyna anêgêrena keye, ez şona mîyanê daristanê kovîy.”

Seydwan kewto rindekîya Vewrsipîyeke ver. Zerrîya ey pê veşaya, vato:

“Şo bireme, domana belengaze.”

Zereyê xo de vato, “Hewywanê kovîy xora do to biwerê.” La zerrîweş bîyo ke o mecburê kiştîşê aye nêbîyo. A linge de leyîrêko qijkek yê xozî uca ra vîyarto. Seydwanî leyîr serebirnayo. Pişik û cîgera ey vetê û sey delîlî qiralîça rê berdê. Werdpewj mecbur bîyo ke sole de bipewzo. Qiralîçaya nîyetxirabe ê werdê. Xo rê vato qey aye pişik û cîgera Vewrsipîyeke werdê.

Vewrsipîyeka belengaze birr de tik û tena menda. Coka zaf tersaya û qayîtê pêro velganê daran kerdo ke nêzanayo se bikero. Aye ra vazdayo û vazdayo. Kemeranê tujan ser ra, mîyanê telîyan ra û heywanê kovîyan ver ro şîya la pêşkarê aye nêbîyê. Hetanî ke linganê aye de taqet estbîyo vazdaya. Axir gama ke roj şîyo awan, a rast ro keyeyêkê qijkekî ameya. Şîya zere ke biarisîyo. Keyeyekî de her çî qijkek la pak û şîrin bîyo. Xonçike bi rîpêşo sipî û hewt tebaçayan, verê her tebaçaya de koçikî û aye ra kî wet hewt kardî û çetalê qijkekî, hewt bardaxikî. Dêşî ver de hewt cilikî bi rîpêşanê neweyanê sipîyan têlewe de raviste bîyê. Vewrsipîyeke vêşan û têşan bîya. Her tebaçaya ra tikêk tarrûtur û nan werdo. Her bardaxike ra qurtêk şerab şimito, çike nêwaşto hemeyê werdê tu kesêk pêro ey ra bigîro. Dima, seba ke hende rincan bîya, waşto ke rakewo. La qet cile ro ci nêşikiyaya; yewe zêde derge bîya, yewe kî zêde kilme bîya. Axir a hewtine şîya ro weşîya aye. Kewta cila hewtine, minete kerdo û şîya hewn ra.

Senî ke bîyo tarî, wayîrê keyeyî ameyê keye. Ê hewt cuceyî bîy ke koyan de maden kinitêne. Hewt çilayê xo fiştê ta (vistê ta). Çitur ke bîyo roşn, cuceyan tey veto ke kesêk ameyo keyeyê înan, çike her çî sey verî cayê xo de nêbîyo.

Ê yewinî vato:

- Kam sandalîyekê mi ser o niştro ro?

Ê dîyinî vato:

- Kamî tebaçaya mi ra werdo?

Ê hîrêyinî vato:

- Kamî nanê mi ra werdo?

Ê çarinî vato:

- Kamî tarrûturê mi ra werdo?

Ê pancinî vato:

- Kamî bi çetaleka mi pede kerdo?

Ê şeşinî vato:

- Kamî bi kardîya mi birnayo?

Ê hewtinî vato:

- Kamî bardaxa mi ra şimito?

Dima ra, ê yewinî dorûverê xo de nîyadayo û vato:

- Kamî pay nayo cila mi ser?

Êyê bînî ameyê ey het û vato:

- Wey! Cila mi de kî yewê xo kerdo derg.

La gama ke ê hewtinî cilaxo de nîyadayo, ewnîyayo ke Vewrsipîyeke tede rakewta ya. Naye ra hewt cuceyî çapik ra ameyê verê ey û hende şaş biyê ke zirçayê. Hewt çilayê xo ardê, qayîte Vewrsipîyeke kerdo û hemîne têreyra vato:

“Oy Homayo, oy Homayo! Na domane çiqas rindek a!”

A zaf şîya ro weşîya înan. La înan a ranêurnaya û çile de caverdaya. Cuceyo hewtin leweyê embazanê xo de kewto ra. Cila her yewêk de saetêk mendo û şewe vîyarta.

Eke bîyo şewdir û Vewrsipîyeke bîya hişyare, aye cuceyî dîyê. Aye kî dorê înan de vişîyayê pêro. La ê nazik bîyê û aye ra pers kerdo vato:

“Nameyê to çi yo?”

Aye vato:

“Nameyê mi Vewrsipîyek a.”

Cuceyan vato:

“Ti senî ameya keyeyê ma?”

Aye înan rê hal û hewalê xo qisey kerdo ke damêrrîye çitur waşt to aye bido kiştêne, seydwani çitur a nêkiştê û çitur hemeyê roje vazdayo heta ke peynîye de ameya resaya bi keyeyê înan. O wext guneyê cuceyan bi aye ameyo. Înan vato:

“Ti ke karê keyeyî kena, pewzena, derzena, cilan finena ra, şuwena û rêsenâ, ser o kî her ca pak û biserûber verdana. Eke ti ma het de bimanî, çiyê to kêmi nêbeno.”

Vewrsipîyeke vato:

“Eya, çiman ser.”

Û leweyê înan de menda. Aye karê keyeyê înan kerdo. Şewdir ra cuceyî şiyê bi koyan û zern û maden kinito. Şan de ê gêrayî ra bi

keye, ganî o wext werd hazir bîyêne. Bi roje kêneke tena bîya. Cuceyan vato, "Bala to qiralîça ser o bo. A nêzdî de do bizano ke ti tîya ya. Kesî megîre zere."

Qiralîça, badê ke cîger û pişikî Vewrsipîyeke werdê, êdî bawer kerdo ke a tena tewr rindeka welatî ya. Şewdir şîya verê eynike û persayo vato:

"Eynikê, eynika rîyê dîwarî.

Kam a tewr rindeka nê dîyarî?"

Labelê eynike wina cewab dayo:

"Qiralîçaya mi, tewr rindeka nê cayan ti ya.

La Vewrsipîyeke ha leweyê hewt cuceyan û peyê hewt koyan de.

Rindekîya de to ra hezar qatî ya."

Qiralîça ke nê qiseyî heşnayê, şaş menda, çunke zanayo ke eynike zûrî nêkena. Şîya ser ke hetê Seydwanî ra xapîyaya, tey veto ke Vewrsipîyeke hîna ciwîyena. Dest pêkerdo ser o fikrîyaya ke senî bişîyo aye bikişo. Çunke hetanî ke eynike mevajo a tewr rindeka welatî ya, a huzur nêvînena. Dima kinc û kisvetê etarêke girewtê pira, rîyê xo boyax kerdo ke qet kes aye nêşinasno û şîya verê banê cuceyan. Dayo keyber ro û veng dayo vato:

"Rakerêne, rakerêne. Ez etarêka kokim a, ez malê rindî roşena."

Vewrsipîyeke pencera ra nîyadayo teber û pers kerdo:

"Xanimê, to het çi esto?"

Kokime vato:

"Malê rindî, malê rindekî. Kurdelayê zafrenginî, domana delaleke."

Û yewe veta ke birîsmo zerd, sûr û kewe ra mûnite bîya. Vewrsipîyeke zereyê xo de vato "Ez şêna na cinîka kokime bîyarî zere, a yewêka başe asena." Û zorbeyê keyberî kerdo ra û xo rê kurdele herînaya. Kokime vato:

"Dê nîyade! To çiqas bêserûber girêda. Bê, ez to rê rindêr girêbidî."

Vewrsipîyeka mesûme verê aye de vindeta. Aye kurdele girewta û girêdaya. La hende çîp (huşk) girêdaya ke nefesê Vewrsipîyeke gêriyayo, ginaya war ro, eynî seke merda. Qralîça vato, "Ti ha bîya tewr rindeke!" û dayo piro şîya.

Demê ra dima, bîya şewe. Hewt cuceyî gêrayê ra keye. Wexto ke Vewrsipîyeka xo ya delale erd de dîya, seke merda, zaf kewtê ver. A cayê xo de nêlewîyaya, merdim vano ke merda. Înan a hewa naya û dîyo ke zêde çîp girêdîyaya. Bendikê kurdele birnayo û Vewrsipîyeke nefes girewto, dima bîya ganîye. Cuceyan ke heşnayo ke se bîyo, vato:

"Na etarêka kokime qiralîçaya bêwayîre ra teber tu kes nîyo. Tim baldare be, eke ma to het nîyîme teba kesî megîre bi zere!"

Qiralîçaya niyetxirabe ke reşta bi keye, eynika xo ra pers kerdo vato:  
“Eynikê, eynika rîyê dîwarî.

Kam a tewr rindeka nê dîyarî?”

Eynike cewab dayo vato:

“Qiralîçaya mi, tewr rindeka nê cayan ti ya.

La Vewrsipîyeke ha leweyê hewt cuceyan û peyê hewt koyan de.  
Rindekîya xo to ra hezar qatî ya.”

Qiralîçe hende şaş menda ke gonîya xo heme vindeta. Çünke zanayo ke Vewrsipîyeke hîna ganî ya. Vato “Nika ez o çiyê ser o bifikrî ke to mehî bikero.” Werîşta û bi sihirbazîye ke tede zanayoxe bîya şaneyêko axûyin viraşto, kewta şeklê çerçiyêka kokima bîne û reyna şîya serê hewt koyan, verê keyeyê hewt cuceyan. Dayo keyber ro vato:  
“Malo rind, malo rind!”

La Vewrsipîyeke nîyadayo teber ra, veng dayo vato:

“Rayîrê xo ra şore. Ez nêşêna kesî bîyarî bi zere.”

Çerçîye vato:

“Ma ewnîyayîş kî qedexe nîyo, ney?”

O wext aye şaneyo axûyin veto û hewa nayo. Vewrsipîyeke ke beriqîyayîşê şaneyî dîyo, zaf şîyo ro weşîya aye. Seba ke na rey cinîyêka bîne verê keyberî de bîya, aye keyber kerdo ra û şane herînayoy. Herînayîşî ra tepîya çerçîye vato:

“Bê, ez porê to weşîk şane bikerî.”

Vewrsipîyeka belengaze xirabîye tede nêdîya û a caverdaya ke şane bikero. Labelê gama ke şane dayo porê Vewrsipîyeke ro, Vewrsipîyeke xo ra şîya û ginaya war ro. Qiralîçaya xirabe vato:

“Ti ya rinda rindekan! Nika yê to qedîya.”

A şîya keye. La demêko nêzdî ra tepîya bîyo şan û cuceyî reştê keye. Înan ke Vewrsipîyeke erd de dîya, ca de damêrîye suçdar kerda. Înan dîyo ke se bîyo. Şaneyo axûyin mîyanê porê aye ra veto. A game de Vewrsipîyeke çimê xo kerdê ra û hewna bîya ganîye. Aye înan ra vato ke se bîyo. Cuceyan reyna aye ra vato ke baldare bo û kesî rê keyber anêkero.

Qiralîça ancîna şîya verê eynike, vato:

“Eynikê, eynika rîyê dîwarî.

Kam a tewr rindeka nê dîyarî?”

Eynike cewab dayo vato:

“Qiralîçaya mi, tewr rindeka nê cayan ti ya.

La Vewrsipîyeke ha leweyê hewt cuceyan û peyê hewt koyan de.  
Rindekîya xo to ra hezar qatî ya.”

Qiralîça ke nê qiseyî reyna heşnayê, hêrsan ra recifîyaya û lerzaya vato:

“Wa Vewrsipîyeke bimiroy, wazenê wa peynîya emrê mi bo!”

Badê şîya odaya xo ya nimitkîya tenhaye ke kes nêşêno vernî ro aye bigîro. Aye uca sayêka axûyine viraşta. Saye teber ra rindek û sûre asaya. Merdimî gama ke a saye diyêne, zerrîya xo şîyêne pê. La kamî ke saye biwerdêne, tavil merdêne. Badêna kinc û kisvetê cinîkêka dewije girewtê pira, şîya serê hewt koyan, verê banê hewt cuceyan û dayo keyber ro. Vewrsipîyeke nîyadayo û vato:

“Ez nêşêna çi kesî bîyarî zere, cuceyan mi rê qedexe kerdo.”

Cinîka dewije vato:

“Ti axûyî ra tersena? Ti mi ra şubhe kena, ha ez o yewe şîl bikerî û nêmeyê aye biwerî. Wa felqeyo sûr para to bo.”

La saye henî viraştîye bîya ke tena heto sûr axûyin bîyo. Vewrsipîyeke dîyo ke dewije bi xo saye ra werd, zerrîya aye kî şîya pê û êdî nêmeyo bîn girewto xo dest û gid (gaz) kerdo. La gama ke gid kerdo, ginaya war ro û merda. Qiralîça xirabe awir dayo aye û huyaya, vato:

“Sipîye sey vewre, sûre sey gonî, siyaye sey abanoze! Nika cuceyî êdî do meşîyê to ganî bikerê.”

Ancîna keye de eynike ra persaya, vato:

“Eynikê, eynika rîyê dîwarî.

Kam a tewr rindeka nê dîyarî?”

Eynike axir cewab dayo aye vato:

“Ti ya qiralîçaya mi, tewr rindeka nê welatî!”

Nika zerrîya xo ya hesûde çiqas ke bişîyo rehetîya xo bivîno, bîya sivike.

Cuceyî şan de kana madenan ra ameyê bi keye. Vewrsipîyeke delale uca erd de meridiyaya bîya. Aye nefes nêgirewto û merda. Înan bendikê aye kerdo ra. Nîyadayo gelo çiyêko axûyin porê aye de esto yan ney. A bi awe û şerab şuta. Labelê çi fayde ke nêşayê kêneka delale bikerê ganîye. A merdîye menda. Înan a naya teşkereyî ser, aye het niştê ro û hîrê rojî berbayê. Tepîya waştto ke aye wedarê la ewnîyayo ke hîna tezî ya, qet ro merdeyan nêmenana, alişkê aye yê rindekî hîna sûrî bîyê. Înan vato: “Nêbeno ke a şoro binê erdê siyayî.” Werîştê yew tabuto camên dayo viraştene. Înan a kerda mîyan ke merdim şîyayo aye rasterast her het ra bivîno. Bi herfanê zerrnênan kî name û eslê aye ser o nuştto. Dima tabût yew koyî ser nayo ro û her rojê cuceyan ra yew leweyê aye de mendo û nobete girewta. Hewyanî kî ameyê Vewrsipîyeke rê berbayê. Verê kundêk, dima qirawilêke û peynîye de boranêke.

Vewrsipîyeke henî xeylê, xeylê wext mîyanê tabûtî de menda û nêpuyaya. Hîna sipîye sey vewre, sûre sey gonî û porsiyaye sey abanoze bîya. Çunke henî meridiyaya ke merdimî vatêne qey hewn de ya.

Reyê bîyo ke yew prensu xort ameyo keyeyê cuceyan ke şewêk uca bimano. O wext koyî ser o Vewrsipîyeke delale tabûtê camênî de

dîya. Ey nuşteyo zerrnên wendo, ewnîyayo ke a esilzada ya. Coka cuceyan ra vato:

“Tabûtî bidêne bi mi, şima çi wazenê, wa yê şima bo.”

La înan vato:

“Ma ey nêdanîme bi heme zerrnê dinya.”

Coka prensî vato:

“Tabûtî mi rê bikerêne dîyarî. Eke ez Vewrsipîyeke nêvînî ez nêşena biciwîya. Seke dinya de çîyo tewr biqîymet bo, ez do hertim ê tabûtî rê hurmet bikerî.”

Zerrîya cuceyanê erjayeyan pê veşaya, tabût dayo bi ey.

Prensî tabût dayo xizmetkaranê xo ke mecbur bîyê hertim tabut vileyê xo ser o bar bikerê û pîrensî reyde biçarnê. Reyêke xizmetkaran ra yewêk lemêk ser ra gindir bîyo û leqayîş ra yek de koçanê saya axûyêne ke Vewrsipîyeke werdbî, qirrika aye ra vejîyayo bi teber. Vewrsipîyeke tavil çimê xo kerdê ra, qapaxê tabûtî hewa nayo, xo kerdo rast û bîya ganîye. Û zirçaya vato:

“Ya Rebî, ez kotî ya?”

Prensî bi keyfêkê girsî vato:

“Ti leweyê mi de ya.”

Ey aye ra derg û dila vato ke se bîyo û dima vato:

“Ez to pêro çîyanê dinya ra zêde hes kena. Bê bi seraya pîyê mi, bibe ciniya mi.”

O şîyo ro weşîya Vewrsipîyeke û a tey şîya. Badê cû veyveyê xo bi heybetî û rindekiye nayo ro. Damêrrîya Vewrsipîyeka bêwayîre kî dawet kerda. Aya ke kincê xoyê rindekî girewtê pira kî şewdir şîya verê eynike û vato:

“Eynikê, eynika rîyê dîwarî.

Kam a tewr rindeka nê dîyarî?”

Eynike cewab dayo vato:

“Qiralîçaya mi, tewr rindeka nê cayan ti ya.

La rindekiya qiralîçaya ciwane to ra hezar qatî ya.”

Qiralîça xirabe ke nê vateyê heşnayê, milqî dayê û tersaya. Hende tersaya ke nêşaya fekê xo akero. Verê nêwaştto ke şoro veyve. Labelê hesûdîya xo ra nêtebetîyaya û waştto ke qiralîçaya ciwane bivîno. Wexto ke ameya, dîyo ke a Vewrsipîyek a, uca sey heykelê mat menda.

Uca citeyî solê asinênî mîyanê adirî de bîyê. Mecbur menda ke înan xo pay bikero û solan de bireqesîyo. Lingê aye zaf veşayê la a mecbur bîya ke reqsê xo dewam bikero, hetanî ke helîyaya.\*

---

\* Çime: Birayê Grimmî, Kinder- und Haus-Märchen Band 1 (Sanikê keye û domanan, cild 1), çapa girsî hewtine, Weşanxaneyê Dieterich, Göttingen, 1857, r. 264-273

# ÇİMÊ MA ROŞT BO

Seid ASPAR

Ez vana qey wareyê neşrîyatî de vetîşê kovare ra zorêr yewna gure çin o. Sebebê nê vatişê mi zî şahîdbîyayîşê min o. Unîversîte de çend embazanê mi kovarêk vetêne û vetîşê yew hûmare de ez zî daxil bîya. Kovarevetîş çî yo, gureyêko senîn o, badê vetîşî xodestgirewtîş çî qayde yew hîs o, mi nê pêro o wext zanayî, mi heme zehmetî o wext dîyî. Eke ewro kesêk mi ra biperso vajo ti derheqê vetîşê yew kovare de çî fikirîyenî? Cewabê mi wina beno: semedê amancêk, îdealêk rehetîya xo xerepnayîş, hewnanê xo heremnayîş, xo bela eştiş o. Pêserameyîş, muhtewîyat û nuşteyan hedrekerdiş, redaktekerdiş, mîzanpajkerdiş, wextê xo de resnayîş-nêresnayîş, çapkerdiş, vilakerdiş ûsn. Gureyê tehemulî nîyî; keso ke zerrîveşaye, idealist nêbo nêşkeno bikero. Ma zaf zeman vînenî kovarî çend hûmaran ra pey nêvejîyenî, ez vana qey sebebê nêvejîyayîş û kilmabîyayîşê emrê kovaran ra yew zî nê zehmetî yê.

Pa heme nê zehmetîyan ez kovaran qey destpêkê edebîyat û zîwanê ma zaf muhîm û hewce vîna. Ma biewnî dinya ra, ma biewnî seserra ke ma xo ra pey verdaya ra. Ziwan û edebîyatê modernî dormeyê kovaran de aver şiyê. Bê naye zî ez kovaran sey xiznayêk sey baxçeyêk vîna, tede çeşît-çeşît gewherî, vilî estî. Her cayê welatî ra çeşît-çeşît rengan, vengan, fikran, hikayeyan, meselayan ûsn. resnenî wendoxan. Zaf hetan ra merdimî aya kenî. Ez xo ra mîsal bidî; mi hetanî ke kovara *Vateyî* newendbî mi nêzanaynî zîwanê ma nusîyeno yan nênusîyeno. Hetta ke wina yew xemê mi zî çin bi. La kam gama ke mi na kovare girewte xo dest, mi dest pêkerd wende, pa heyretan ez bîya haydarê xo û zîwanê xo û şarê xo û tarîxê xo. Mi fekê xo û fekanê bînan wend, mi zana ke kirdkî tena fekê mi ra îbaret nîya, zaf gird û dewlemend a. Mi zana ke kirdî tena dewa mi ra yan mintîqaya mi ra îbaret nîyê. Mi zîwanê kurdanê bînan şinasna. Mi meselayan, hikayeyan, deyîran, vateyan, şanikan ra zana ke ma seypê yê, yew keye ra yê, ma eynî çî dîyî, antî û fikirîyayî. Mi nuşteyê edebîyatê modernî wend, mi tamê zîwanê standardî girewt, mi zana, eke îmkan bibo,



ziwanê mi zî beno ziwanê perwerdeyî. Ziwanê mi zî eşkeno her ware de ihtiyacıya mi bivîno. Ez vana qey mi yew bi yew kitabî biwendêne, ez hende haydarê çîyan nêbîyêne. Çunke mi gore kitab qasê kovarî rengin nîyo. No semed ra ez kovaran qey destpêkî zaf muhîm û erca-ye vînena. Ez bi xo zaf deyndarê kovare ya.

Birastî ez naye zî vajî ke no ware de ihtiyacıya kirdkî zaf a. Tîya de ez nêwazena xebatanê kesanê bînan rexne bikerî, nînan ra behs bikerî û xora, wina yew derdê mi zî çin o. Tena ez wazena na ihtiyacıye dîyar bikerî. Mi badê wendişê *Vateyî* ra cigêrayîş kerd ke eceba êdî çî kovarî estî yan çin î. Axîr ke mi înternet de çend hebî dîyî. Nameyê nê kovaran zazakî bi la zereyê înan nîme ra zêdêr tirkî bi. Nuştayê zazakî zî bêqayde û bêtam bî. Çarçewaya sîyaset û heqaretî de nusîyabîy. No semed ra xebatê neweyî ma rê zaf lazim î.

Ez qiseyanê xo tîya de qedênena. Heme kedkaran û serkaranê kovara *Şewçilayî* rê zaf sipas kena, serkewtiş û emirdergîye wazena. No dewro bêbext, bêxem û tarî de şîma xo eşto vernî, şîma ma rê bîyî roşn, yew rayîr şîma ver de çin bi, şîma ma rê rayîrêk kerd a. Homa şîma hemîne ra razî bo, keyeyê şîma awan bo, destê şîma ternî bî.

Çewlig


01.01.2011

# TEBERIK

Alî Aydin Çiçekî kitabê xo cinîyanê kurdan rê kerdo dîyarî. Kitabê ey bi na cumle dest pêkeno: “*Seba cinîyanê kurdan ke vera şer û tadayî vîndenê û zîwanê xo musnenê domananê xo.*”

Mekan û atmosferê hikayanê Alî Aydin Çiçekî dew a; cuya dewe ra, bawerîya dewijan ra fotografê ke xorînîya zerrîya merdimî de jan kenê, formê hikaye de pêşkêş biyê. Alî Aydin Çiçek hikaya bi sernameyê “Teberik”î de merdimêkê kokimî ke cîgerê xo, domanê xo şer de kerdê vindî, wina nişanê ma dano:

“*Tenik-tenik va ameyêne. Vengê vayi de vengê tifingan, vengê şerî...*”  
(...)



*Merdimê kokimî sereyê xo ver bi asmênî kerd berz û qayitê aşme kerd. Roştîya aşme hesiranê çimanê ey de bereqiyayêne. Kokimî xo bi xo bêveng va:*

*‘Ax dinya! Werrekna ez zî pepûg biyêne û dima vayî, dima şilîye wîni şew û roje mi janê xo to rê biwendêne.’*

Alî Aydin Çiçek, bi nê hikayanê xo nişan dano ke o wayîrê yew damara edebî yo. Merdim tavilî hîs keno ke ey bi hewes û zerrî ra hikayeyê xo nuştê. Û zîwanê baw û kalanê xo ra hes keno. Bi eşq zîwanî ser o vindeno. Wina aseno ke ma do ey ra hîna zaf eseranê neweyan biwanin.

Tayê problemê xo yê şenikî estbê zî bi hawayêko umûmî zîwanê hikayanê ey zîwanêko pank û sade yo, hol fehm beno. Tayê hikayan de qiseykerdişê ey tahmê şîire dano. Xora, ganî zîwanê hikayan bineyke nêzdiyê zîwanê şîire bo. Labelê Alî Aydin şeno zîwanê xo bineyna bi dîqet bişuxulno. Mesela, hikaya bi sernameyê “Xortê Dewe” wina dest pêkeno:

“*Ver bi şanî yo. Êdî tîje peyê koyan de bena vindî. Berîvanî berîye*

ra amêne û dima înan kî golikwanan golikî kerdî xo ver ardî...”

Nê teswîran de, mîyanê her di cumleyanê verênan û her di îbareyanê cumleya peyêne de hetê qiseykerdişî yan zî neqlkerdişê bîyayîşan ra problemê zemanî esto; kronolojîyê qiseykerdişî pênegêno.

Mesela, mi gore ganî wina bo: “Ver bi şanî yo. Êdî tîje peyê koyan de bena vîndî. Bêrivanî bêriye ra yenê û înan dima kî golikwanî golikan kenê xo ver anê...”

Yan zî: “Ver bi şanî bî. Êdî tîje peyê koyan de bîyêne vîndî. Bêrivanî bêriye ra ameyêne û înan dima kî golikwanan golikî kerdêne xo ver ardêne...”

Ez hêvîdar a ke Alî Aydın Çiçek hîna zaf eseranê erjayan pêşkêşê wendoxanê kirmanckî bikero û xortê ma yê sey ey bibê zafî, edebiyatê ma bi destê înan gamêka hîna pête aver şiro.

**Kunyeya kitabî:** Alî Aydın Çiçek, Teberik, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2010, 95 rîpelî

**Adresa waştîşî:** Vate Yayınları, Katip Mustafa Çelebi Mahallesi, Tel Sok. No: 18 Kat: 3, Beyoğlu – İstanbul, Tel: 0 212 244 94 14, e-post: wesanxaneyevateyi@hotmail.com

**Diyarbakir de:** Ekinciler Cad., Nurlar Ap., Kat 3, Ofis – Diyarbakir

# KITABÊKO MUHÎM: DÊRSIM

Nuştoxê nê kitabî Andranîk armenî yo û wina aseno ke wezî-fedarêkê dêrê armenîyan bîyo. Reya verêne wisarê 1888î de yew embazê xo reyra qesebaya *Къоxve* [Gêxî?] ra ver bi Dêrsimî keweno rayîr. Tayê mintiqayanê Dêrsimî ra gêreno. Dima reyna şino bi Dêrsim, na reya peyêne hîna vêşî şino miyanê Dêrsimî.

Andranîk derheqê raywanîya xo de, derheqê cografyaya Dêrsimî de, derheqê şarê ucayî de, bitaybetî derheqê kurdanê Dêrsimî de bi teferruat nuseno. Coka no kitab derheqê

tarîxê seserra newêsine (1828-1895) yê Dêrsimî de, bitaybetî hetê têkilîya kurdanê Dêrsimî û Dewleta Osmanî ra zaf balkêş o, heta bêemsal o.

Kitab reya verêne 1900 de hetê Yewîya Weşanxaneyanê Armenîyan ra Tîflis de bi nameyê “*Dêrsim, Çanaparhordûtyûn Yêv Aşxarhagrûtyûn*”î weşaniyêno. Serrêk dima, yanî 1901 de çapa ey a diyine weşaniyêna.

Serdar Uçar fotokopîya nê kitabî dano Malmîsanijî. Malmîsanij zî seba tercumekerdîşî dano Têmûrê Xelilî. Têmûrê Xelilî armenîkî ra tercumeyê lehçeya kurmanckî keno û Weşanxaneyê Dengî hezîrana 2009î de Dîyarbekir de bi nameyê


“*Dêrsim, Rêwîti û Erdnîgarî*” weşaneno.

Dima hetê Roşan Lezgînî ra seba kirmanckî (zazakî) tercume bîyo û Weşanxaneyê Vateyî weşanayo. Kitab di qismî û 160 rîpelî yo.

**Kunyeya kitabî:** Andranîk, *Dêrsim-Raywanî û Cografya, Kurmanckî ra Çarnayox: Roşan Lezgîn, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2010, 160 rîpelî*

**Adresa waştîşî:** Vate Yayınları, Katip Mustafa Çelebi Mahallesi, Tel Sok. No: 18 Kat: 3, Beyoğlu – İstanbul, Tel: 0 212 244 94 14, e-post: wesanxaneyevateyi@hotmail.com

**Dîyarbekir de:** Ekinciler Cad., Nurlar Ap., Kat 3, Ofis – Dîyarbekir




# HÎKAYA ROŞAN LEZGÎNÎ “BABA” BÎYE FÎLM

Hîkaya cinîyêka kurde ke mêrdeyê aye netîceyê cînayetanê kerdoxê xo meçhûl de kişîyayo, bîye fîlm. Fîlm qezaya Çewlîgî Bongilane dewa Qeran de ancîyayo û nameyê xo “Baba” yo. Tuta ke babîyê aye kişîyayo, dadîya xo ra persena vana “*Babê mi key yeno?*” Fîlmo ke 12 deqîqeyî yo, bi na perse dest pêkeno û dramê domana ke sêwî menda û cinîya ke vîya menda qal keno.

Rejîsorê fîlmî Mehemed Alî Konar, qismê Rojnamegerî, Sînema û Televîzyonî yê Unîversîteyê Marmara (Marmara Üniversitesi Gazetecilik Sinema Televizyon Bölümü) ra mezun bîyo û demeyêk şaristanê Roma yê Îtalya de perwerdeyê sînema diyo.

Welatê kurdan de bi deshezaran cînayetê kerdoxê xo meçhûl estê. No fîlm badê kişîşê babî dramê cinî û psîkolojîya tute ra yew fotograf nîşan dano. Hîkaya fîlmî kitabê şair û nuştoxê kurd Roşan Lezgînî “Binê Dara Valêre de” hîkaya nameyê xo “Baba” ra gêrîyaya û bi eynî nameyî bîya fîlm. Fîlm de psîkolojîyê yew domana (tuta) ke babîyê aye cînayetêkê kerdoxê xo meçhûl de kişîyayo û dadîya aye seba ke psîkolojîyê domana xo bipawo, kişîşê babî senî aye ra nimnena, nîşan dano.



Rejîsoro ciwan Mehemed Alî Konarî derheqê filmê xo de wina malumat da:

“Film de eşkera yo ke ‘babî’ hetê kesanê meçhûlan ra kişîyayo. Gama ke kêneka qijkeke persê hewalê babîyê xo kena, dadî wazena bi lûrîgan cewab bido. Esas dadî hem wazena kêneke pênehesîyo hem zî wazena bi lûrîgan xo û domana xo pîya teselî bikero, zerrî bido xo ver. Dadî lûrîganê xo de bi hawayêko muphem behsê cîneyetêkê polîtîkî kena. Her kes nê gunekariyan ra xeberdar o.”

Rejîsor Mehemed Alî Konar seba filmê xo vano, “No tena yew destpêk o.” Û ser o zêdneno vano, senî ke firsend bikewo destê mi ez kirdkî de hîna zaf filman ancena.

Film de Roza Erdem, Hêlîn Bulut, Kekê Yildirim û Tajdîn Gultekin kay kenê. Muzîkê filmî hetê Metîn Kemal Kahramanî ra virazîyayo. Film de dîyalogî bi kirdkî (zazakî) yê la binnuşteyî cîya-cîya bi tirkî û îngilîzki amade bîyê.

**ZAZAKI.NET**

“Merdim bi reng û vengê xo rindek o”

[www.zazaki.net](http://www.zazaki.net)



xeberî, meqaleyî, hikayeyî, şîirî, fıqrayî, sanikî...

## DILOPÊ ZERRÎ

J. Îhsan Espar

Lewî estê  
miz ê, şerabî  
pîroz ê, afrodtkî  
zergûnbîyayîşê eşqî de  
raste-rast çêleyê adir ê  
binê heme asmênan de

Çimî estê  
zeng ê, deryayî  
sermest ê, efsûnkî  
awirê nazşîrinî  
wêran kenê heme çiyî  
her zemînî ser o  
heme mewsiman de

Qisayî estê  
zelal ê, krîstalî  
hîsdar ê, şîirkî  
cewherê mezgî,  
ahengê vengî  
û sey zerrnê safî,  
sey yaqutê sûrî  
vêrenê  
dîwanê heme homayan de.

# ŞERABÊ

5 TL